

# Ji Weşankar

بسم الله الرحمن الرحيم

الحمد لله رب العالمين  والصلاة والسلام على خير خلقه محمد وعلى اله وصحبه اجمعين

Hemd û şukur ji Rebbê însana re, ji melikê însana re, ji îlahê însana re be.

Selat û selam, tehiyyet û îkram li ser Resûlê 'Erebî, Pêğemberê îns û cinna, Fexra Kaînatê be; li ser al û eshabên wî teva be. Û selam li ser peyrewên wî be heta bi qiyametê.

Xwendevanên hêja, bi alîkariya Rebbê 'alemê me ev hejmara kovara Kelhaamed jî ji bo we amadekir. Ji ber ku "her tiştê nû zewqê dide merev" me di kovara xwe de çend tiştê nû çêkir:

Di serê van nûyîtiyan de teb'en nivîskarên me yên nû tên. Di nav van nivîskarên hunerwer de wek Mûhemmed Şakir, Mustafa Tûran, Azad Rêbiwar û hwd. yên ku em ji nêz ve wan nasdikin hene. Van nivîskarên me jî ji niha û şûnde ji bo de'wa 'ezîz wê bi xwendevanê Kelhaamed re bin.

Me tertîba nivîsan jî guhert. Reçeta Kurda ku bi pîtên 'Erebî/Soranî dihat nivîsandin, ji ber girîngiya wê û îstîfadekirina hemî xwedevana me bi pîtên latînî jî nivîsand û da kêleka wê. Her wiha nivîsên bi pîtên 'Erebî me ji rûpelên paşî deranî xist nav rûpelên din.

Û nivîsên Zazakî jî me ciyê wan guhert. Me wan jî xist nav rûpelan û di nav kovarê de belakir. Xwendevanekî dema ji nivîsa ewil dest bi xwendinê bike wê ji nişkê ve leqayî nivîseke Zazakî were.

Di çend hejmarên paşî de me ferhengok kistibû rûpelê paşî. Ji bo hînkirina me'na kelîma hinik xwendevanê me gelekî ji viya îstîfadekirin. Di vê hejmarê de di bedêla rûpelê ferhengoka paşiya kovarê de, di her nivîsê de kelîmê ku xwendevan dixwaze m'ena wê fêmbike me xist paşiya wê nivîsê. Bi vî şeklî kelîma ku xwendevan lê bigere wê di 'eynî rûpelî de bibine.

Me'lûmê we ye, Latînî ne alfaba Asya ye. Alfaba Asya alfaba 'Erebi ye. Dîn û çanda me jî bi alfaba me re mezcbûye. Bê çewa di jîna xwe de em mubtelayê bi ğerbê bûne di alfaba xwe de jî em mubtelayê bi ğerbê bûne. Heftxuzî bi wê demê ku bihata alfaba Îslamî/Quranî/Asyayî biziviriya nav me û em pê dilşadbûbûna. Bes bi sebeb ku îro em bi latînî dinivîsînin lazime ku em ligor usûl û qîdê wê binivîsînin.  Ji bo nivîsandina Kurdî bi latînî re di îmlaê de ji sedîsed standardekî tunebe jî gelek tişt bûne qa'îde û rûniştine. Kesê ku ji nivîsandinê dûrin belkî bi vana nizanibin, belê her kesê ku dinivîsîne rî'ayetî van qa'îda dike. Di kovara Kelhaamed de jî mecbûren her nivîsa ku ji me re tê li gora van usûla em serrast (teshîh) dikin. Bes hinik nivîs hene me zêde dibetilînin, zemanê me zêde distînin. Em ricadikin ji nivîskarên xwe û kesên ku ji me re nivîsa verêdikin li gora îmlaê binivîsînin. Ji sedîsed nebe jî karê me sivik bikin.

Vê hejmara me jî bi mijarên gelek girîng tije û dagirtiye: Şi'r û edebiyata klasîk, tesewwuf, dîroka Kurda, şi'rê serbst û nûjen, çîrokê nûjen, reçeta Kurda, numûneyên ji dîroka Îslamê, meqalên rojevê û hwd… Çimkî zewqa huner û edebiyata kovara Kelhaamed ne ziwaye ku xalî be ji fêdê. Zewq û fêde di navhev de ne

# naverok


Ji Weşankar / ........................................................ 1
Gelî Bawermendan ................................................ 3
Reçeta Kurdan - 'Erebî / Abdussamed Hîlmî ........... 4
Reçeta Kurdan - Latînî / Abdussamed Hîlmî ............ 6
Huzûr Li ber Serê Min / Fethullah Yalçın ................. 8
SÛREYÊ TÎN / YUSUF ARÎFOĞLU ........................ 10
Di 'Hedîsên Axirzeman de / Selamîyê Bilêderî ...... 12
Hin XuriHişarıvBıra! / NUREDDÎN KAWARÎ ........... 14
Halê Ûmmetê / Şerîf Emîn .................................. 15
Dembihêrk / Muhemmed Şakîr ........................... 17
Reçeta Kurda - 16 ............................................. 18
Halê Mumîna Ğerîbe / Mustafa Turan .................. 19
Ey Milletêmin! / Mela Mîzgîn ............................... 21
Îslam / Mela 'Eliyê Ezdarî ..................................... 23
Mar/ Abdullah Cewher ........................................ 24
Şêx 'Elîyê Herîrî / Ehmed Zeytûnî ......................... 25
Begên Dimîlî / Yasîn Demîr .................................. 27
Tasawuf-3 / M. Cefer Becirmanî ............................ 30
Hevpeyivîn / Kelhaamed ..................................... 33
Tu Bi Xêr Hatî / Zekî Ekînci .................................. 37
Bîsmîllah / Yahya Ezdarî ....................................... 38
Meynenoşî / Mela Ehmed El-Cezerî ...................... 39
Navekî Axretî / Azad Rêbîwar ................................ 41
Peyvê Pêşîya ...................................................... 44
Bangeşe / Ebuzer Bayram .................................... 45
Kî Mushef Dizîye / Mûhemmed Arasan ................. 46
Cewherê 'Eşqê Koz e / Mahmud Kılınç ................. 47
Ziman u Jiyan / Şerîf Emîn .................................... 49
Peyamên Sureyê Fatîhê / Fatîh Akman ................. 51
Serê Hîkmetê Tirsa Ji Xweda ye / Fesîh Memîş ..... 52
Salih Begê Hênî - 2 / 'Ebdulkadir Turan ................. 57
Bexçê Zaroka ...................................................... 61


## Di Hedîsên Axırzeman de



Selamî Blêyderî

12

## Şêx 'Eliyê Herîrî



Mela 'Eliyê Ezdarî

25

## Sitrana Şehîdan



Cewdet Karaman

54


kelhaamed — banga heq ji — Kovara Îslamî Çandî û Hunerî

**Sal (Yıl)** : 7 ❖ **Jimar (Sayı)** : 27 ❖ **Biha (Fiyat)** : 6 TL
Payîz (Çileya Pêşî - Çileya Paşî - Sibat) 2016
❖
**Xwedî û Berpirsîyarê Nivîsaran (Sahibi ve Yazı işleri Müdürü)**: Abdulkudus YALÇIN
❖
**Ciyê Îdarê (İdare Yeri)** : Yavuz Selim Mah. Mehmetçik Sk. No:71 K: 3/E Esenler/İSTANBUL
❖
**Têkilî (İletişim - Sipariş):**
Tel : 0212 562 60 06

Web: www.kelhaamed.com
Mail: bangaheqq@gmail.com
❖
**PTT Hesap No:** Abdulhalim TÜRE - 591 87 91
❖
Yaygın Süreli
❖
**Çapxane (Matbaa):**
DERGAH OFSET : 0212 489 33 33
❖
**Nîşe (Not):** Mesulîyeta Ramanên Nivîsaran aîdê Nivîskaran e. Berhemên têne şandin nayên vegerandin.

# GELÎ BAWERMENDAN!

## Jı Qur'an A Mecîd Çend Pend Û Şîret

Gelî xwendevanên Kelha Amed! Di Qur'ana mecîd de hinek ayet hene ku bi tabira يَا اَيُّهَا الَّذينَ اٰمَنُوا destpêdikin. Di van ayetan de muxateb muslaman in. Rebbê me di van ayetan de me bi pend û şîretên xwe hişyar dike. Eger Ellah Te'ala destûr bide emê di çend beşa de wek xebatek xweser meala van ayetan teqdîmî we bikin. Em hêvîdar in wê ev xebata me ji bo xebatên we yê herî çêtir bibe wek destpêk û hûnê bi berfirehî xwe noqî behra tefsîra bikin tefsîra van ayetan bi xwînin.

1- Gelî bawermendan (nebî nebî) hûn Mîna wî kesê ku malê xwe bi rîyakarî û ji bo ditina insanan xerc dike û bawerîya wî jî bi Xwedê Tela û roja axretê tune (nekin). Sedeqeyên xwe bi minnet û ezîyetê betal nekin. Mîsala wî kesî dişibhe vê mîsalê: Tahtekî ku li ser misqalek xwelî heye û baranek gurr lê dixe û wî (tahtî) tut û rût dihêle. Kesên ku wiha dikin ew nikarin tu tiştekî ji kesba xwe bidestbixin. Lew Allah Te'ala koma kafiran hew tînit ser hîdayetê.

2- Gelî bawermendan! (Eman ha eman! Nebî nebî!) hûn Yehûdî û Nesranîyan ji xwe re nekin dost. Ew her dostê hevdûne. Ji we herçî kesê ku wan ji xwe re bike dost bê gûman ew jî ji wan e. Bê gûman Allah Te'ala qewmê zalim hew tînit ser hîdayetê.

3- Gelî bawermendan! Bi sebr û nimêjê (ji Xwedê Te'ala) alîkarîyê bi xwazin. Lê belê bi rastî ev (nimêj) ji bil ehlê teqwa û xûşû'êyê (dilhenûn û dilnizm) li kesên din giran tê.

4- Gelî bawermendan! Nimêjê (bi îstiqamet eda) bikin. Û zikatê bidin. Hûn li pêşiya xwe ji bo xwe ji xêrê çi bişînin, hûn dê li nêk Ellah Te'ala wî bibînin. 'Muheqqeq Ellah Te'ala her 'emelê we (bê kêmasî) dibîne.

5- Gelî bawermendan! Bêjin; Me îman bi Ellah Te'ala aniye.Û çi tiştê ku ji me re dahatiye , çi tiştê ku ji İbrahîm û İsmaîl û İshaq û Ye'qub û nêviyen wan re dahatiye, çi tiştê ku ji Mûsa û Îsa re hatiye dayin, çi tiştê ku ji nebîyan re ji teref Rebbê wan ve hatiye dayin (me bi tevê wan îman aniye). Em qet yekî ji wan ji yên din venaqetînin. Û em in (ew muslumanên ku) bi tenê teslîmî wî bûne.

6- Gelî bawermendan! Çawa rojî li ser ummetên berya we ferz hatiye nivîsandin, wisa li ser we jî ferz hatiye nivîsandin. Hêvî heye ku hûn (bi saya rojiyê xwe ji neqencîyan) bi parêzin.

7- Geli bawermendan! Hûn hemî têkevin sulh û selamete (ku ew ji îslame) û ('ese 'ese) hûn nedin pey rêçika şeytan. Bi rastî ew neyarê we yê aşikare.

8 - Gelî bawermendan! Berya wê roja ku wê bê û di wê rojê de ne dan û standin û ne jî dostanî û şefae'et heye, çi tiştên ku me ji bo rizqê we daye we hûn jî (ji) wî înfaq bikin. Herî kafir (hene ya her) ew zalimên bi xwe ne.



1-Sûretê Beqere 264
2-Sûretê maîde 51
3-Sûretê Beqere 45
4-Sûretê Beqere 110
5-Sûretê Beqere 136
6-Beqere 183
7-Beqere 208
8-Beqere 254

وان دئاخڤن و بئاخافتنێن وان دفكرن و بفكرێن وان حەرەكەت دكن. هەگەر هون دینێ خوە ڕاست ناس بكن ئو بعلمێ ژتەقلید و ئیمانا تەقلیدي بفلتن و خوە بئیسلامێ بگرن هونێ دلشاد و بەختیار ببن، هونێ ژئینقیلابێ دنیەوي نە ترسن.

س: -«تو باش دبێژي بەس هنك كەس وەك تە نابێژن، دبێژن گەرەك مَهْدي وەرە، چمكي دنیا مە پیر بویە ئو لهەڤكەتیە، هەر كەسك لگۆرا مەسلەك و مەشرەبێ خوە ئیسلامێ بجیكیڤە دكشینە، تەڤلیهەڤي كەتیە ناڤ ئیسلامێژي»

ج: -«هەگەر مَهْدي عەجەلە بكە ئو وەرە سەرسەرا سەرچاڤا برا نەسەكنە وەرە، چمكي ڕابونا ئیستیبدادێ ڕێ ژێرە ڤەبویە، جێ وي حازر و حازرە ئەم ژي حازرن. وەك هاوێ كو هون ظەن دكن ڕەوش نە خەرابە، دبهارێدە كولیلك ڤەدبن. ژشئوناتێ ڕەحمەتا ئیلاهیە كو سەفالەت و پەریشاني و شەرپەزەییا ڤي ملتي ڕابە. بەلێ ئەز ڤێ ژي بێژم: كي ژوە بێژە زەمان بتەمامي خەربویە ئو مەیلا دەورا بەرێ دەورا ئیستیبدادێ بكە، ئەو ژي بنەزاني وەك ظەننا ئەجنەبیان نەقەنجیێن ئینسانێ بەرێ دخە ستیێ ئیسلامێ»

دەورا ئیسبیدادێدە ئەجنەبیێن غەیري مسلم خەطایێن كو ژ فعلێ شەخصا چێدبون دكرن مال ژئیسلامێرە، هەگەر هونژي خەرابیێ ئیرۆ بێژن ئو بێژن دەورا بەرێ باشبو هونێ خودي دەركەڤن لظولما ظالمێن بەرێ، هونێ بنەزاني خەطایێن ظالما مەشروع ببینن و تێكەڤن صەفا كافرا.

س: -«كەسێن كو فكرا خەرا دكن ئو مەشروطیەتێ باش نابینن كینە؟»

ج: -«ئێ كو مەشروطیەتێ باش نابینە ئو فكرێ ئینسانا خەرا دكە جەمعیەتەكە، شەش ڕەئیسێ ڤێ جەمعیەتێ هەنە، ئەو ژي ئەڤن: یەك جەهالەت ئاغا، ئێ ددوا عیناد ئەفەندي، ئێ سسیا غەرەز بەگ، ئێ چارا ئینتیقام پاشا، ئێ بێنجا حەزرەتي تەقلید، ئێ شەشا میرزە گەڤەزە.»

«دناڤ نەوعێ ئینسانانەدە كەسێ كو ئینتیسابي ڤێ جەمعیەتێ دكن ئەڤن:

یەك: كەسێ كو درهەمك زرارا خوە نادە بهەزار باقنوت مەنفیعەتا موسلومانا

ددۆ: كەسێ كو مەنفیعەتا خوە دزرارا ئینسانانەدە دبینە

سسێ: كەسێ نەزان كو بێ موازەنە بێ موحاكەمە ئو نە بمێزێنا قورئانو سوننەتێ لحادیسا دنەڕە، لگۆرا عەقلو فەهما خوەیا كێم مێزێنێ چێدكە

چار: كەسێ كو هەم حرصا خوەیا ئینتیقامێ ئو غەرەزا خوەیا شەخسي فەدا ناكە هەم ژي خوە قورە دكە دبێژە ڕحێ من دبەر ملەتێ مندە فەدابە

پێنج: كەسێن خودیێ هنك فكرێن نە مەعقول؛ وەك كەسێ كو فكرا موختاریەتێ بوانڕە هەیە ژبۆ كو لهنك هەرێما ببن سەر بخوە، وەك طەوائیفێ ملوك یان ژي بەگیتي، ڤانا دخوازن ئوممەت ژهەڤ بكەڤە ببە پرچە پەرچە ئو هەر قەمك ببە بسەرێ خوە، یان ژي كەسێ كو بناڤێ «جمهوریەتێ» فكرا ئیستیبدادا مطلەق بوانڕە هەیە (وەك ڕەزما كەمالیست) دبن ناڤێ جمهوریەتێدە ظولمێ دكن.

شەش: كەسێ كو بەرێ ظولم دیتنە ئو كین گرتنە (وەك ئەرمەنیا)، تەحەممولا وان ژ عەفو و ئاشتیا عمومیڕە تونەیە، عەفو و ئاشتي ژي قەنجیا یەكمینە ئا حورریەت و مەشروطیەتێ، ڤانا دخوازن بحوزورا خەلكێ بلیزن وان بینن هێرسێ ئو تەڤلهەڤي و شەڕ دەركەڤە ئو دەولەت لموسلمانانخە دلێ وان ڕحەت بكە»

ناڤێ وێ چ دبە برا ببە حەتا كو ئیستیبداد هەبە وێ ڤان هەر شەش صنفا هەبن، ڤان صنفا فێكێ ئیستیبدادێنە.

# ئەي گەلي كوردا! سەعادەت و دلڕحەتیا وە نە دبەریكا هنك كەساندەیە



عبد الصمد حلمي

## هَڤْپَيْڤِينَا جِڤَاكَا كُورْدَاَن بِسَيْدَاَي بَدِيعُ الزَّمَاَنْه: رَچَتاَ كُرْدَاَنْ-١٥

بسم الله الرحمن الرحيم

﴿پاشایێ پاشایان سولطانێ ئەزەل بموسیقا خوە یا ئیلاهي كو قورئانە تەمامێ عالەمێ دادگرە، دقوببەیا ئاسیمانانده «زرمین»ێ دەرتینە، وەكهاوێ كو لشكەفتێكەڤە لدەڤ و قەلب و دیماغا عولەماو مەشایخ و خوطەبائان دخە، عەكسێ صادا ژزماني وان دەردكەڤە، دچە و دهەڕكە، بصادایێن چەشیت چەشیت بزرمینان دنیایێ دلەرزینە، بتەجەسسوما وي صادایي عمومێ كتێبین ئیسلامي دخە حوكمێ تێل و شەریدێن طەنبورێ، ئو هەر تێلەك بنەوعەكي وي ئیعلان دكە. كەسێ كو ڤي صادایێ سەماوي ئو ڕوحاني بگوهێن قەلبێ خوە نەبهیزە و گوهداري نەكە وێ چەوا ڤزڤزێن زلامێن حكومەتێ ببهیزە؟ حال ئەوە كو دەنگ و ڤزڤزێن زلامێ حكومەتێ بنسبەت وي صادایي وەك «ڤزڤز»ا كەلمێش و مێشێ یە﴾

ئی كو دینێ ئسلامێ محافەزە دكە خوەدایە نەحكومەتە، هون لحالێ خوە بنەڕن كا هون چقاس بدینێ ئیسلامێڤە گرێداینە. بگوهەڕتنا حكومەتان دین نایێ گوهەڕتن ئو بپاش ناكەڤە، بس هون خوە بدینێ ئیسلامێڤە بگرن ئو بئیسلامێ پێشڤە هەڕن

﴿كەسێ كو بئینقیلاب و گوهەڕینێ سیاسي ژدینێ ئیسلامێ بترسە ئو بێژە وێ ئیسلام ڕابە ئەو كەس ژ ئیسلامێ پارا خوە هندك سطەندیە، پارا وي زەعیف كەتیە بویە وەك بَيْتُ الْعَنْكَبُوتِ (كۆنكێ پیرێ). حالێ كو تێدەیە ئو وي دترسینە جەهالەتە، ئو بسەبەب كو ئیماناوي تەقلیدیە دقەلقە. چمكي كەسێ كو ئیعتمادا وي پێ تونەبە ئو بخوە نە ئامن بە سەعادەتا خوە ژي دبەریكا حكومەتێ تەنێدە دبینە، قەلبێ خوە ئو عەقلێ خوە ژي دكیسێ حكومەتێدە خیال دكە، لۆما دترسە﴾

حال ئەوە كو دینێ خوە ناس بكە، ئیمانا وي تەحقیقیبە وێ عەقلێ وي نە دبەریكا كەسیدەبە ئەي گەلي كوردا! سەعادەت و دلڕحەتیا وە نە دبەریكا هنك كەساندەیە، هون وها ظەن دكن بەس حەقیقەت نە ئەڤە، بسەبەب كو وە عقلێخوە و قەلبێ خوە و حەسكرنا خوە خستیە كیسكێ هنك كەسێن نە ئەهل هون لسەر كیسێ وان دقەلقن و بزمانێ



# EY GELÎ KURDA! DIL ADIYA WE NE DI BERÎKA HINIK KESAN DE YE

## Hevpeyvîna civaka Kurda Bi Seydayê Bedî'uzzeman re Reçeta Kurdan - 16

✍ M. 'Ebdussamed 'Hilmî

"Paşayê paşayan, sultanê ezel bi musîqiya xwe ya Îlahî ku Quran e, temamê 'alemê dadigre. Di qubbeya asîmanan de "**zirmîn**"ê dertîne. Wekhawê ku li şikeftêkeve li dev û qelb û dimağa 'ulema û meşayix û xutebaan dixe. 'Eksê sada ji zımanê wan derdikeve, diçe û diherike. Bi sadayên çeşit çeşit, bi zirmînan dinyayê dilerizîne. Bi tecessuma wî sadayê 'umûmî kitêbên Îslamî dixe hukmê têl û şerîdên tenbûrê û her têlek bi new'ekî wî î'lan dike. Kesê ku vî sadayê semawî û rûhanî bi guhên qelbê xwe nebihîze û guhdarî neke wê çawa vizvizên zilamên hukûmetê bibihîze? Hal ewe ku deng û vizvizên zilamê hukûmetê bi nisbet wî sadayî wek vizviza kelmêşê ye."

Ê ku dînê Îslamê muhafeze dike Xweda ye ne hukûmet e. **Hûn li halê xwe binerin** ka hûn çikas bi dînê Îslamê ve girêdayîne. Biguhertina hukûmetan dîn nayê guhrtin û bi paş nekeve. Bes hûn xwe bi dînê Îslamê ve bigrin û bi Îslamê pêşve herin.

"Kesê ku bi înqîlab û guherînê siyasî ji windabûna dînê Îslamê bitirse û bêje wê Îslam rabe ew kes ji Îslamê para xwe hindik sitendiye, para wî ze'îf ketiye bûye wek "beytul'enkebût"ê (konikê pîrê). Halê ku ew têdeye û wî ditirsîne cehalet e. Û bi sebeb ku îmana wî teqlîdiye diqeliqe. Çimkî kesê ku î'tîmada wî pê tunebe û bi xwe ne aminbe se'adeta xwe jî di berîka hukûmetê de dibîne, qelbê xwe û 'eqlê xwe jî di kîsê hukûmetê de xiyaldike, loma ditirse."

Hal ewe ku dînê xwe nasbike, îmana wî tehqîqîbe wê 'eqlê wî ne di berîka kesî de be.

Ey gelî Kurda! **Se'adet û dilrihetiye we ne diberîka hinik kesan de ye**. Hûn wiha zen dikin bes heqîqet ne ev e. Bi sebeb ku we 'eqlê xwe û qelbê xwe û heskirina xwe xistiye kîsikê hinik kesên neehil hûn li ser kîsê

wan diqeliqin û bi zimanê wan diaxıvin û bi axaftina wan difikirin û bi fikrên wan hereket dikin. Heger hûn dînê xwe rast nasbikin û bi 'ilmê ji teqlîd û îmana teqlîdî bifilitin û xwe bi Îslamê ve bigrin hûnê dilşad û bextiyar bibin, hûnê ji înqîlabê dunyewî netirsin.

S: -"Tu baş dibêjî bes hinik kes wek te nabêjin. Dibêjin gerek Mehdî were. Çimkî dinya me pîrbûye û lihevketiye. Her kesek li gora meslek û meşrebê xwe Îslamê bi cîkî ve dikşîne, tevlîhevî ketiye nav Îslamê jî.

C: -"Heger 'ecele bike û were ser sera ser çava, bira nesekine were. Çimkî bi rabûna îstîbdadê rê jê re vebûye, ciyê wî hazir e û em jî hazirin. Wek hawê ku hûn zen dikin rewş ne xerabe, di biharê de kulîlik vedibin. Ji şuûnatê rehmeta Îlahi ye ku sefalet û perîşanî û şerpezeyiya vî milletî rabe. Belê ez vê jî bejim: Kî ji we bêje zeman bi temamî xerabûye û meyla dewra bere dewra îstîbdadê bike, ewjî bi nezanî –wek zenna ecnebiyan- neqenciyên însanê bere dixe sityê Îslamê"

Di dewra îstîbdadê de ecnebiyê ğeyrîmuslim xetayên ku ji fi'lê şexsa çêdibûn dikirin mal ji Îslamê re. Heger hûn jî xerbiyê îro bêjin û bêjin dewra berê baş bû hûnê xwedî derkevin li zulma zalimên berê, hûnê bi nezanî xetayên zalima meşrû' bibînin û têkevin sefa kafira.

S: -"Kesên ku fikra xera dikin û meşrûtiyetê baş nabînin kîne?"

C: -"Ê ku meşrûtiyetê baş nabîne û fikrê însanan xera dike cem'iyeteke. Reîsê vê cem'iyetê hene, ew jî ev in: **Yek; cehalet ağa, ê duduwa; 'înad efendî, ê sisya; ğerez beg, ê çara; întîqam paşa, ê pênca; hezretî teqlîd, ê şeşa; mîrze geveze"**

"Di nav new'ê însanan de kesê ku întîsabî vê cem'iyetê dikin ev in:

**Yek:** Kesê ku dirhemik zirara xwe nade bi hezar baqnot menfî'eta muslumana.

**Dido:** Kesê ku menfî'eta xwe di zirara însanan de dibîne.

**Sise:** Kesê nezan ku bê muwazene, bê muhakeme û ne bi mêzêna Quran û Sunnetê li hadîsa dinere, li gora 'eql û fehma xweya kêm mêzênê çêdike.

**Çar:** Kesê ku hem hirsa xweya întîqamê û ğereza xwe ya şexsî feda nake hem jî xwe qure dike dibêje ri'hê min di ber milletê min de feda be.

**Pênc:** Kesên xwedyê hinik fikrên ne me'qûl; wek kesê ku fikra muxtariyetê bi wan re heye ji bo ku li hinik herêma bibin serbixwe. Wek tewaîfê mulûk yan jî begîtî. Vana dixwazin ummet ji hev bikeve bibe perçe perçe û her qewmek bibe bi serê xwe. Yan jî kesê ku bi navê cumhûriyetê fikra îstîbdada mutleq bi wan re heye (wek rejma kemalîst) dibin navê cumhûriyetê de zulmê dikin.

**Şeş:** Kesê ku berê zulm dîtine û kîn girtine (wek ermeniyan), tehemmula wan ji 'efw û aşîtiya ûmûmî re tuneye. 'Efw û aşîtî jî qenciya yekemîne a 'hürriyet û meşrûtiyetê. Vana dixwazin bi 'huzura xelkê bilîzin, wan bînin hêrsê û tevlihevî û şer derkeve û dewlet li muslumananxe, dilê wan rihet bike."

Navê wê çi dibe bira bibe heta ku îstîbdad hebe wê van her şeş sinifan hebin, vana fêkiyê îstîbdadêne.

Musîqî: Müzik
'Eksê sada: Ses yankısı
Vizviz: Vızıltı
Şuûnat: Özellik

# Huzûr Li ber Serê Min...

Fethullah YALÇIN

Huzûr li ber serê min...
Tebessuma zaroka li ber çavê min, ez ji çivîka biçûktirim.
Xewnû xeyal li dor min dizîvirin
Kelha Amed, şahidê hezarsala bitev Dîcle.
Ezê gazîya xwe bighînim Îbnulwelîd.
Stêrkên rûyê erdê çewa herikîn vî bajarî
Bi kîjan 'eşqê deşt û çîya, ayet ayet, sehra sehra derbas bûn ser sênga welatê me.
İşaretek qudsî ji Medîna Munewwer wek brûskê li vir ket, di pey re cîhad, ehlê cesaret û îman,
Ey mensûbên 'esra seâdet hûn bixêr û ser çava hatin
Amed û welatê me bi we muşerref bû.
Mêvanê gul û gulîstanê li bin bedena Dîyarbekir di xew de ne.
Em bi we huzur û xweşî dibînin hê jî, ehlê îman bi umîd in bi we li mala xwe.
Ez heyran im ji bo welatê xwey evîndar.
Evîndarê 'eşqa sorgula.

Bi salû zemana di xebitin cotkarê kîn û hesedê li xerakirina gulşena welatê min.
Xwestin bi hîlew desîseyên şeytanî pêşya rojê bigrin.
Di qernê bîstî de roja me çûbû ber ava.
Îro li xerakirina mala me di xebitin
Tarîw zulûmat, fisqû ficûr bi zor tê hebandin
'Îda me hundurê wê vala kirine
Hetanî do welat cîhû warê 'aliman bû.
Hêlîna 'îlm û îrfanê, ji medresa fuqeha û 'ûlema radibûn.
Lewra milletê Kurmanc xwedî exlaq û namûs bûn.
Çi hezine li pey şopa îro sergerde bûn.
Neyarê namûsê ji nav me derketin.
Musweddew bel'em fetwa cehlû kufrê didin.
Hey çêlîyên rêzkar û bardarê sêncû dirrîya
Destê we hişk bibin hûn torinên Ebûleheb
Li rêya mûhebbetê rêzdike û dixitimîne dayka wê ummû cemîl
Hûn ji wê zihnîyetêne ku derewê Museylîme ji heqîqeta Muhemmed biwe xweştirin
Bel'em û munafiq bi şeytan re dixebitin
Gem avêtin devê heqiqetê.
Xwe frotin bihayek erzan.
Welat mehzûn, camî mehzûn, bangû azan mehzûn
Dinav neyaran govend û şahîye, di gundê meda şînû girîn
Teyrû berxik nalîzin bihar nehat
Kulîlka pel weşandin ji kerbê zozan hilat
Stêrk digrîn nav çenga min, asîman mehzûn, ruyê xwe gihandîye erdê
Hişk û ğelaye li warê şer'ê, nivîs û qelem şewitîn
Ez li ser mîrasek mezin rûniştim
Ez têm kuştin jî meğlûb nabim
Ez hurrum bê hedd û qîyas
Belê di qeyd û zincîrê zêr û elmas de ez esîrim
Ez ji çivîka jî biçûktirim di qefesek yaqût de mêvan im



Weqtek ji weqta ʻumûmî, hemî şev û roja di xwe de dihebîne.
Ez wê demê di huzûra ʻalîde qaîm im
Kesê li huzûrê ne sekine huzûr nabîne
Zeman hesûd e li hember seâdeta min
Ezê rextê hubrû qelemê girêdim li ser dilê xwe
Li ser bedena Dîyarbekir ji biharê qesrek asûde avakim
Li serê dîwanê çok bidim li ber murşidê kamil
Derdê welat birêjim ji tarîx û zeman kula xwe bêjim
Dervê wê ʻâlem şewitand hundurê wê min dihelîne
Mewc û pêlan di navbêna min û wêde yek yek hatin û çûn
Jîyan jî bi vî hawî ye min çav girt û vekir her wiha hatû çû.
Rêwîyên se'adetê bi pişta destê xwe xezînê dunyewî bi paş ve da'fdan
Çi curmû guneh hene li bendî ʻefûkirinê seknandî
Di dema ji keçika me'sûm were pirsîn ji kîja gunehî tu hatî kuştin
Sûreê tekwîr hat bîra min bi tev xeşyeta xwe di ber çavê min de derbas bû
Belê Yasîn ji bo çi hat şewitandin
Çima ne carek belkî sed car kuştin di bedena nazenîn de ʻumrê min
Çiqas curm û wehşet hene li bendî ceza.
Roja giran çewa derên hember Şedîdul-ʻÎqab
Kelîme û rêz vê kulê îfade nakin
Di boxçikên bûka de hesret heye.
Govend û dîlanê me bi kul û kerb digerin
Demsal û eqlimê welat geh payîz e geh zivistan
Bihar li pişt çîyayê qaf e dibêjin
Teyrê zumrut heye li wir ku azadî di nav bazikê wî de ye
Di heyûla azadîyê de kulîlkê min çilmisîn

Ey xwedyê mohr û wehyê, rûyê zemîn ʻewareye
Ji asîman rehmet dibare li jêr dibe agir û ʻezab
Çêlîyên Mazdek û Lenîn, torinê Ebûcehil ji bo pûtên xweyî zeman qûrbanê nû dineqînin
Em têne kuştin di her agirî de
Di tarîw zulûmatê de ecnebîyên zulmetê li ber me kemînê datînin
Çavê dayîka li bendeye ji bo her xeberkî belki dibe agir û wêran her cîyê ku agir lê dikeve
Şîn û matem heye li welat sitranû axîn dertên ji sênga xwengû bira
Çi heye tuneye nayê jibîrkirin bi xweyna şehîda tê nivîsandin
Axa vî welatî emanet sitendîye rûhên şad û em tucarî jibîr nakin
Darû ber deştû çîya, xwedyên dilê safî heqîqeta îlahî dibakin:
ŞEHÎD NAMİRİN, ŞEHÎD NAMİRİN

Em qasi îmana xwe bawer in li Dîyarbekir li Cizîrê li Mêrdîn li Hekkarî o li her alîyê welat mizgîne tê.
Bi destê zarûka roj bilind dibew ronaya wê digre hundurê xanîyên me
Xwedyê zulm û zulmetê çibkin bê faydeye
Sond û qesem tên dayîn bi wî Xwedayê ku îlham dixe qelbê şa'ir
Dibêje ji asîman qerarek nazil dibe
Li ser qedera qederek mestir heye
Heta ev ruh di bedene de be o em xwedî îman li rûyê zemîn hebin
Hetanî zafer bibe nesîbê heqqîye
Heqq cîyê xwe bibînew hukmê heqqîye carî bibe
Li cîhanê emê bi îmana xwe bijîn o emê heyatek bi îman ava bikin
Bİ NAVÊ XWEDAYÊ REHMANÛ REHÎM…



# SÛREYÊ TÎN SER YO VATEYO KİLM

بِسْمِ اللّٰهِ الرَّحْمٰنِ الرَّحِيمِ

وَالتِّينِ وَالزَّيْتُونِ(١)وَطُورِ سِينِينَ(٢)وَهٰذَا الْبَلَدِ الْاَمِينِ(٣)لَقَدْ خَلَقْنَا
الْاِنْسَانَ فٖى اَحْسَنِ تَقْوٖيمٍ(٤)ثُمَّ رَدَدْنَاهُ اَسْفَلَ سَافِلٖينَ(٥)اِلَّا الَّذٖينَ اٰمَنُوا
وَعَمِلُوا الصَّالِحَاتِ فَلَهُمْ اَجْرٌ غَيْرُ مَمْنُونٍ(٦)فَمَا يُكَذِّبُكَ بَعْدُ
بِالدّٖينِ(٧)اَلَيْسَ اللّٰهُ بِاَحْكَمِ الْحَاكِمٖينَ(٨)

Yûsuf ARÎFOĞLU

***1- Sondi bi tîn û zeytunî,***
***2- Sondi bi kuyê Sînayî,***
***3- Sondi bi in şarîstano emîni rî,***

Homa, Quroni di zey 'tîj, aşm, şew, qalem, nuşte, astere..' zaf çîyon ser sond wuneno.
Gelo, çira Homa, înon ser sond wuneno?
Helbet, îxtîyacê Homê çînî ya ku meselêk û vatişêk ser şahîd bîyaro; qey îspatkerdişê raştîyê qalê xu yownabîn bimuecn ra.
Sondê yi ra meqsed ina wa;

- Çîyeko yi ser sond wuneno qiymet dayişê ci,
- Çîyeko sond dima yeno dîqqet ontişe ci,
- Çiyeko yi ser sond wuneno duzkerdişê fikreko xirabî ku în çîyon ser peyda bîyo…

Tike vonî ita di '**zeytun û tîn**'i ra meqsed di heb ko yê. Koyê Tîn ha Dimeşq' da, koyê Zeytun uca wo Beyta Meqdis ha seri di. Zafî alîmî zî vonî tîn/încir û zeytun fekî yê.

**4- Raştî ra ma înson bi tewr şekleko rind viraşt,**

Homê, wextêko înson viraşti bi çira yi endek rind û baş viraşto?
Sirrê ci ina ayeti di bena eşkera. Bîşek, Homê her çî rind û sen'etin viraşto. İta di bi taybetî behsê rindiyê înson hina yena fohmkerdiş; Homê, înson xu rî kerdo 'ebd û xelîfe û ayra qiymet û rumet dono însonî. Çendek, fıtrat ser înson, zeîf o, reya raşti ra vecîyeno û xirabî keno rina zî Homê ina ayeti di qiymet dono ci ku, ceyê Homê û mîyonê mehluqaton bînoni di gironî înson est a.
İna rumet û qiymet, hem viraştişê hem esayişê bedenê hem eqlê hemî zî ruhê însoni di esena; ha verê çimoni di û xu muecnena ra.
İta di gironî dîyena taybetîyê însonî zerreyin. Wextêko înson reya heqi ra vecîya û ce'deyê îmoni ra zivirya bi ina taybetîyê xu serucêr lêr beno. Çimki akerdîya ku, înson bi leşê xu serucêr lêr nêbeno.
Viraştişê însonî di ina berzî, qiymet û rumet taybetîyê yi zerreyini ra wa. Înson, hina yo xususiyeti do eşkeno meleketoni ra diyar mertebêk bigero.
Wakayê Mî'rac inay rî yo delîl a. Mîraci di Cebraîl heto yo ca şîyo û uca di vinerto; labelê cinsê însonî ra 'ebdêk(Muhammed aleyhisselam) binena veta şîyo û veciyo meqema tewr berzi.

**5- (Û) dima (ma) wu çarna a, (derecayê) cêrînê cêrînonî.**

Hetêk ra înson reya raşti ra biveciy yo mehluqi zî çînî yo kon, a mertebeya cêrîne ku înson kono ci; lêr

beno ê çalono ku yo zî nêkono ci. Homa vono, '(Û) dima (ma) wu çarna a, (derecayê) cêrînê cêrînonî.' Çira? Çimkî hina yo hali di heywon, însonî ra tewr berz î û reyê heywonon duştê ina reya xirabi di tewr hol monena. Çimkî, heywon, a ku Homê yin a viraştiş/fitrat ser viraşt ayi ra nêvecênî, xilafê viraştişê xu hereket nêkenî. Bi ziwonê xu Homê tesbîh kenî, a wazîfe ku diyawa yin a wazîfe bîqusur anî ca:

Mues, tima tim engimin virazena; monga tima tim şit dona û kergi zî hak kena.

Înson, tewr rind yo şekli di viraziyo; labelê Rabbê xu înkar keno, emrê yi nêano ca, xirabî keno, şehwet dima şino, weswesonê şeyton ser xapîyono… İnay ra a cêriyêka heywon nêkonî ci, înson bi ina nankuariyê xu kono ci û lêr beno.

'Raştî ra ma înson bi tewr şekleko rind viraşt.' Dima, înson bi ina fitratê xu ê reyê ku Homê muetî ci wa ê di heb rêyoni ra yo bivicino. Wextê ku înson a xeti ra zivirya ma zî 'Wu çarna a, (derecayê) cêrînê cêrînonî.'

**6- Tena aye ku bawerî ard û amelo salîh kerdo, yîni rî ecreko est o çire nêbiryeno**

Ê ku fitrat ser monenî, fitratê xu bi îmon û gureyono başin veceno gil û keno rind; bi ina fitrat meqomonê manewî di benî berz û peynî di warê wêşi di bi ina fitrat raseni yo heyatêko wêşi aha ê est î; qey enon mûkafatêko nêbiryeno est o. Hina yo mûkafat a, tim est a û pêniyê ayi zî çîk nîno.

Ê ku bi fitratê xu reya heqi ra cîya benî û konî derecayê cêrînê cêrînon û bi inay lêr benî bin û peynî di tewr bini di monenî he ceherme di. Uca di însonîyetê xu gurewta binê lingonî. Yi zî he binê cehermi di perpityen û vinenî.

Ina û a, noqtayê destpêki dima di heb penîyê tabîî yê… Ya reya zixm inê fitrat, ina fitrat bi îmon rasnenî rasayiş û bi 'amelo hol azîz î… Ku penîyê ina reya di raseno heyatêko nêmirenî û cuyayêko rind.

Yan zî fitrato zixm û raşti ra ziviryayiş, sarê ser kowtiş û nefeso îlahî ra cîyabîyayiş… Ku penîyê ina reya di ceherme est o û bi a zelîlî, îsyan, xirabî, nêbaşî adiri di kono tebeqaya tewr cêrîn.

Hina cuyayê însoni di qiymetê îmon xu muecnena ra. Îmon, hina yo gil a, fitrato zixm û raşt uca di raseno yo raseyişêko bîkemî.

Îmon, benatê fitratê înson û viraştoğê yi di yo rasene yo. Îmon, yo çila wa; in heyati di reyê însonon kena raşn, yin tarîtî û kefoni ra zivirnêna rehetî ser. Wextêko in rasene qerifya, ina çila şî hona penîya bêşek kowtişê însonî a derecaya tewr cêrin û yo sêrcêri di rî ser lêr bîyayiş û vînkerdişê însonîyet a. Înson, çita bivîno? Wu û kerrê pîya adirê ceherme rî bî kueli.

**7- (Ey înson) bade inay çita tu dînî(ruecê axîret ser) dono zûrkerdiş?**
**8- (Gelo) Homa hakîmê hakîmon nî yo?**

Binê raşniyê ina çila di Homê ma veng dono ma: İna raştî dima, o çita wo ontişê hesab û ruecê qiyamet ser tu dono zûrkerdiş?

Eya înson ti heyatê xu di tohmê îmon gurewti û ti zona qiymetê hîdayet çendek a; rina eşkera bî ê ku reya heqqi ra vecênî, şeyton xu rî ombaz depişênî, çilayê Îslom ra xu pawênî penîyê yin ceherme yo. İnay ra pê o çita wo ontişê hesap û ruecê qiyamet ser tu dono zûrkerdiş?

**(Gelo înson) Homa hakîmê hakîmon nî yo?**

Ku ti hina serkêşî kenê, ti xu zeliqnenê zûronî?

Wextêko qulon xu rî bi vicnayişê xu ya reya heq yan zî reya batil depişt, bi eqlê xu ya îmon ya kufir ser tercîhê xu kerd gelo Homa hîn yin ser ya bi wêşîyê Cennêt yan zî bi adirê Ceherme hukum bi do Homa, 'adîlê 'adîlon nî yo? Hukumêk in îmtohon, ina sonayiş dima qey însonon dîyena aya ser Homa hukmê xu di weherê hîkmet nî yo?

Hukmê Homê di 'adalet eşkera wa. Hîkmet, kifşkerdî ya… Inay ra, yo hadîsêka merfû Ebû Hureyre ra rîwayet bîya Peyxemberê ma Hz. Muhammed silomê Homê yi seri bi hina vono:

"Wextêko şima ra yo yî sureyê Tîn wend û omi ayetê peyîn(Gelo, Homa hakîmê hakîmon nî yo?) wa vaco 'Bela, ena mîneş- şahîdînê(Erê, ez zî inay ser şahîdono ra wo.)"

# Di Hedîsên Axirzeman de Cereyana

# Hz. Mehdî û Deccal-1

✍ Selamîyê Bilêderî



Tevahîyên 'hemd û sena layiq û babetê Elah Te'âla ne. Bi qasî hejmara zerratên kaînatê Selat û selam li ser Resûlê Ekrem û al û eshab û etba'ê Wî bin.

Gelî xwendevanên Banga Heq yê hêja û bi rûmet! İnşallah emê di vê rêzenivîsa xwe de îzah û haşîye a çend 'hedîsên di derheqê cereyana 'Hz.Mehdî û cereyana Deccal de bikin.

Digel kû hedîsên ji axirzeman û 'Hz.Mehdi û cereyana wî û ji Deccal û cereyana wî xeber didin di kullîyatên hedîsa de bi kullîyet cîh digrin jî, ji ber ku di pêşîya fêmkirin û şerhkirin û gihandina wana bi bal gel de, hin astengên giring hene me xwest ku em di vî warî de rêzenivîsek taybet binvîsin.

Ev rêzenivîs, ji eserekî ku hedîsên axirzeman tê de berhevkirîne cûdatir e. Ev nivîsa me bi tenê ji bo zelalkirina cereyana 'Hz. Mehdî û ewê ku wê zemîn jê re hazir bikin û cereyana Deccal hate nivîsandin. Lewra ji ber ku e'xlebê hedîsên ku behsa 'Hz. Mehdî û Deccal û cereyanên wan dikin ji teref gelek kesan ve nayên fêmkirin û qismekî wan jî ji new'ê muteşabîheta ne û şaş têne fêhmê yan jî bişik li wan tê nihêrtin me ev nivîs ji bo şerha wan nivîsî. Da ku astengên di pêşîya fehmkirin û îstîfadekirina ji van hedîsa ji holê bê rakirin. Ev 'hedîsê han bi giranî di derheqê 'Hz. Mehdî û cema'eta wî a nûranî û ew cema'eta pêşenga ku wê ji wî re zemin hazir bike u cereyana Deccal de ne. Di kitêbên 'hedîsa de ev 'hedîs wek 'hedîseyên axirzeman hatine zikirkirin.

Di warê şaşfêmkirina van 'hedîsan de gelek sebeb hene. Hinek ji wan ev in;

1. Hinek îlahîyatnasên neyarê Sunnet û hedîsê ku ehlê dalaletê ne û bi sala ye ku bi riya medya û neşrîyatê, di 'eleyhîyê hedîsan de, xebatên îfsadî dikin. (Em, îlahîyetnas û 'alimên mutteqî tenzîh dikin)

2. Xebata İfsadî ya hin 'alimên ji fikrê meâlvanên

Xaricî û Mû'tezîlî; di encama îfsada wana ku bi salan e di 'eleyhê hedîsên ku bi 'eqlê wan nakevin de didomînin di zihnê gelekê gel de di derheqê sehîhbûna wan hedîsan de şik çêbûye.

3. Şik û têgihîjên ku bi gotin û nivîsên ku ji teref 'alimen bê mezheb ve hatine çêkirin. Ev 'alimên cahil xwe ji suretê heq nîşan didin û bi gotinên avzêrî ê wek "İslama Qur'anê, Ev tişt di Qur'anê de tune ye û… hwd" ji hedîsên sehîhê ku bi eqlê wan nakevin re dibêjin: "Ev hedis mewdû' e û di her platformê de bi van gotinên je'hrî, zihnên safî şêlû dikin.

4. Temamê eserên hedîsa yên 'Erebîyê ku di derheqê bûyer û şexsên axirzeman de warid bûne, hê tercûmeyî Tirkî yan Kurdi nebune.

5. Millet û komên te'essupkar ji ber ku dixwazin 'Hz.Mehdî û cereyana wî yan jî alîkarên wî, ji milletê wan yan jî ji cema'et û meşreba wan bi xwe be. Ji ber vê yekê, m'enê şaş li hedîsa bar dikin û serê gelek gelan tevlihev dikin.

6. Ji teref hinek 'alimê nîyetqenc ve şexs û xusûsîyetên Deccalên Îslamê (Sufyan) û Deccalê 'eslîyê ku di hedîsan de behsa wî tê kirin hatîye tevlihevkirin. Ev tevlihevî jî bûye sebebê şaşfêmkirina van 'hedîsa.

7. Rawîyên hedîsa, xebatên Deccal û hadîseyên ku dê di pêş de pêkwerin bi bal dorhêla Şam û 'Erebîstanê ve teswîr kirine. Lewra ji ber ku di zemanê rawîyên hedîsa de, merkeza xîlafetê bajarên Medîne û 'İraq û Şam bûn rawîya zenkirine ku wê her wisa bimîne. Ji lew bi îctîhada xwe, maneyekî wisa li hedîsa barkirine. Û wuqû'at û buyerên ku di wan 'hedîsa de qala wan tê kirin jî li gora merkezên xîlafetê teswîr kirine. Yanî merkeza pêkhatina bûyerê wan 'hedîsa wek Heleb û Şamê nîşan dane. Xebera hedîsê ya kin û xwerû bi îctîhada xwe berfireh kirine.

8. Di vî warî de e'xlebê hedîsa, bi şeklekî kurt û kin behsa bûyerên ji 'eynî celebî ku dê di pêş de tekerrur bikin dikin. Ji lew hinek hedîsên cuda cuda ku di her carekî de, alîyekî buyerê beyan dikin, ji teref rawîyên hedîsa ve hatine bihevgihandin, weke dûrî 'eqil xuya dikin.

9. Xeberên hedîsên di derheqê axirzeman ji ber ku te'elluqî 'xeybê dikin, hin ji van hedîsan, ji bo ku ne dijraberê sirrê îmtîhanê bin, ne tenê li 'esrekî yan buyerekî dinerin, belkî li gelek 'esr û buyerên wekhev dinêrin û ne bedîhî ne. Ji ber van sedeman hin hedîsên di vê derheqê de, ji new'ê muteşabihata ne.

10. Evan hedîsên ku em behsa wan dikin, ji ber ku ji îstîqbalekî hezar û pênsed salî xeber didin; Resûlê Ekrem 'Eleyhîsselatu Wessellam, bi şeklekî ku xîtabê her 'esrî bike bi dereca dawî a bela'xetê beyan kiriye. Ji ber vê yekê, ji bo ku meriv e'xlebê lefz û mefhûmê wan hedîsa fêm bike, divê meriv ji 'ilmê bela'xetê ê wek bedî, beyan û me'anîyê û… hwd, ji 'ilmê serf, nehv, wedi' mentiq û munazere, ji 'ilmê usûlên hedîs û tefsîrê û siyer û dîrok û erdnîgarî û antropolojîyê jî hayîdar be.

11. Hedîsên ku xebera cereyan û îqtîdaren hin şexsên axirzeman didin (ev 'hedîs di 'esil de, bi kînaye, ji girsehîya şexsên wanê manewî ku mumessîle wanin behs dike.) Bi şaşîtî hatîye zenkirin ku hedîs behsa wî mumessilê şexsê manewî dike. Ji ber vê yeke jî hin nîv'alimê ku ev hedîs neçûne serê wan, rabûne ev 'hedîs înkar kirine. Wek mînak di hinek hedîsa de, qama Deccal 'ecêb bilind, a 'Hz. Mehdî jî bi qasî ku bigîje çoka Deccal kin hatîye teswîrkirin. Ev û hin hedîsên weke vê hedîsê, di 'esil de, bi terza bela'xetekî xarîqul'ade û bi şeklekî mu'cîzewî, cereyan û şexsê m'anewî yê wan şexsan û qeweta wanê zahirî teswîr kiriye. Lê van nîv'alima 'Hedîsên wihareng şaş fêmkirine.

Hedîsên ku ji buyer û şexsên axirzeman xeber didin, ji ber ku pirin şerh û îzaha wan jî li gorî wan dê zede bin. Lê ji ber şert û mercên zîndanê gelek kitêb û çavkanî yên 'Erebî di bin destê min de tunene. Hem si'het û wextê min jî ne musa'id e. Ji lew me şerh û şîrovekirina hedîsên di derheqê şexse Hz. Mehdî, nuzûla Hz.'Îsa, şexsê Deccal û Sufyan û şexsên din ê ku wê di axirzeman de werin û gelek buyerên muhîmê ku wê çêbibin bi paş xist. Lewra di mijarekî wiha dormandor û muhîm de eger meriv ji dêvla bi delîl û îzahên kêm yan jî meşkûk, temamê hedîs, rîwayet û şerhên di vê derbarê de, bi şeklekî dormandor tehqîq neke û eserekî te'lif

bike nenisvîsandina wê te'lîfê ji te'lîfa wê bi xêrtir e.

'Hedîsên ku herî zede tên sûîstî'malkirin û manê wan herî kêm tên fêmkirin û herî zede tên înkarkirinn û bi şik li wan tê nihêrtin 'hedîsên axirzeman in. Lewra pirê van 'hedîsa muteşabîh in. Ji lew me niyet ew e ku em dê di pêş de di vî warî de eserek berfireh û taybet te'lîf bikin.

Ez ji Rebbê xwe nîyaz dikim ku ev eser, bibe wesîla fêmkirina wan hedîsên ku serîhen, teşbîhen, îşareten û remzen ji cereyanên Hz. Mehdî û Deccal be'hsdikin. Hem dîsa em ji rebbê xwe niyaz dikin ku ev eser bibe wesîla xizmeta Îslamê û heta qiyametê bi vê wesîlê li ser deftera 'emelê min û xwendevana xêr bibarin.

Eger ev xebata me bi însana re 'elaqe û meraqekî lêkolîna li ser van 'hedîsa peyda bike em dê xwe bextewar û dilşad bi'hesibînin. Lewra meraq mamostê 'ilmê ye.

Ya Rebb! Tu bi xatirê Hebîbê Ekremê xwe 'Eleyhîs-selatu Wes-selam kî eger me ji bîr kir yan jî em 'xelitîn, tu li me negre. Tu bi 'ef û me'xfîretê li me kerem bike lewra ev herd û wesf her şan û nîşanê te ne. Li me were rehmê lewra her Tu yî Mewlayê me. Me li hember koma kafira bi tenê nehêle lewra her tuyî xwedî û Xwedayê me….

---

**İfsadî:** Titne û fesadî,
**Xaricî:** Mezhebek sîyasîyê Islamî ye li ser ixtîlafa Hezretî û 'Elî Mû'awîye derketîye holê. Ev firqe di tarîxa Islamê de di gel îxlasa xwe bi fikrên xweyê tûj û tekfîrwarî hatiye naskirin. Wek Ezariqa,Necedat, Sufrîyye, Acarîde û İbâd'îyye gelek şaxên vê ekole hene. Nuha tenê şaxa 'İbadîye li dorhêla 'Umman, Cezayîr û Tunûsê bandordar e.
**Mû'tezîlî:** Mezhebek îtîqadîyê Islamî ye. Damezrînerê vî mezhebi Vasil bîn 'Eta ye. Ev mezheb bi fikra xwe ya di warê qeder û qezayê de ji mezhebên dî vediqete.
**Hedisa mewdû':** Ew 'hedîse ku ne ji alî 'hezretî pêxember ve hatiye gotin lê ji teref hinek derewkaran ve bibal wî ve hatiye nîsbetkirin.
**Te'elluqî 'xeybê:** İşarekirina bibal 'xeybê ve
**Bedîhî:** Aşîkar
**Kînaye:** Ew peyve ku mewzûkî nîvvekirî îzah dike. Tirk jê re dibêjin dolayli anlatim Bela'xeta xarîqul'ade: Xweş îzaha ji 'adetê der
'**Hedîsa muteşabîh**: Ew 'hedîse ku me'na wê aşîkar nîne. Mumkune ku bi çend awayan bê şîrovekirin û pêdivî bi îzaha wê heye

# Hin XuriHişariv Bıra! HoToDımaMerg

✍ Nûreddîn KAWARÎ

Meşk şuya , darkuya
Gulpılısya, hor vejya
Felek gêrapayizdiya

Hin xurihişarıv bıra!
Hotodımamerg

Bar bıtê kot riyar
Dıdalpéhesr kot var
Çımondıbihuznuhewar

Hin xuri hişarıvbıra!
Hotodımamerg

Warırabarbı kum şiyara
Dınyabizerrıkserdbıra
Melabıhedrı kefen bıtera

Hin xuri hişarıvbıra!
Hotodımamerg

Hol bızonbıra! Inadınya
To yo kesir mal nêbiya
Gelzonmekvelêşondıma

Hin xurihişarıv bıra!
Hotodımamerg.



# HALÊ UMMETÊ

✍ Nûreddîn GEŞKÎN

1436 sal berê zaroyên Adem ('e.s), rêya xwe şaş kiribûn. Armanca ku jibo wê hatibûn afirandin, bi rêberxistin û telqînên şeytên jibîr kiribûn. Tarîtîyeke weke qîrê bi ser însana de digel temamê cîhanê girtibû. Lê belê roja ku Xweda xistibû xizmeta însên, li cîhê xwe bû û li gorî meqseda afirîna xwe ku ronîkirina cîhanê bû, digeriya. Lê belê ev reşayî ne reşayîya ji tunebûna rojê bû. Belkî ev reşayî û tarîtî ji nava însên û ji exlaqê însên bi xwe derdiket.

Însan, wek çêtirê mexlûqên Allah Te'ala hatiye afirandin. Lê belê wexta ku rê şaş dike, digel hebûna rojê, jîyanê li temamê xwedî ruha tarî dike. Bihêz bêhêzan dixe, xwedîmal bêmalan dike bende, mezin biçûkan didabeli'îne. Bi kurtayî xwedî hêz, bêhêzan ji te'amên jîyanê mehrûm dike. Bi vî awayî yê ku îro xwedî hêz e jî, sibê li hemberî yekî ji xwe bihêztir heqqê jîyanê wenda dike.

Wexta ku 'halê însên bibe ev 'hal, nîzam û întîzam jî di navbeyna civaka beşer de namîne. Lewra bêhêz jiber zaliman bi çiya dikevin û jîyana çetewarî, bêhiqûqî li çiya û rêyan jî dest pêdike. Rêwîtî û tîcaret dikevin bin xetereyê. Bi vî awayî di nava zaroyên Adem de bendetî çê dibe.

Cîhan wisa bûbû ku jiyan ji temamê xwedîrûhan re bûbû tarî, bûbû zehmet, nexweş bûbû. Di wê demê de xwediyê jiyanê û afirînerê cîhan û tiştên tê de, hat şefqet û merhemêtê jibona mexlûqên xwe yên ku li wan neheqî dibû.

Hebîbê xwe durra yetîm (s.'e.w) ku wê heta roja qiyamet û heşrê nîzam û şerîeta wî baqî û çareserî be jibo temamê însan û tiştên li cîhanê, şand ser rûyê erdê. Lewra Xweda hz. Adem û zaroyên wî li ser zemînê ji xwe re kirine xelîfe. (Beqere-30) Karê serrastkirina cîhan û însanan, deranîn û çêkirina sen'et û me'denan û me'mela di navbeyna xwedîrûhan de bi 'edalet dane ser milê vî xelîfeyê.

A vî Durra yetîm (Silavên Xweda lê bin) jibo însaniyetê, rêberiyeke bêmîsal pêk anî. Însan çiye, ji kû hatiye, wezîfa wî çiye û ewê dûre bi kû ve here, tev ji însanan re gotin û rê nîşanî wan da, bi gotin û 'emelê xwe ji însanan re bûbû xweşmîsal. Cîhan bi vê micadela pêxember rêya xwe ya rast a fitrî hîn bû, ev mînak jibo temamê ketî û birçî û pêxwasan bû hêvî. Her yek ji heval û dostên bi vî ezîz re mîna stêrka li asîmanan jî, di rêya rast a fitrî de ji jar û qels û însanan re bûn rêber û hêvî. Hedîsa pêxember dibêje: "Her eshabekî min, mîna stêrkekê ye. Hûn xwe bi kîjan bigrin, hûnê xelas bibin."

Piştî ku ev mesaja bi rûmet gihaşt gell û xelkan, van xelk û milletan jî yek bi yek zordest û zalim ji ser serê xwe qulibandin û xwe azad û rizgar kirin. Lewra fêm kiribûn ku li vê dinyê me'na jîyanê îman û berxwedane. Bi vî awayî qewm û cemîyetan bi şopa wehya Xweda û rêya pêxember Hz. Mûhemmed (s.'e.s) û eshabên hevalên Resûlê Xwedê, bi sedsalan jîyaneke bi şan û şeref li dinyê borandin. Lê belê nevîyên nevîyan (zaryê zaroyan) ên ku tarîtiya kufrê nedîtibûn û di nava xweşî û exlaq û îmanê de mezin bûbûn, qîmeta vê îman û Îslamê fêm nekiribûn, zêde qîmet nedanê. Zeîf bûn. Aha di vê yekê de koledar û û maldarê di kemînê de, hêdî hêdî xwe berdane holê û yek bi yek bi kemîn û alîkariya xennas, mislumanên exlaqzeîf ji rê deranîn. Gelek bi pûl û pere, bi şehvet û lîstikan û bi we'dên nerast xapandin. Digel ku azadî û rizgariya herî mezin ji însên re naskirin û girêdana bi Xwedê re jî, lê van kêmhişan bi telqînên şeytanên ins û cinnî wehm kirin ku şexis bi Allah re negirêdayî be, ewê bêtir azad be, lê nizanibûn ku kesê dev ji werîsê Xweda berde, ewê bibe bendeyê şeytan û koledaran.

Bi vî awayî new'ê beşer hêdî hêdî ji rêya xelasiya Îslamê bi dûr ket. Çiqas ji rêya Xweda bi dûr ket, ewqas nêzî kemîna koledar û şeytanan bûn. Van koledaran piştî ku ew halê ummetê dîtin, zêde bêhêvî bûn û xebata xwe ya îfsadê bi hîleya xennas zêde kirin, heta hatin halekî ku jehra dijmin û tîryaqa hekîman bi hev ve diguherîn. Lewra jehra dijmin di nava firax û embalajê neqişkirî de dihate pêşkêşkirin. Bi vî awayî hedîsa pêxember bi can dibû: "Cennet bi zehmetan dorpêç bûye, cehennem jî bi şehwet û rihetiyan dorpêç bûye."

Ev nexweşî roj bi roj  bi pêşve diçû, ji ğeyrî çend xêrxwazên neqane weke Îmamê Rabbanî, Cemaleddîn Efğanî, Şêx Xalid, Bedîuzzeman hwd, kes li ber nedisekinî. Bi sedem vê xefletê Xwedayê Teala, qîmeta nîmeta xwe ya mezin ku Îslame, di nav ummetê de her dem zêde kir daku bibe dînê cîhanê. Her wiha Xweda xwest ku însan fêm bike bê bi wendakirina vê nîmetê çi zerarê dikin û çi felaketê tînin serê xwe û li hukmê Xweda bi poşmanî vegerin. Erê me fêm kir em poşmanin, lê belê koledaran ji dîrokê pirs ders nestendin, tim kemîn û xerabî rêz kirin, gelek ğulamên xwe li ser serê milletan bi cî kirin, gava milletan yek ji ser serê xwe radikirin, yekî din dianîn wekî Misr û Yemen û Lîbyayê. Ji bo kemînên xwe leşker û saziyên xwe yên weke Nato û UN (Neteweyên Yekbûyî) ava kirin. Bi şehwet û lîstik û qûmarê, derbên dijwar ku her yek wekî narqozê civatan ji hiş dikin, li xelkan dan.

Digel van hîle û xerabiyên kafir û zaliman û palê şeytên, hêvî ji Xweda heye ku ummeta Hebîbê xwe bighîne silamet û serferazî û yekîtîyê li ser heqîqet û hîdayet û biratî û nûra Hêbîbê xwe, ehlê şeytan jî xusran û zelîl û meğlûb bike.

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Afirandin: Yaratmak | Bende: Abd, köle | Civak: Toplum | Aferîner: Yaratıcı | Nevî: Torun |
| Hêz: Kuvvet | Beli'andin: Yutmak | Xetere: Tehlike | Mînak: Örnek | Netewe: Ulus |

# DEMBİHÊRK / ‘HESBİHAL

Mûhemmed Şakir

Ger hûn dixwazin werin em bi hev re herin ba Cabîr. Cabîr kîye? Cabîr kurê Suleym e. Ji se‘habîyên Kîrame. Baş e. Lê ji bona çi em ê herine balê?

Bila ji me re qala xwe u rasthatina pêxember (s.x.l) bike. Tiştên dîtîye bûye şahid û şîretên ku ji wî girtîye bila ji me re bêje. Bila ji me re qala edeb û exlaqê wî yê bilind û mezin bike. Bila ji me re şîretên bêhemta û giranbiha ji zar û zimanê wî yê mubarek bibêje.

Cabîr dibêje; “Rojek ji roja ez rabûm çûm Medîna Munewer. Min li wê derê zilamek dît, zilamekî wisabû ku herkesî lê guhdarî dikir û tu kesî î’tîraza wî nedikir. Ev ‘halê han bala min kişand. Ez rabûm min ji kesên dora xwe pirs kir:”

-Gelo ma ev zilamê han kî ye? Bersiva min dan, gotin:

-Ew Resûlê Xweda ye. Li ser vê min berê xwe da wî û jê re got:

-Ey Resûlê Xweda! Silav du cara li ser te be... Ma berra tu Resûlê Xweda ye? Resûlê Xweda kerem kir wiha got:

-Ez Resûlê Xwedakî wisa me ku, tiştek bê serê te ez du’a dikim, Xweda wê pirsgirêkê ji ser te radike. Tu salekî di nav xelayê de be, ez du’a dikim, xweda erdê te bi bereket dike. Tu li çolekê bê dar û ber û av be, û deva te winda bibe, ez ji xweda re du’a dikim, deva te wê bi şûnda were. Cabîr (rxl) dibêje, min got:

-Ey resûlê Xweda! Şîretek li min bike.

Resûlê xweda wiha domand û got:

-Ji tu kesî re sixêfa neke. İdî piştî vê şîreta han min ji tu kesî û tu tıştî re sixêf nekir, çi azad, çi ‘ebd, çi mî çi deve, ji tu kesî û tu tiştî re...

Paşê Resûlê Xweda wiha got:

◆ Qenciya ku te kir zinhar wê biçûk nebîne.

◆ Dema tu bi birayê xwe re peyivî timî bi ken û rûken be. Ev jî me’rûfe, ango ji qencîyê ye.

◆ Kirasê xwe ‘heta nîvê çîpên xwe hilde bila bi erdê re nekşê. Eger ev li xweşa te neçû, qe nebe bila ‘heta gûzikê be. Kirasê xwe zinhar ‘heta erdê dirêj neke. Çimkî ew ji kîbrê ye. Xweda ji kîbrê ‘hez nake.

◆ Heke kesek kêmasîyeke te bizanbe ji bo vê ji te ra sixêfa bike an jî loma li te bike tu jî wisa neke. Tu kêmasîya di wî de zanibe jî lome lê neke, da ku webalê wî bimîne li ser wî.

...

Belê, peyvên Cabîr (rxl) xelas bûn. A rast di vê neqla Cabîr de gelek şîret û we’z û nesî’het hene. Aqilmend ew e ku para xwe jê hilde. Çend şîretên ku min jê hildane ev in:

**1-** Şîreta ewil perwerdehî û edeba ji bo bikaranîna ziman e. Cabîr (rxl) dibêje, piştî min li vê şîretê guhdarî kir êdî min ji tu kesî û ji tu tiştî re sixêf nekir. Pêwiste ku em daîra vê rêzikê berfireh bigrin û li ser bifikirin.

**2-** Şîreta duyem, qencîya ku tê kirin bila biçûk nêyê dîtin. Qencî qencî ye. Çi biçûk be çi mezin be. Di vê derê de ya mûhîm ew e ku meriv ji dil be, bi îxlas be.

**3-** Şîreta sêyem, bişirandin û rûkenî, nexasim ji bo me, ji bo dawetkerê İslamê...

**4-** Şîreta çarem, dûrketina herçî tiştê ku dibe sebebê kibr û quretîyê.

Bes dibêjim, Rabbê min! Tu min û hemû mu’mina ji vî exlaqê fîr’ewnî biparêze.

**5-** Şîreta dawîn lazime meriv kêmasîyên mirova nede ruyê wan û sixêf û loma li wan neke.

Netîce/Encam: Min bi xwe ji xwe re got: Ey nivîskar! Ka li xwe binêre bê ka di vê mijarêde tu li ku yî?

.................

*Hedîs ji Cem’ul Fewaid, kitêba adabê hatîye wergirtin. (Ebû Dawud- Tirmîzî)




# Ji Rîsala Uxuwetê-6

# GELÎ EHLÊ ÎSLAMÊ!

Gelî ehlê Îslamê!

Eger hûn naxwazin ku bikevin bin esaretê, hişê xwe bînin serê xwe. Li dij wan zalimên ku ji îxtilafa we îstifade dikin xwe bispêrin qel'a

إِنَّمَا الْمُؤْمِنُونَ إِخْوَةٌ

Û pê xwe biparêzin.. Naxwe hûn nikarin ne heyata xwe û ne jî hiqûqê xwe biparêzin. Me'lûme ku eger du qehreman bikevin pêsîra hev, zorokek dikare li herdûkanxe jî. Eger di mêzînekî de du çiya bikevin hemberî hev, mumkune ku kevirek biçuk muwazeneya wan serû bin bike û bi wan bilîze. Yekî bibe jor ê din bîne jêr.

Vêga gelî ehlê îmanê, ji ber îhtîras û mêlgirtina we ya bi neyartî hêza we dibe tune. Mumkune ku hûn ji teref hêzek biçûkve bên pelixandin. Eger 'eleqa we bi heyata îçtimaî re heye, dustûra'alî ku dustûra

اَلْمُؤْمِنُ لِلْمُؤْمِنِ كَالْبُنْيَانِ الْمَرْصُوصِ يَشُدُّ بَعْضُهُ بَعْضًا

e ji xwere bikin dustûra heyatê. Hem ji sefaleta dinyayê hem jî ji şeqaweta axretê xelas bibin.

WECHÊ ŞEŞEMÎN: Heyata m'enewî û siheta 'ebdîtîyê bi 'înad û 'edawetê dihejin. Lewra wasita xelasî û wesîla necatê (îxlas) zayi' dibe. Lewra mu'ennidekî terefgîr di 'emelê xwe yê xêrê de, ji xesmê xwe re serdestîyê dixwaze. Ji lew ji 'emelê lî wechîllah û xalis re muwafiq nabe. Di hukm û mu'amela xwe de mêla tarafgîrê xwe dike, 'edalet û dadmendîyê pêk nayne.

Aha îxlas û 'edalet ku esasê ef'al û 'emelên xêrê ne bi xisûmet û 'edawetê winda dibin. Ev behs gellekî dirêje, lê ji ber ku qabilê meqamê kurt e, em jî kurt dibirin.

---

Zayi': Zayi, kayıp   Mu'ennid: İnatçı   Terefgîr: Taraftar   Mêlgirtin: Meyletmek

*DEMBIHÊRKA MELÊ*

# HALÊ MU'MINA ĞERÎB E

✍ Mustafa TÛRAN



***"Wê zemanekî wiha bê ser insana, ku însanê li ser dîn sebir bike, ewê wek insanê ku pizotê agir di destê xwede digire." (Tirmizî, Fiten 73)***

Halê mu'mina bê çiqas ğerîb e? Lewra mu'min gelek dem û carî, di hâlê nexweşîyê de ne. Zulm û zordestîyê dibînin ji neyarên Xudayê Te'âlâ. Hetta gelek carî îmana wan, bi her new'ê musîbetê giran, tê te ceribandin. Mu'min digel ku dostê Xuda'ne jî, dîsa jî gelek carî bindest û ze'îf in. Xizanî û feqîrî, barê sitûyê wane tu di bê qey.

Mu'min, di her dewrê dîrokêde bi jimarî ji neyaran kêmtirin. Bi hêz u quwweta xwe jî, tu demî ji neyâra ne li pêşin. Zalim u zordaran her û daim li mu'mina te'de û ezyet kirine. Ew xistine heps û zindana, xwîyna wan rijandine, ew şehîd kirine.

Gelek carî mu'min bi tenê mane bi sere xwe. Hetta malbata wan jî ew bi tene hiştine. Gelek mu'min heta ji dê û bavan, xwuşk û biran û malîyên xwe hatine terikandin. Mu'minê maldar û dewlemend,


www.bangaheq.com

û mulkê xwe, ji ber ku mu'minin, wunda kirine. Wekî Hz. Mus'ebê kurê 'Umeyr (R.X.L.), berî îmanê bîne, di halekî gelekî xweş bu. Ji malek gelekî dewlemend bu. Cilê rojekî li xwe bikira, roja dî ew cil li xwe ne dikir. Belê ku îman anî u kete nav sefê mu'mina, malbata wî, lê b û neyar; ew bi tenê hişt. Heta bi diya wî jî, ew ji ewladî û mîrasa xwe mehrûm kir. Wihareng mînakê wekî Hz. Mus'ebê kurê 'Umeyr (R.X.L.), di dîroka Îslamê de pirin.

Wekî dîrokê kevin, di vê sedsala em têde dijîn, mu'minê li de'w û doza îlahî bûne xwedî, dîsa mustez'efin. Yekî bi xwaze, jîn û jîyana xwe, li gorî dînê Xuda bi domîne, em dinêrin dinya lê di be neyâr. Wekî ku ronîya çe'va Hz. Muhemmed (S.'E.V.) di hedîsa xweyî mubarek xeber daye:

*"Wê zemanekî wiha bê ser insana, ku însanê li ser dîn sebir bike, ewê wek insanê ku pizotê agir di destê xwede digire."(Tirmizî, Fiten 73)*

Îro jîn û jîyana islamî, digel ku hewqas zor û zehmet bûye, ku wekî pizotê agir meriv dişewitîne, lê dîsa jî mu'minê vê dewrê, xwe ji de'w û doza Xuda ne dane alî. Nexwasim ev serê 30 salîye, di vî 'erdê ku em têde dîjîn, mu'minê muwehhîd têkoşînek gelek giran didin. Li ber hêzê batilî bi mal û can, berxwedanek 'ezîz didin. Ji boy reng u şî'ârê Îslamî her û daîm, li ser welatê me bijîn her tiştê xwe kirin feda.

Di ber doza pîroz de, gelek 'ezîzan, ji teref neyarên Xuda, hatin şehîd kirin. Gelek 'ezîzan, hatin hepiskirin, ku nêzî çarêka sedsalekî di zîndana de ne. Lê belê wan 'ezîzan, ji Xuda xwe qet dûr nekirin; bêtir nêzîkî Xuda bûn. Heps û zîndan, wekî Hz. Yûsuf Pêxember ('E.S.) wergerandin medreseyan. Gelek 'ezîzan, muhacir bûn; terk-î welat bûn. Lê dîsa jî, ciyê ku çûnê, ew der ji xwer kirin ciyê jîn û jîyana Îslamî.

Însanê îro, wek ku ji agir direvin, wiha ji dînê Xuda direvin. Lê ew mu'min, ticarî jê narevin. Bil'ekis wan xwe ji dîne Xuda're kirin sîper. Di nav însanê ji Xuda ğafil dijîn, mu'minê muwehhîd, tu dema Xuda jibîr nekirin. Her û daîm ew bîr anîn, hetta ev 'eşqa xwe li meydanê gund u bajaran jî qîr kirin. Bi zimanê Melayê Cezerî wiha dibêjin:

*Tu dizanî bi Xudê min tu xeyalî şeb u roz*
*Bi xeyala xwe mudam min tu li balî şeb u roz*

Belê, ev halê mu'mina, em karin çawa bînin ziman? Ev çiye, ku mu'mina di her şert û imkânê zor û teng de, li ser piya dihêle? Ev cesaret û mêranî, ji ku tê mu'mina, ku serî li ber her dijminê Xudê radikin? Vê hêz uquwwetê, ji ku distînin, ku qîma xwe bi her new'ê îmtîhanê giran tînin. Çawa çê dibe ev tenêtî, ev bêkesî û ev bê îmkânî mu'mina nikâre têxe bêhêvî û buhranê?

Belê, emê kurt bêjin, bê ev çiye. Ev hêz û quwweta di dilê mu'minade "'eşqa îlahî" ye bê şek. Mu'minê muwehhîd, bi her zerrêyê xwe 'aşiqê Xudane, evîndarê Resulê wîne. Lewra ew tiştekî nabînin ji ğeyrî Xuda û Hebîbê wî. Ev 'eşqa Xudayî hiş û 'eqlê wan sitendîye bê şek. Hew 'eşq kâre însana wihareng li pey xwe bi meşîne. Hosteyê şî'r û nezmê Mela Ehmedê Cezerî, ev heqîqet, bê çıqas xweş anîye ziman:

*Zerreyek 'işqê giha kî û ji 'eqlê xwe nebir ?*
*Kullû men sadefehû dahîyetu'l-'işqî helek*

*Weh çi 'işq û çi selamet herdû dûrin ji yekê*
*Kullû men yeslukû hubben subule'n-nârî selek*

*Ahê bêgavî ji dil tên me ji pêta di ceger*
*Bes tu bê feyde nesîhet ke me dil bûye pelek*

Melâ, rast gotîye; xweş gotîye bê şek. Kê ku nesîbê xwe ji 'eşqê girti be, ew di 'eşqê de ğerq bûye û nema jê vegerîyaye. Lewra 'eşq û selamet ji hev gelekî dûrin. Kê ku rêya 'eşqê ji xwe re hilbijartiye, ew ketîye rêyek ji agir. Ewê zor û zehmetê têde mutleq bibîne. Ew dilê wayî ji 'eşqê di şewite, nesîheta qet qebûl nake. Kî ji ware çi bibêje jî, ew ji rêya xwe na vegerin. Wan mal û canê xwe firotine Xuda, li pêş berî Cennetê. Xwezîya me bi wan mu'mina ye.

# Ey Milletêmin

قُلْ اَعُوذُ بِرَبِّ الْفَلَقِ ﴿١﴾ مِنْ شَرِّ مَا خَلَقَ ﴿٢﴾ وَمِنْ شَرِّ غَاسِقٍ اِذَا وَقَبَ
﴿٣﴾ وَمِنْ شَرِّ النَّفَّاثَاتِ فِي الْعُقَدِ ﴿٤﴾ وَمِنْ شَرِّ حَاسِدٍ اِذَا حَسَدَ



✍ Mela Mîzgîn

'Hemdê bê 'hed her bo Allah Te'ala be.
Salat û Selam li mezinê me Muhemmed û alû es'hab û etba'ê wî be.
Ey Milletê min!
Ger te divê tu ji şerr û xerabiyê hemî mexluqa bê parastin,
Ger te divê tu şerr û bobelatên şevên tarî yên tarî pak bi mînî,
Ger te divê tu ji şerr û 'hîleyên sêrbaz û pufkiryên girêka bêyî hîmayekirin u ji tesîra wan bêyî azadkirin,
Ger te divê tu ji şerr û 'hesudîya 'hesûd û çawnebara dema çavnebarîyê dikin bêyî muhafezekirin,
Xwe bavêje dergahê İlahî, dergahê Xwedîyê sibehê.
Daxwaza 'hîfz û hîmayê jê bike...
Bi hêstirên çava daxwaza azadîya xwe ji wî bike her ji wî bi xwaze.
Zarzara serketinê ji Wî bike gilî û gazincê xwe bi bal Wî ve bişîne .
Lewra Xwedîyê rehm û keremê her ew e,
Lewra Xwedîyê gerdûn û 'alemê her ew e
Lewra Xwedîyê mazlumên her demê her ew e
Lewra şafîyê êş û elema her ew e
Lewra Xaliqê  mexluqa her ew e
Lewra Destegîrê  ketîya her ew e
Lewra piştevanê  bindesta her ew e
Lewra alîkarê  mazluma her ew e
Lewra Kesê bê kesa her ew e
Lewra Xwedîyê hêza ji her hezî mezintir her  ew e
Lewra Xwedîyê leşkerê bêjimar her ew e
Lewra Xwedîyê dinya û û axretê her ew e
Lewra ê kû tarîtîya dike ronî her ew e
Lewra ê kû zivistana dike bihar her ewe
Lewra ê kû textê zalim û zordesta werdigerîne her ew e
Lewra ê kû dengê jar û bindesta  dibihîze her ew e
Lewra ê kû qesr û koşkên koledara ji kola re dihêle her ew e
Lewra ê kû dergahê wî herdem vekirîye her ew e
Lewra ê kû dibêje bi xwazin da ez bidime we her ew e
Lewra ê kû bi şefeq û sibeha dawî li şeva tîne her ew e
Lewra ê kû dipey her tengasîyê de firehîyê tîne her ew e
Ey Milletêmin!
Umîda xwe her bide xaliqê mexluqa
Ji zalima netirse ji Rebbê mezluma bitirse
Xwe nede rex zordesta
Xwe bide aliyê Xwedîyê bindesta.
Di her tengasîyê de
Li hember her dijmina
Alîkarîyê hîfz û hîmayê, azadî û rizgariyê
Her û her ji wî bixwaze
Û xwe bavêje dergahê wî.
Binêre Rebbê te di vî sûretê Qur'ana Pîroz de li hember her
dujmin û bobelata te dawetî îltîca a dergahê xwe dike:

Bi navê Xweda yê Rehman û Rehîm
"Bêje ji şerrê tevê mezluqa, ji şerrê şeva tarîya tarî, ji şerrê pîrekên sihirmend pifdikine girêkan û ji şerrê çev nebaran dema çevnebarîyê dikin. Ez îltîcayî Xwedan sibehê dikim ez divêm min ji wan biparêze" (Felaq)

Ey Milletêmin! Dermanê her derdî eve. Çara pak û paraztinê eve, rêya serkeftin û azadîya birastî eve.


www.bangaheq.com

# ÎSLAM

M. Mustafayê Mela 'Eliyê Êzdarî

Îslam, ku tu çûy, li me bû êvâr    Tu çûyî ji lew, nema li me xew
Me'na heyatê, nema bi yek câr    Hebîba bedew, em hiştin bîzâr


Bi sal û meha, ez çûm di reha    Bê te nabe jîn, mi ev kir yeqîn
Lê dil ne giha, armanca xwe yâr!    Ji nêv dil axîn, kêm nabe ticâr

Mi l'ku nezer kir, bû çîya û gir    Ma ne bese qey, ev dağîn û key
Pelê xwe j'xwe kir, çûm bin kîjan dar    Di nalin wek ney, di leyl û nehâr

Dema j'te bûm dûr, ez mabûm bê nûr    Ey can û canan, li me bik îhsan
Ketim çalê kûr, li çolê beyâr    Vî mulkê wêrân, dîsa bik dîyâr

J'lewm û sîtema, halê me nema    Bes ku tu werê, roja te derê
Em mam di ğema, di nêv âh u zâr    Ber em esîrê te bin ey dîldâr!

Ku tu ğeyyîdî, xweşî me nedî    Em zanibin ger li me vekî der
Poşmanin îdî, poşmanin hezâr    Bi gorî bin her em bindest û jâr



# اَسْپَارُو مِیرِکُو مَارْ

عَبْدُاللّٰهْ جَوْهَرْ ✍

مَرْدِمِکَه عَاقِلّيِ نِشَنُو اَسْتُورِخُو شِنُو.کِشْتَه رَیِیرِدَزِی مَرْدِمِکَه هَوْندَبِیُو.مآرِکَه تَایْ مَنْدُو فَکِی اِیرَا شِیرُو زَرَه.اَسْپَارْ سَمَدُوکَه مَارِی بِتَرْسْنُو, آی مَرْدِمِی بِخَلَصْنُو اَسْتُورِی خُو دَانُوقَازْدْنَایِشِی.لَاکِنْ نِیرِسَنُو.

پِی قَامْچِی دَانُو آیْ مَرْدِمِرُو.بِدَرْبَانِیقَامْچِی مِیرِكْ رَمَنُو شِنُوبِنِی دَارَه صَایَانْ. بِنِی دَارَدَه اَیِیْ صَایْ بِیِی.اَسْپَارْقَانُو:»جَادَه اَنِی صَایَانِی خَرَپْنَایَانْ بُورَه.»

آوْ مَرْدِمْ تَرْسَانِ اَسْپَارِرَا هَمْ وَنُو هَمْزِی آنَا قَانُو:»اَفَنْدِی مِنْ سَه کَرْدُو بِتُو, تِی آنَا دَانِی مِرُو؟تِی مِرَا قَانِی اَنِی صَایَان بُورَه.اَگَرْ قُسْتِی تُو بِمِنْ اَسْتُو, مِنْ بِشِمْشِیرِ خُو بِکِشَه. تِی مِرَا چِی وَازَنِی؟ اِنسَانُ گَاوُرْزِی زَیْ تُو نِیکَنُو.»

زَوْتَانْ دَانُو اَسْپَارِرُو, لَعْنَتْ اِیرِی آنُو.قَانُو:»یَارَبِّی تِی جَزَایْ اِی بِدِی.»

اَسْپَارْزِی دَانُو اِیرُو قَانُو: «مَفِنْدَه,قَازْدَه.» اَسْپَارْ آیْ مَرْدِمِی اَپِیْ دَانُو قَازْدْنَایِشِی.بِاَنِی حَالَتِی زَرَیْ مِیرِکِی قَلَبِینُو, ش یرِیجَنُو اُو مآرْ اَرْزَنُو تَبرْ.وَخْتَا مِیرِكْ مَارِی ش یِنَنُو, خُو اَرْزُنُو نِنْکَانِ اَسْپَارِی, تَرَا قَانُو:»تِی مِرِی زَيْ مَلَکِی رَحْمَتِی. تِی چِی اِنْسَانِکَه مُبَارَکِی؟ مِنْ بِزَانَیْنَه تِی آنَا اِنْسَانِکَه بَاشِی, آيْ قَاتِشِی خِرَابَانْ تُورَا قَه قَاتِینَه؟ تِی مِنْ عَفُو بِکَه.»

اَسْپَارْ قَانُو: «اَگَرْ مِنْ تُورَا بَحْثِی مَارِی پِیزَيْ تُو بِکَرْدِینَه,آگَافِی تَرْسَانْرَا زَافْرَه تُو ش سْیَایْنَه, بَلْکِی تُو جَانْ بِدَایْنَه. وَخْتَا تُو زَوْتَانْ دَایْنَه مِرُو, مِنْ زَرَيْ خُودَه قَاتِنَه: «یَارَبِّی کَارِی مِنْ رَحَتْکَه, صَبِرْ بِدَه مِنْ.»



# ŞÊX ‘ELÎYÊ HERÎRÎ -1

Ehmed Zeytûnî

Baba Tahirê Hemedanî helbestên xwe bi Kurdiya Lorî ango bi zaravaya Lorî nivîsandine. Em karin bêjin ku li ser Baba Tahirê Hemedanî gengeşiyek heye ku kurd û faris her du alî Baba Tahirê Hemedanî ‘aîdî xwe dibînin. Lê belê dema em li berhemên dema Baba Tahirê Hemedanî dinihêrin, em dibînin ku zimanê wan ne yek in. Bi taybet “Şahnema”ya Firdews û berhemên Baba Tahirê Hemedanî di heman serdemê de ne, lê belê zimanê berhemên wan ne yek in û ji hev cûda ne. Ji ber vê yekê rojhilatnas û Kurdolog, Baba Tahirê Hemedanî wek helbestvanekî kurd dipejirînin. Di vê nerîna xwe de mafdar in. Ji ber vê yekê em dikarin bêjin ku piştî pejirandina ola Îslamê, di nav kurdan de cara pêşîn helbestvanê bi Kurdiya Lorî helbest daye Baba Tahirê Hemedanî ye. Lê belê cara pêşîn yê bi Kurdiya Kurmancî helbest daye jî Şêx ‘Elîyê Herîrî ye.

Ev nayê wê wateyê ku berî wan tu helbest û helbestvan tuneye. Em dizanin ku berî Şêx Elîyê Herîrî hinek helbestvanên kurd hatine. Lê belê tu berhemê wan negihîştiye ber destê me. Em mînak bidin di serdema hikumetên kurdan de: 1-Hesenê Peşnewî 2-‘Ebdussamedê Babek… Ne bi zimanê kurdi bi zimanê ‘Erebî nivîsandine. Ji ber zimanê ‘Erebî serdest bû, zimanê dînê Îslamê bû, ‘alimên kurdan li ser dîn pispor bûn, berhemên xwe bi zimanê ‘Erebî didan. Lê belê berhemên wan negihaştine roja me. Bi heman awayî di serdema mîrektiyan de: 1-Şikrîyê Bedlîsî 2-Mîr Ye’qûbê Zirkî jî bi Kurdiya Kurmancî nivîsandiye, lê belê berhemên wan jî negihaştine roja me. Piştî van zanyariyan pênasiyeke rast bê kirin, em karin bêjin ku Şêx Elîyê Herîrî di edebiyata kurdî ya klasîk de yekem helbestvan e ku berhemên wî bi zaravayê Kurmanci hatine nivîsandin û berhemên wî gihaştine roja me. Ji ber vê yekê di dîroka edebiyata kurdî de Şêx



Elîyê Herîrî cihekî girîng digre.

**SERDEMA WÎ:** Şêx Eliyê Herîrî di sedsala 16. de jiyaye. Ev serdem, serdema mîrektîyan e û di navbera sedsala 13 û 19. de ye. Têkiliyên kurdan berî ‘Usmaniyan bi Safewîyan re hebû. Lê belê dema Safewiyan dewleta xwe ava kir, Şah Îsmaîl cara pêşîn berê xwe da herêm û mîrektîyên kurdan û welatê kurdan dagirkir. Ji ber vê yekê mîrên kurdan bi taybetî jî Îdrîsê Bedlîsî di encama dîplomasiyê de bi ‘Usmanîyan re têkili danî û bi vî awayî li hember Safewiyan îtifaqa Kurd û ‘Usmaniyan pek hat. Lê belê di dîroka edebiyata kurdî de serdema mîrektiyan ji ber girîngiya vê bûyerê dibe du binbeş. Serdema ewil ji destpêka mîrektîyên Kurdan heta tifaqa Kurd û ‘Usmaniyan didome. Binbeşa duyem jî ji tifaqa Kurd û ‘Usmaniyan heta dawiya mîrektiyên Kurdan e. Xulase Şêx Eliyê Herîrî di serdema mîrektiyan de û bi taybetî jî di serdema tifaqa Kurd û ‘Usmaniyan heta dawiya mîrektiyên kurdan de tê senifandin.

Piştî vê tifaqa di navbera Kurd û ‘Usmaniyan de mîrektiyên kurdan heta astekê gihaştine îstiqrareke baş. Di serdema mîrektiyan de gelek nûnerên edebiyata Kurdiya Kurmancî derketine. Di vê serdemê de hejmareke gelekî zêde helbestvanên kurd xuya dibin. Ev serdem di qonaxeke pêşveçûnê de ye. Serdemeke zêrîn e. Em karin bêjin ku edebi-

yata kurmancî ya klasîk di vê serdemê de derketiye û aîdî vê serdemê ye. Di vê serdemê de ji bo geşbûna edebiyata kurdî, hêmana herî girîng hebûna medreseyan bû. Li kur mîrekî kurdan heba, teqez li wir medreseyek jî hebû. Di van medreseyan de zimanê perwerdehiyê kurdî bû. Gelek helbestvanên navdar di van medreseyan de gihîştine. Ango di vê serdemê de gava em têkilîya medereseyan ji edebiyata kurdî qut bikin, mixabin li ser navê edebiyata klasîk tu bingeh namîne. Medreseyên Kurdistanê di warê edebiyatê de armanceke mezin bi cih aniye. Mixabin piştî damezrandina Komara Tirkîyê, ev medreseyên ku ji bo edebiyata kurdan zêrîn bûn, hatin qedexekirin û berê edebiyata kurdî da ber bingeheke li dijî rehê xwe. Li ser vî rehî nivîskar û edebiyatvanên sosyalîst û kominîst derketin holê. Çawa ku li rojavayê Tirkîyê edebiyateke laik, kemalîst û nijadperest hat çêkirin, bi heman awayi jî li rojhilatê Tirkîyeyê ango li herêma me Kurdistanê jî edebiyateke beramberî wê ya sosyalîst û nîjadperest hat çêkrin. Heta roja îro gelê me yê misilman çi yên rojava û çi yên rojhilat ji ber van bîrdoziyên çewt, pûç, beradayî û li dijî Îslamê dinalin. Em karin bêjin ku sedema vê yekê ya herî bibandor qedexebûn û girtina medreseyan bû. Mîna ew rûh ji cesed hat veqetandin û civak tenê bi laşê xwe yê bêkêr ma.

**JI DAYIKBÛNA WÎ:** Şêx Eliyê Herîrî jî yek ji wan helbestvanên kevin ên serdema mîrektîyane. Di vê serdemê de yên wekî Şêx 'Eliyê Herîrî, Melayê Cizîrî û Feqîyê Teyran gihîştine. Li ser jidayikbûna wî henek nîqaş hene. Her çi qas li ser jiyana Şêx Eliyê Herîrî nîqaş hebe û ne diyar be jî li gorî lêkolîner û nîvîskaran bi giranî di navbera 1530 û 1600î de jiyaye. Nîqaş li ser cihê jidayikbûna wî jî he ye. Sedema van nîqaşan ev e ku li ser erdnigariya Kurdistanê bi navê Herîr du gund hene. Ji van gundan yek li bakure Kurdistanê li navçeya Şemzînana Colemêrgê ye. Gundi din jî li başûrê Kurdistanê nêzîkî bajarê Selehaddînê ye. Ev gund wek gundê Şêx Eliyê Herîrî tê pejirandin. Li ser navê wî pirtûkxaneyek jî hatiye sazkirin. Di destpêka gund de peykerekî Şêx Eliyê Herîrî jî hatiye çikandin. (Li gorî baweriya Şêx Eliyê Herîrî ku em dizanin baweriya wî Îslam bû, ev helwesta senemçikandin heram e û bêhurmetî ye.) Bi temenekî bibereket nêzî 70 salî jiyaye û piştre çûye ser rehme Xwedayê Teala. Agahiyen der heqê Şêx Eliyê Herîrî de, ji xeynî konsolosê Erzûrûmê yê Rûs A. Jaba, tevayî devkî ne û ne nivîskî ne. Li gorî konsolosê Rûs yê Erzûrûmê A. Jaba Şêx Eliyê Herîrî li navçeya Şemzînana Colemêrgê hatiye dinyayê.

**KONSOLOSÊN KURDISTANÊ Û ARMANCÊN WAN**

Li ser Şêx Eliyê Herîrî xebatên herî berfireh û nivîskî ji aliyê konsolosê Erzûrûmê yê rûs A.Jaba ve hatiye tomarkirin. Em karin bêjin ku ev xebatên xwe ne tenê li ser Şêx 'Elîyê Herîrî, bi heman awayî seranser li ser xaka Kurdistanê meşandine. Ev xebatên wî ji bona ku ji aliye dewletên mêtingeh ve civaka kurdan hîn nêztir bê naskirin û li gorî vê nasînê politîkayên xwe yên gemar li herêma Kurdistanê bigihînin armancê hatine kirin. Di vê serdemê de em dîbinin ku yên mîna A.Jaba hîn li ser xaka Kurdistanê bi armancên xerab tevdigerin. Ez bawerim ku armanca A.Jaba ne edebiyata kurdan bû. Tenê ji bo di pêşerojê de bikaranîna kurdan û durxistina ji Îslamê bû. Îro gava em lê dinihêrin, em dibînin ku bi rastî rêxistin û tevgerên Kurdistanê yên dijberî Îslamê, fêkîyên xebata wê demê ne.

Çawa ku bijîjkek dema dike merivekî nexweş baş bike, hewceye pêşîn teşxîs bike û piştre dest bi tedawiyê bike, bi heman awayî yên mîna A.jaba û îro jî Espînoza dixwaze ku berî her tiştî civakê nasbike û piştre bi yên nêzîkî xwe re hevkariyê bikin. Mixabin ev teşxis ne ji bo tedawiyeke ber bi çêbûnê ve ye. Berevajî ber bi xerakirinê ve ye.

Gelo nayê pirsîn bê ev kesên hanê çi karên wan li ser axa Kurdistanê di nava civaka kurdan de bi rêxistin û saziyên malûm re hene? Gelê me pêwîst e van rastiyan baş bibîne û li gorî van rastiyan tevbigere. Tu carî ne tu xêr ji wan hatiye û ne jî tê. Gelê kurd vê rêgezê hewce ye baş bizanibe û jibîr neke.

# Ji Begê Kurdan Begê Dimilî (Zaza) û 'Herba Çaldêranê



✍ Yasîn Demîr

Di dîroka Asya de du qewmê mezin hene:
Qewmê TURANİ (Tirk, Moğol, Tatar, Kırgız û… ê.d.)
Qewmê ÎRANÎ (Faris, Kurd, Belucî û… ê.d.)
Qewmê Îranî di dîrokê de bi navê Qewmê IRR têne zanîn. Di Kurdî û Farisî de daça zêdebûnê "an=AN" tê dawiya "IR" dibe ÎRAN. Îja Farsa (Persa) ev navê qewmên ÎRAN îro li dewleta xwe kirine. (Ev nav wek navên "Aranî", "Arî" û "Aryenî" jî derbasdibin)
Qewmê ÎR' li gori dîroka serdestîya Xanedanê xwe ji van mila (mileta) çêdibe: Elam, Med, Pers, Pait, Sasanî, Ermen û…ê.d. Evana jî 'xencî Ermena li gorî vê rêzê İmparatorî kirine:

1. İmparatorîya Elam (B.M. 2550-640):
Piştî Hîthîta, di dewra xwe de İmparatora dinyayê ya herî mezin e. Vê împeretorê 1910 sal 'emir kiriye. B.M. di salên 1300î de bi navê Babîl jî hatiye zanîn. B.M. di salên 640î de tevlî Asûrîyan bûye. Dûv re jî ketîye destê Med û Farsa.
2. İmparatorîya Meda (B.M. 708-B.M. 550):
Kurd ji nesla Meda tên. 'Emrê vê İmparatorê kurt e. Lewra İmparatorê Med yê çaremîn İştumegon (Yûnan û Latîn jê re Astyagês jî dibêjin) lawekî wi tenê hebû. Ew jî di 28 salîya xwe de wefat dike. Ji ber ku kurrê wî namînin Xanedanîya Meda li ser qîza İştumegon dom dike. Qîza wî jî pîreka (jina) Şahê Persa yê bi navê Kambiz e. Kambiz, bavê Xusrevê Şahê Persa yê girîngê duyemîn e. Şah Xusrev ('Ereb Kîsra dibejin) neviyê İştumegon e. Jiber ku lawê İştumegon dimre, kurê wîyê din jî tunene, Şah Xusrew de'wa xanedanîya Meda dike. Ji lew bi bêbextî İmparator İştumegon bi qasî salekî dîl digre. Piştî miri-

na kurê xwe, salek şûn de İştumegon jî dimre. (Dibe ku hatibe kuştin jî.) Şah Xusrewê (Xosrof) duyêmîn bi sedema dîya xwe (ku qîza İştumegone) de'wa Xanedanîya Meda dike, Meda jî bandeyî Persa dike u İmparatora Pers a mezin avadike.

Payîtextê Medan bajarê Hagmatana bû. Ev der Hemedana îroyîn e. Loma çevkaniya koka Kurdan ya herî kevnar erdnigariya Îranê ye. Kurd ji vir li heremê din belav bune. İmiparatorîya Meda 180 sal didome. Dûv re daxilî İmparatorîyta Persa dibe.

3. Împaratorîya Pers'a (B.M. 555- B.M. 330)
4. Împaratorîya Paît'a (B.M. 249- P.M. 228)
5. Împaratorîya Sasanîya (P.M. 226-P.M. 642)

Pişti miladê di sala 640an de di dewra Xelîfê İslamê Hz. 'Umer de (x.j.r) ji hole radibe u daxilî bin baskê dewlata Xelifeta İslamê dibe.

Kurd jî, di dîroka xwe de li erdnîgarîya Îran, 'Iraq û Mezopotamya belav bûne. Di dîroka Kurda de wek Med û Eyyûbîyan hem împaratorî heye hem jî wek Merwanî, Şeddadî û Hesnwînyan dewletên li gorî wê dewrê hene. Lê bi pirranî Xususen jî piştî qebulkirina Îslamê Mîranîyên (Begli'xên) xweser zêde ne. Begê Kurdan di 'halê daxil de îdara herêmên xwe dikin. Lê di 'halê xaricî de xelîfeta İslamê û dewleta navendî ya mezintir kîjan be bi wê ve girêdayî mane. Weki Safewî, Qereqoyunî, Selçukî û 'Usmanîyan. Wel'hasil di dîroka Kurda de 28 Begtîyên Kurdan ê xweser hene. Wek Şeref Xanan, Swêdiyan, Biradostîyan, Babanan, Begê Sasonê, Begê Cizîrê, Begê Hekkarî, Begê 'İmadîyê, Begê Zaxo, Begê Erdêlan, Begê Dimilî û...hwd. Dimilî îro bi navê "ZAZA" jî tên binavkirin û naskirin.

Beg û Begtîyên Dimilî û 'Herba Çaldêran'ê

Erdnîgarî û herêma Dimilîyan a navendî û dîrokî Sokmenabad bû. Sokmenabad li dorhêla bajarê Xoya Îranê ye. Navenda Begîtîya Dimilî jî Sokmenabad bû. Sokmenabad, Çaldêran (ev Çaldêran Ew Çaldêran e ku îro di nav sînorê Îranê da maye. 'Herba navbera çaldêran'a Tirkîyayê jî bi vê nîsbetê hatîye binavkirin. Lê Çaldêran a Tirkiyê û ev Çaldêran du bajarên ji hev cûda ne.) Bajarê Ebka (Ebe'xê) u Sulêymansaray bajarên herêma Dimilîya bûn. Dimilî jî wek Kurdên din ê berya qebûlkirina İslamê Êzîdî bun. Piştî qebûlkirina İslamê bûn sunnî û Şafi'î. Lê belê ev mijara mezhebî wek Kurdên din, di navbera wan û Safewîyên Şî'î da her dem bû pirsgrêk.

Begên Dimilîyan:

1. ÎSA BEG: Begê Dimilîyan (Dumilî jî tê gotin) ê ku herî zêde tê naskirin Îsa Beg ê Muhtemelen Dimilîyên berya wî Êzîdî ne.
2. Şêx E'hmed: Lawê Îsa Beg e. Şex E'hmed di dewra Aqqoyunîya de jiyaye. Mîrê Aggoyunîyan ê wê heremê ye.
3. Şêx Îbrahîm u Şêx Behlûl: Ev herdû kes lawê Şêx E'hmed in. Ev herdû jî mîrê dewra Sefewîya ne û bi wan ve girêdayî ne.
4. Cimşîd, Mihemed û 'Heqvêrdî Beg: Ev hersê beg jî lawên Şêx Behlûl in. Di Dewra Safewîyan de jiyane.
5. Hacî: Sancaq Begî ye. Di dewra wî de jî mezinên Dimilîyan Cafer Beg, İsma'îl Beg û Ehmed Beg têne kuştin.
6. 'Hecîyê Lawê 'Hecî: Begê Sancaqa Sokmenabadê ye. Navê bavê wî jî Hacî ye. Navê lawê wî jî 'Hecî ye. Çaldêran jî giradayî sokmenabadê ye. Hacîyê Posthume jî jê re tê gotin. Herba Çaldêranê ya di navbera Yawiz Sultan Selîm û Şah İsma'îl de di herêma vî 'Hecîyî de pêk tê. 'Hecî di vê demê de begê Sancaqa Safewîya ye. Ev 'Hecî di 'Herba Çaldêranê de jî teref 'Usmanîyan ve tê kuştin. Sancaqa Dimilîyan jî belav dibe. Sokmenabad dikeve bin destê 'Usmanîyan. 'Usmanî 'Hecîyê lawê wî 'Hecî ('Hecîyê Sêyemîn) dikin Begê Sancaqa Sokmenabad u Çaldêranê.
7. Mensûr Beg: Mensûr lawê Mihemedê Şêx Behlûl e. Derbasî alî 'Usmanîyan dibe.

'Usman Begê lawê Mensûr Beg, dibe Begê Sancaqa 'Usmanîyan ê Bargirîyê.

Welî Begê lawe Mensûr Begê jî dibe Begê Sancaqa 'Usmanîyan a Uçog'ê (Uçog lı Nexşîwanê ye. Mirina Welî Beg piştî sala 1579a ye)

8. Silêman Beg: Ev jî lawê 'Elîyê lawê Cimşîdê lawê Şêx Behlûl'e. Silêman derbasî alî Safevîyan dibe.
9. Qilîç Beg: Begê Sancaqa 'Usmanîyan ê Çaldêranê ye Birayê wî Hesen Beg tê kuştin.

Piştî Herba Çaldêranê Tirkmenên 'Elewî yên rojhilata Anatolê derbasi nav Safevîyan (Îran'ê) dibin. Nî-


www.bangaheq.com

vek Kurdên Îranê ê Sunnî/Şafi'î jî derbasî vî alî dibin. Li vî alî jî jixwe Kurd hene û ev der herêma wana ye. Lê ji bil Kurda wek Suryan û Ermenan hinek qewmê din jî hene. Dîsa di dema Emewî û 'Ebbasiya de malbatê Seyyîda hatine nav Kurda. Hem zimanê Kurdan hem jî zimanê van qewma bandor lihevkirine. Lê zaravên Kurdî herî zêde di bin bandora Farisî da mane. Lewra jiber ku koka ('eslê) Kurdî u Farisî yek e bandordarîya wan a li ser hev jî tiştek normal e.

Hinek kes Zazayan bi bermekîyan ve girêdidin. Mimkune ku hinek malbatê Bermekî di nav Kurd û zaza de bûbin 'Eşîr. Lê Bermek û Zaza ji hev cudatir in. Bi kurtasî dîroka Bermekîyan wihareng e:

Bermekî navê xwe ji Bermek hildidin. Bermek li Belxê (Efğanîstan) rahibê me'bûdeke Budîsta bû. Wexta ku 'Ebbasî xelîfetîyê ji Emewîya distînin, Bermek dikeve xizmeta 'Ebbasîyan. Dîroknas dibêjin ku Bermek di sala 725a de bûye Musluman. Xalidê lawê Bermek, qîza xwe dide Xelîfê 'Ebbasî ê yekemînê bi navê Seffah. Xalid, di dewra Xelîfe Mensûr de di karên dewletê yên muhim de cîh digre. Xelîfe Hadi (Mehdî) di dewra xwe de Xalid dike 'hepsê. Lê di dewra Xelîfe Harûn Reşîd de Xalîdê Bermek pir qîmet dibîne. Lewra Xalid, di piçûktîya Harûn Reşîd de hem mamostetîya wî kirîye hem jî pîreka Xalid şîr daye Harûn Reşîd. Wexta ku Harûn Reşîd dibe Xelîfe lawê Ye'hyayê Lawê Xalid ji xwe re dike wezîr. Du lawê Yehya hene. Cafer û Fezl. Di dewra Harûn Reşîd de Împaratorîya 'Ebbasîyan bi tevî dikeve bin destê Yahya û herdû kurê wî (Ca'fer û Fezl). Evana pir zengîn dibin. Hinek mesele jî di navbera Xuşka Harûn Reşîd û Cafer de çêdibin. Gelekî Musluman jî ji vê Malbatê ne razîbûn.

Di 803ya de (H. 187) Xelîfe Harûn Reşîd, Cafer î'dam dike. Du kurê Fezl û lawê Ye'hya yê din jî davêje zîndanê. Yehya jî binçav dike. Ğeyn ji Mihemedê Xalid ê din tev zîndan dike. Bermekîyê din jî sirgunê Reqqayê dike. Yehya di sala 805a de, Fezl jî di sala 808a de wefat dike. Ji ber ku Reqqa di nav 'Ereba de ye herçî Bermekîyên ku sirgunî nav 'Ereban bune jî, li gorî dîrokvana îro bune 'Ereb an jî di nav 'Erebada winda bune. Mimkumne ku di vê koçberîyê da nîvek malbatên Bermakîya hatibin nava Kurd u Zaza û di nav wan de asîmîle bubin û bi zimanê wan jî xeberdidin lê Bermekî Bermekî ne. Ne Zaza ne. Lewra:

1. Bermekî berya İslamê Budîst in. Zaza (Dimilî) ber ya İslamê Êzidî ne. (Ğeyn ji Kurda di qewmê din de Êzidî tunene)

2. Welatê Bermekîya ê makî Belx e. Welatê Zaza ê makî li Îranê nêzî Xoyê ye.

3. Sirguna Bermekîya di dewra Harûn Reşîd de di sala 803ya de pêkhatîye. Hatina Dimilîya a bi bal van welata ve piştî Herba Çaldêranê ye teqrîben di navbera salê 1500-1600 de ye. Di navbera hatina herduya de 700-800 sal heye. Xenc ji vê hem Kurd hem Dimilî îro li çar dewlata hene. Mesela 'Eşîra Heyderan jî weke Dimilîyan ji Îranê hatîye. Nîvekî Heyderan hê li Makoya Îranê ne. Nîvekî Heydêran li devera Agirî u Wanê ne. Nîvekî Heyderan jî li Dersîmê ne. Heyderîyê Dersîmê Zazakî xeber didin. Lê ji zaravê xwe re Kirmancî dibejin. Kurdên Serhedê jî ji xwe ra dibêjin Kurmanc. Nabêjin Kurd. Hinek Heyderî jî heta Mêrdînê çûne.

Hinek dîrokvan û civaknas ji zaravê zazakî ku hem Kurdî, hem jî Farisî di nav xwe de dihêwirîne û peyvê wî jî zêde guherîn derbasnekirine re dibêjin; Zaza (Dimilî) Bavê Kurda ne. Yanî koka Kurda ne. Zaravê Zazakî jî Çevkanîya zimanê Kurda ye. Ev kes ji bo ku delîla xwe li ser xîmek qewî dagrin mîsalek wihareng tînin ziman û dibêjin: Digel ku Tirkê Tirkmenîstanê koka Tirkên Anadolê ne jî zaravê wanê Tirkî û zaravê Tirkên Anadolê ji hev cûda ye. Têkilîkî wisa di nav Kurdî û Soranîw Zazakî de jî heye. Her çiqas meseleke civakîye wihareng hebe jî biratîya İslamê esl û esas e….wes-selam

Bimînin di xêr û xweşîyê de. Emanetî Xweda bin.

…………………………………………………………

1-) Ermen, ne navê qewmekî ye. Navê herêmekî ye. (B.M. 188-P.M. 429) Şahê Ermen'a Tridat'ê Yekem satrapê (walî) Parsa yê Ermenîstanê bu. Trîdat pîştî Mîladê teqrîben di sala 288a de bû İsewî. Miletê wî jî bi wî re tev de bûn Xirîstîyan û ji Persa veqetîyan. Dûv re jî bi navê Ermen'a hatin naskirin.

2-) Ev Êzidî ji Yezîdîyên nuha cûda ne. Lewra 'Ezdîtî oleke qedîmê kevnar e lê Yezîdîyên nuha qaşo peyrewê Şêx Adî bin Musafîr in. Şêx Adî ji nesla Merwanê Emewî ye. Tu 'eleqa wî û 'Êzdîtya kevnar nîne. Mezhebê Yezîdîyan ji nav İslamê derketîye û ji teref dîroknasên mezhebên İslamê ve wek mezhebek batilê binyadîslam hatiye qebûlkirin. Ji bo agahîyên kurt û kin bnr: Hayatî Ulku, Mezhepler Tarîhî, Çelik Yayinevî, R 162-172,

3-) Lês Barmêcides d'Apres les Historîes Arabes et Persans/Le Vizirat Abbaside)



# Tesewwûf - 3

M. Ce'fer Bêcirmanî

Ji bonî fêma Tesewwûfê divê meriv di serî de mezinên wê nasbike. Lewra ji bilî we'hya îlahî tu 'ilm û meşrebek nîne ku ji ber xwe ve bi awayekî wehbî derketibe holê. Pêşîvanên her rêyî ji ber vê yekê girîng in. Lewra ew in yên ku barê wî 'ilm û meşrebî dane ser mila û gîhandine me û bûne nesla yekem ku îrşada wî rê, 'ilm an meşrebî kirine.

Ji ber ku **şahê welayetê İmamê 'Elî kerremellahû wechehû** ye. Emê jî di serî de bi menaqibên yek ji neviyên wî û mezinê rêya Tesewwûf û gelek 'ilmên İslamî; Ce'ferê Sadiq dest bi behsa Mezinên Tesewwûfê yên nesla selef bikin. Emê di nivîsandina vî beşî de bi piranî bi awayê wergera ji nusxa 'Erebî a pirtûka Tezkîret-ul Ewliya a Ferîdud-dîn 'Ettar îstîfade bikin. Lewra Ferîdûd-în di serê pirtûka xwe da ji î'htîrama xwe ya li hember ehlê beyta Resûlê Xweda 'Eleyhîsselat û Wesselam bi nivîsandina menaqibên Ce'ferê Sadiq dest bi pirtûka xwe kiriye û di bin sernivîsa Ce'ferê Sadiq de be'hsa mu'hebbeta Ehlê Beyta Resûlê Xweda 'Eleyhîsselat û Wesselam jî kiriye. Ferdûd-dîn 'hessasiyeta Ehlê Sunnetê di vî mijarî de xweş beyan kiriye. Ferîdud-dîn 'Ettar di derbarê Ce'ferê Sadiq de dibê:

**Ebî 'Ebdûllah Ce'fer Es-Sadiq:** Ew Îmam, Îmamê Milleta Mustefaiyye, hinceta terîqa nebewî ye. 'Alimê 'amil û siddîq (rast go û kirin)… 'arife kî 'aşiq Ebû 'Ebdullah Ce'fer Sadiq Razîbûna Xweda li ser wî û bavên wî be.

Me di serê[3] pirtûka xwe de beyan kir ku ev pirtûk be'hsa mezinên sûfiyan di xwe de di'hewîne. Meqam û e'hwalên sûfiyan şerh dike ne yên Pêxember û se'habî û îmamên ehlê beytê. Bêguman be'hsa wan û hîkayetên wan di gelek pirtûkên meşhûr de hatiye kirin. Me ji bo teberruka bi ehlê beytê; bi Îmam Ce'fer dest bi behsa mezinên sofiyan kir. Digel vê ew qumandarê şêxan, serek û reîsê wan e. Tevî sofiyan terîqên xwe dighînin wî. Digel ku ew ji Ehlê Beytê ye emê be'hsa hinek menaqibên wî bikin…

**İmam Ce'fer Razîbûna Xweda lê be, di 'ilmên İslamî de imam bû, di terîqa sûfiyan de kesekî mu'temed bû, Şêxê ehlê heq bû, meşhûrê bi sidq û rastiyê bû, pêşîvanê 'abidan bû, di nav ehlê zuhdê de xwedî kerem bû, xwediyê gelek pirtûkên meşhûr bû.** Ez 'ecêbmayî dimînim ji qewmekî ku 'hez ji ehlê beytê nakin û zen dikin ku terîqa wan ne miwafiqê Ehlê Sunnet û Cema'etê ye. Van kesan nizanin ku sunnet terîqa wan e û lipeyçûna cema'etê 'adetê wan e, cema'eta ku emrê me bi peyçûna wan hatiye kirin alê beyt in. **Kesekî ku bawerî bi Mu'hammed 'Eleyhîsselat û Wesselam tîne û 'hez ji 'itret, zurriyet, nevî û 'ehlê beyta Wî (Razîbûna Xweda li Hemiyan be) nake dê îman û baweriya wî çawa sehîh û tam be ?**[1]

Hatiye rîwayet kirin ku Îmamê Şafi'î El Muttelibî Razîbûna Xweda lê be gelek 'hez ji Ehlê Beytê dikir, 'hezkirina xwe a ji wan re gelek caran eşkere dikir. Ji ber 'hezkirina wî a bi şiddet di derheqê wî de gotin ew Rafizî ye û ew xistin girtîgehê. Ji ber vê yekê Îmam Şafi'î di Dîwana Xwe de[2] ev şi'r got:

ان كان رفضا حب آل محمد      فليشهد الثّقلان أنّي رافضي

***"Eger hezkirina Ehlê Beyta Muhammed 'Eleyhîsselat û Wesselam Rafizîtî be; bila cin û însan zanibin ku bêguman ez Rafizî me."***

Eger ku zanîna Ehlê Beyt û Se'habiyên Resûlê Xweda 'Eleyhîsselat û Wesselam ne ji esas û ûsûlên dîn be gelo ev bîd'eta neyartiya ehlê beytê çawa dibe ji esasên dîn ku bingeha dîn xera dike û muxalifê 'Eqîdên îmanê ye…

Ji Îmamê E'zem Ebû Henîfe, hat pirskirin efdelê (meznahiya me'newî) sehabiyan kî ye? Got: *"Ji extiyaran Siddîq û Farûq, ji xortan 'Usman û 'Elî, ji jinikan 'Aîşe, ji keçikan Fatîme Razîbûna Xweda li hemiyan be."*

Guman tuneye ku mu'hebbeta se'habiyên Resûlê Xweda 'Eleyhîsselat û Wesselam wek mu'hebbeta Wî wacib e. Bi vî awayî sunnet hatine rîwayet kirin. Mu'hebbeta Ehlê Beytê jî ji ber ku Ehlê Beyta Wî 'Eleyhîsselat û Wesselam in wacib e. Xwedyê Tefsîra Keşşaf[3] di tefsîra ayeta: "Li ser vê (teblîğa ku ez ji we re dikim) ji bilî 'hezkirina Ehlê Beyta xwe tu ucretekî ji we naxwazim…" (Şura-23) dibêje: "Kî li ser 'hezkirina Ehlê Beyta Muhammed 'Eleyhîsselat û Wesselam bimre di fedla şehîda de ye, gunehên wî tên bexşandin, li ser tobe û îmaneke kamil dimre. Kî li ser 'hezkirina ehlê beytê wefat ke Melekê mirinê, Munker û Nekîr mizgîniya cennetê didinê. Dîsa Kî li ser 'hezkirina ehlê beytê wefat ke çawa ku zava ji bukê re tê xemilandin ji cennetê re tê xemilandin, di gora wî de du deriyên ku vedibin cennetê tê vekirin û gora wî dibe mekanê melekên rehmetê. Li ser Ehlê Sunnet û Cema'etê dimre. Kî jî li ser bu'xd û xezeba ehlê beytê bimre kafir diçe, bêhna cennetê nake." Te'wîla vî tefsîrî ew e ku; kî ji ber ku ehlê beyta Resûlê Xweda 'Eleyhîsselat û Wesselam e ji ehlê beytê nefret bike ew li ser kufrê ye.

Dîsa Resûlê Xweda 'Eleyhîsselat û Wesselam gotiye: *"Cennet ji kesê ku zulmê li ehlê beyta min kiriye û di derbarê wan de eziyetê li min kiriye re hatiye heram kirin.[4]"*

Ji Îmam 'Elî jî hatiye rîwayet kirin ku gotiye: "Min ji Resûlê Xweda 'Eleyhîsselat û Wesselam re şîkayeta kesên hesûdiya min dikin kir. 'Eleyhîsselat û Wesselam got:

*"Gelo tu ne raziyî ku bibî ji çar kesên ku 'ewil dikevin cennetê; Ez û Tu û Hesen û Huseyîn, xanimên me jî li rast û çepên me û zurriyeta me jî li pey xanimên me.[5]"*

Van rîwayetên me zikir kirin çend dilopên biçûk in di derbarê fezîleta Ehlê Beyta Resûlê Xweda 'Eleyhîsselat û Wesselam de. Eger ku firset hebe meriv dikare bi sedan pirtûk di derbarê fezîleta wan de binivîsîne.

Piştî beyana fezîleta Ehlê Beytê di derbarê menaqibên Îmam Ce'fer de hatiye neqil kirin ku:

Şevekî Xelîfe Mensûr, ferman da wezîrê xwe ku Ce'ferê Sadiq bînin 'hafa wî û xwest ku wî bikuje. Wezîrê wî got: Ya Emîrel Muminîn, feyda kuştina kesekî ku xwe ji rûniştin û tevlîbûna digel însanan durxistiye û ji xwe re 'îbadet û ta'et neqandiye, xwe ji xwesteka serokatiyê jî qetandiye, digel van tişta tu zerer û ezîyeteke wî jî negihîştiye Emîrel Muminîn nîne, ev tişt ne minasibê mesle'hetê ye. Peyvên Wezîr feyde nekir, Mensûr peyva wî qebûl nekir. Wezîr çû gazî Îmamê Ce'fer kir. Di wê navberê de Mensûr ji hinek 'ebîdên xwe re got: Dema min şaşika xwe rakir, Ce'ferê Sadiq bikujin. Dema wezîr digel Îmam hat 'hafa Mensûr; Ce'ferê Sadiq silav da Xelîfe, Xelîfe Mensûr ji ciyê xwe rabû û jê re î'htîram kir. Pey re hat kêleka wî û bi tewadû' li ser çokên xwe rûnişt. Kesên li wê derê bûn 'ecêb man ji halê Xelîfe re. Pey re Xelîfe Mensûr ji Îmam Ce'ferê Sadiq re got: Kerem ke çi pêdivî û xwestekekî te hebe ji min re bêje. Îmam Ce'fer jê re got: Xwesteka min ji te ew e ku tu carekî din min neri'het nekî û min gazî 'hafa xwe nekî. Pey re Xelîfe destûra wî da, gelek qedr û î'htîrama wî girt. Pey ku Îmam Ce'fer çû Xelîfe Mensûr ji tirsa ket ta û lerzê û ji hiş çû, 'heya ku sê limêj lê çûn şiyar nebû. Dema hat ser hişê xwe Wezîr pirsa vî 'halê wî kir. Xelîfe jê re got: Dema Ce'ferê Sadiq hat hafa min mexlûqatekî mezin jî bi wî re ket 'hafa min û devê xwe vekir, weke ku dixweste tevî qesra min bibel'îne. Ji tirsa wî mexlûqatî ji bilî 'uzr û îkramê rê ji min re nema. Min li ber Xwedê sond xwar ku ezê îdî neyartiya tu ewladên Resûl nekim.[6]

Dîsa tê rîwayet kirin ku Îmam ketibû xelwet û uzletê. Di heman 'halî de Sufyanê Sewrî hat ber deriyê wî û got: Ey Îmamê Musulmanan! Însan ji faîdeyên peyvên te me'hrûm man, te xwe çima ji wan durxistiye? Îmam Sadiq got: Lewra ez bêhna fesada vî zemanî dikim ku heval û bira jî guherîn. Pey re ev helbest xwende:

ذهب الوفاء ذهاب امس الدابر    والناس بين مخايل و محارب

يفشون بينهم المودة و الوفا    و قلوبهم محشوة بعقارب

*"Weke rojên ku çûn wefa jî çû û însan di navbera xeyal û*

*cengan de ne/ Di zahir de be'hsa wefa û 'hezkirinê dikin, lê nava dilê wan tije dupişkin.[7]"*

Dîsa hatiye rîwayetkirin ku hinek kesan wî dîtine ku cil û bergekî gelek xweşik û biha li xwe kiriye. Li ser vê yekê kesekî jê pirskir got: Ey neviyê Resûlê Xweda 'Eleyhîsselat û Wesselam! Ev cil û bergê li ser te ne ji 'adetê bav û kalên te ye. Li ser vê yekê İmam bi destê wî girt û xist nava cilê ku li serê ye. Ewî kesî dît ku di binê cilê wî de cilekî qumaşê wî hişk û kevin heye û 'ecêb ma. Îmam jê re got: Ev cilê binî ji bo Xweda ye û ev cilê li ser jî ji bo 'îbadên Xweda ye.[8]

**Dîsa hatiye rîwayet kirin ku rojekî ji İmamê 'Ezem Ebû Henîfe pirskir: Kesê xwedî aqil kî ye? Îmam Ebû Henîfe got:** ***Merivê bi aqil ew kese ku xêr û xirabiyê ji hev nasdike. İmam Ce'fer got: Heywan jî bi vî awayî ne dema xwediyê wî lê dixe karê xwe dike û dizane ku karê xwe neke dê xwediyê wî dîsa lêxe. Zane ku karê xwe bike ev jê re bixêrtir e. Îmam Ebû Henîfe got: Ya Îmam! Naxwe li cem te merivê bi aqil kî ye? Îmam Ce'ferê Sadiq got: Merivê bi aqil ew kese ku, dema du xêr li holê bin dikare ji herdûyan karê herî xêrtir kîjan e bineqîne. Dema di navbera du karên xirab de jî bimîne dizane ku kîjan xirabtir e û terka herduyan jî dike. Heger ku teqez divê yek ji herdû xirabiyan bike jî wê demê ji herdûyan kîjan xirabiya wî kêmtir e wî dineqîne[9].***

Rojekî kîsekî ku tê de hezar zêr hebû hate dizîn, xwediyê zêran xwe avête Îmam Ce'fer û got te diziye. Xwediyê zêra wî nasnedikir. Li ser vê yekê Îmam Ce'fer jê re got: Çend zêr di kîsê te de hebû? Wî merivî got: Hezar zêr hebûn. Li ser vê yekê Îmam gazî wî kir û bi hev re çûn mala Ce'ferê Sadiq. Îmam Ce'fer, hezar zêr dayê û wî şand. Pey re xwediyê zêra zêrên xwe dît û hat cem Ce'ferê Sadiq Razîbûna Xweda lê be. Xwest zêrê ku daye wî lê vegerîne. Lê Îmam jê re got: Tiştekî ku me dabe yekî em êdî jê nastînin. Li ser vê camêriya wî xwediyê zêra ji kesên dor pirskir gelo ew kî ye. Dema bihîst ku Ce'ferê Sadiq e, pir şerm kir.

…

Hinek Peyvên Îmam Ce'fer:

***-'Îbadet bê tobe qebûl nabin. Bêguman Xweda 'Ezze We Celle di Quranê de tobê xistiye pêşiya 'îbadetê. Xweda 'Ezze We Celle gotiye: "Ew kesên tobekar û 'abid" (Sûretê Tobe;112)***

*-Bîranîna tobê di dema zikrê Xweda de 'xefleta ji zikrê Xweda ye. Lewra zikrê Xweda heqîqeteke wisa ye ku meriv 'heta ji xeyrî Xweda te'ala hertiştî jibîr neke nagêje wî heqîqetî.*

*-Ji kêfxweşiya mêra ye ku neyarê wî aqilmend bin.*

***-Hevaltiya pênc kesan neke; Nebe hevalê derewkaran, lewra dema tu li balêyî dibî xwedî 'xûrûr û di xapandinê de yî. Nebe hevalê kesê E'hmeq, lewra kesê ehmeq zen dike ku qenciyê bi te dike lê mixabin zererê dide te. Nebe hevalê kesê tima û destgirtî, lewra ew jî di dema tengiyê de deriyê xwe li ser te digre. Nebe hevalê kesê tirsonek, lewra ew jî dema xeterê de winda dibe. Nebe hevalê kesê fasiq, lewra ew jî bi bihayê herî kêm hevalê xwe difiroşe û bi bihayekî herî kêm jî îta'et dike.[10]***

*-Rojekî ji Îmam pirskirin; gelo dewlemendê ku şukrê Xweda Te'ala dike çêtir e an feqîrê ku sebir dike çêtir e? Gote: Feqîrê ku sebir dike çêtir e, lewra qelbê kesê feqîr bi Xweda Te'ala mijûl dibe, lê qelbê kesê dewlemend bi malê dinyê mijûl e.[11]*

…

Ev fezîlet ji Îmam Ce'ferê Sadiq re bes e ku, çar îmamên mezheban; İmam Şafi'î, Ebû 'Henîfe, Îmam Malik û Ehmed Bîn Henbel an feqiyên wî ne an jî feqiyên feqiyên wî ne. Çar İmamên mezin di pirtûk û telîfatên xwe de di fetwa û îctîhadên xwe de gelek ji Îmam Ce'fer neql û rîwayet kirine.[12]

Xweda 'hez bike demekî dirêj emê li ser mezinên Tesewwûfê binivîsînin û piştî ku em ji vî karî vala bûn, li ser mijarên din yên Tesewwûfê dê nivîsên me bidomin. Bi sebra xwendevanên xwe tu mijarekî girîng yê Tesewwûfê nemîne kû emê li serê neaxivin bi destûr û kerema Xweda Te'ala. Xweda Te'ala her bi we re be û we bike dostê ewliyayên xwe.

........................................................................

1- Tezkîret-ul Ewliya, Ferîduddîn 'Ettar, Dar-ul Mektebî 31-40
2- Dîwanuş-Şafi'î Rûpel 77
3- Keşşaf 3/467
4- Tefsîr-ul Qurtûbî, 16/33
5- Musneda Îmam Ehmed, Fedaîlus Sehabe 2/624, Teberanî; Mu'cemul Kebîl 1/319, Heysemî; Mecmû'ûz Zewaîd 9/174. Di derbarê vê hedîsê de Yehya Bîn Ye'la El Eslemî gotiye: Hedîseke ze'îf e.
6- Tezkîret-ul Ewliya, Ferîduddîn 'Ettar, Dar-ul Mektebî 31-40
7- Tezkîret-ul Ewliya, Ferîduddîn 'Ettar, Dar-ul Mektebî 31-40
8- Tezkîret-ul Ewliya, Ferîduddîn 'Ettar, Dar-ul Mektebî 31-40
9- Tezkîret-ul Ewliya, Ferîduddîn 'Ettar, Dar-ul Mektebî 31-40
10- Tezkîret-ul Ewliya, Ferîduddîn 'Ettar, Dar-ul Mektebî 31-40
11- Tezkîret-ul Ewliya, Ferîduddîn 'Ettar, Dar-ul Mektebî 31-40
12- Tezkîret-ul Ewliya, Ferîduddîn 'Ettar, Dar-ul Mektebî 31-40

## JI ROJHELATÊ KURDISTANÊ

# BI SEYDAYÊ MELA REŞÎT RE HEVPEYIVÎNEK

Kelhaamed

*Rojhilatê Kurdistanê di nav erdê Îranê de parçê herî mezin e ji eyaleta Azerbeycana Ğerbî. Li wêderê em çûn bajarê Uşnewyê (Şinwê) bûn mêvanê Mela Reşîd. Mela Reşîd yek ji 'alimê Kurdistanêye, zêdyî 70 salî 'umurkiriye. Çar perçê Kurdistanê û ji herêma Îslamê gelek dewletan û kesan ji nêz ve nasdike. Evîndarên Pêğember jî nasdike û beşdarî merasima wîladeta Pêğember 'eleyhissalatû wesselam a sala 2015 li Diyarbekir bûbû. Ji ber ku şevhêrka me germ û suhbeta me şêrînbû me xwest em xwendevanê Kelhaamed jî beşdarî sohbeta xwe bikin. Bi vê qesdê me ji seyda pirsî, wî jî cewabda:*



**Kelhaamed: Seyda em di xwazin we binasin. Gelo ma hûn dikarin xwe bi me bidin naskirin?**

**Mela Reşit:** Ez gelek kêfxweş dibim ku anha bi we re me û bi we re su'hbet dikim. Navê min Reşid e. Ji ber ku min hinkî xwendiye dibêjine min Mele Reşid. Navê bavê min Mele Se'îd e. Bapîrê min navê wî Mele Qadir e. Ji ewil ve em mela bûne. Me **tedrîsa 'ulûmê dînî** kiriye. Navê gundê me Dewlenos e, bi Farisî dibêjinê Nalûs, nêzî Uşnewyê ye. Teqrîben beriya niha bi 'heftê salî me ewil mektebê Farisî dixwend. Piştre em diçûn medresan. Wî zemanî li ekserê gund û şarê Kurdistanê telebe hebûn. Li gundê me jî hebûn. Li kêleka mizgeftan ode hebûn û ji wan re digotin **'hucre.** Telebe di 'hucran de diman. Diçûn mal bi mal digeriyan **ratib** tanîn. Digotin "ratibê, rehmetê lêbê". Min ewil dersa **serfê** xwend û hinik ji fiqhê xwend. Dersên me serf bû ne'hû bû mentiq bû **belağet** bû **beyan** bû 'eqaîde bû. Ji serfê "Serfê Mîr" hebû. 'Izzî hebû, Tesrîfa Mela 'Elî hebû. Şafiye hebû. Ji ne'hwê jî 'Ewamila Curcanî, Enmûzec û şerha Enmûzecê, Îzhar, Kafiye, Camî û Suyûtî me dixwend. Ji fiqhê, bêtir me Fethulmû'în metna Î'anê, Mînhac, Menhec me dixwend. Ji 'eqaîdê 'eqaîda Nesefî me dixwend.

Bavê min jî bapîrê min jî muderrris bûn. Bapîrê min ewil li Dewlnosê bû dûvre çû Mehabadê. Seydayê minê meşhûr Mela Muhemmed hebû jê re digotin Muhemmedê sofî, pismamê min bû. Ustadekî minê meşhûr hebû Mela Muhemmedê E'zemî jê re digotin. Henefî bû. Li Şinwê. Cenabê Qazî Mela Muhemmedê Xizrînerzîwey hebû, meşhûr bû bi qazîyê Şinwê. Qazî 'alimekî naskirî bû. Gelek telîfên wî hene. Seydayê Mela Hesenê wajî hebû. Ew jî 'alimekî seyyîdî û Berzencî bû. Mela Salihê Colemêrgî hebû, li vir bû, gelek telebeyên wî hebun. Ev herdû gelek meşhûr û 'alim bûn. Seydayê Mela Huseynê Mezdî 'alimekî pir mezin bû. Şêx Yûsufê Burhanî murîdê şêx Sîraceddînê Tewêla ye, ew jî murîd û xelîfê Mewlana Xalid e. Hem îrşad dikir hem xelîfe digirtin. Wê demê şahê Îranê zalim bû bes têkiliya xwe bi feqiyan netanî.

**Kelhaamed: We îcaza xwe ji kê girt?**

**Mela Reşit:** Min ji sê kesan îcaze girt. A ewil ji Qazî Mu'hemmedê Uşnewyê. A duduyan li 'Iraqê ji Seydayê Mela Ehmedê Ristî min girt. Rist gundeke nêzî Îbnûadem e. Mesela Seydayê Mela Muhemmedê Îbnûadem meşhûr e. A sisiya li Mehabadê ji Seyda Mela Muhemmedê Mezdî min girt. Li **danişgeha** Tahranê jî min **îmtîhana me'qûl û menqûlê** da, yanî hat tesdîqkirin ku va min îcaze girtiye.

**Kelhaamed: We çiqas ders da?**

**Mela Reşît:** Ji dema ku min îcaze girtiye ta nuha ez dersa dibêjim. Şêst û du sale ku ez ders dibêjim. Ez mela bûm. Feqiyên min ji pênc kesan ta bist kesî hebûn.

**Kelhaamed: Têkildarîya we çawa û çi wextê bi Risalê Nûr re çê bû?**

**Mela Reşît:** Di ewwelê feqîtiya xwe de min qederekî li Tergewa xwend. Tergewa gundekî di 'hidûdê Tirkiyê û Îranê de ye. Min İzhar dixwend. Hûn dizanin İzhar çiye ne? Belê min İzhar dixwend. Min bihîst ku digotin bi navê **Seydayê Mela Se'îd** seydayekî mezin heye şi'ra dinivîse, kitêba dinivîse. Li wê mintiqeyê ustadê ustadê min hebû ji rîsalê hinek xwendibû. Mela Mecidê Sorebanî hebû 'alimekî meşhûrê bi nav û deng bû, ew şakirdê Ustad bû gelek behsa wî dikir. Wexta min İzhar dixwend, teqrîben ez pazde şazde salî bûm 'eleqên min di gel Seyda peyde bûn. Hê Ustad li 'heyatê bû. Beriya niha belkî bi 'heftê salî Min kitêbên wî peyde kir. Dema ku min îcaze sitend, yanî teqrîben şêst û du sala berya nuha û ez çûm wî gundî Seyda 'hê li heyatê bû. Bes min nizanibû li kê derê ye. Di gotin di zindanê de ye. Ez niha jî Rîsalê Nûr dixwînim û 'eleqa min pêre hêj jî zêde ye.

**Kelhaamed: We ji Rîsalê Nûr çi xwendiye?**

**Mela Reşît:** Min kulliyat hemû xwendiye. Teb'en wê demê kulliyat ne bûbû mecmu'e, hê parçe parçe bû. Her parçekî me peyda dikir û dixwend. Kitêbên wî bi Tirkî bûn bes tercemeyî 'Erebî dibûn. Kitêba ku min ewil xwend Tefsîra Ez-zehraweyn bû. Kitêbên dî jî min tev dîtin, İ'hsan Qasim tercemeyî 'Erebî dike. Min terceme dîtine.

Kelhaamed: Derheqê ulemayên Kurd û xizmet û xebatên Wan de hûn dikarin çi bêjin?

Mela Reşît: Belê di vê mijarê de gelek teftêş çêbûne. Mamosta Mela 'Ebdulkerîmê muderris li Beğdayê ye gelek kitêb nivîsîne. Gelek 'ulemayên dî jî nivîsîne. Xizmetên 'ulemayên Kurd gelekin. Futûhatên İslamî û .... hwd. Yên ku telîf çêkirine mesela Seydayê mele 'Huseynê mezdî, Seydayê mele E'hmedê Turzanîzade neviyê Qizilcî ustadê danişgaha Tebrîzê bû wî jî telîf çêkirine. Ji Kurdê Sine Ayetullah merdûq telîfên wî hene. Ji Kurdistana 'Iraqê Seydayê mela Ehmedê Koyî tefsîra Quranê çêkiriye deh cîld e.

**Kelhaamed: Têkiliya seydayan ligel gundiyan çawa bû?**

**Mela Reşît:** Gelek germ bû. Seyda di nav gundiyan de wek ferdê muqeddes bû. Li hemî gundên Kurdistanê seyda îmamê hemî cema'etê bû. Di dewra ku min melatî dikir de melayê gundekî muqeddestirê şexsên wî gundî bû. Hem îmamê cema'et bû hem îmamê cum'ê bû hem wa'iz bû hem muderrîsbû. Wer'hasil her îmamî muderristiya cema'etê dikir. Ew melayê ku tam xwendibû hem fetwa dida hem îsla'ha navbeyna cema'et û 'eşîra dikir hem jî melayekî heger kêm xwendiba diçû cem melayê ku xwendina wî temame jê sewal dikir. Mesela digot: "Seyda! Ev muşkila gundê me heye. 'Hukmê vê meselê çiye. Wî jî cewab dida. Herwekî hun jî dizanin wê demê dıktor nebûn, nexweş dihat melayê gund li serê du'a dixwend û diqediya çêdibû.

**Kelhaamed: Baweriya hemî gundiya bi mela hebû?**

**Mela Reşît:** Bê îstîsna hemî werê bûn, bê 'eqîde nebûn. Di zemanê min de werê bû. Heger yek bihatina gundekî Kurdistanê û bê'eqîdebûna yan jî **terkîselatbûna** der'hal ew ji gund derdixistin. Jixwe kafir tunebûn. Kesên terkîselat jî xwedî nedikirin. Digotin yan tê nimêj bikî yan jî derkevî û herî. Heger limêjkerbûna li mizgeftê, li hucrê yan jî li mala xwedî dikirin. Mu'ellimê mekteban jî hemî nimêjker bûn. Kafirê mutleq li Kurdistanê tunebûn. Eger hinek bihatina jî derhal dihatin kuştin.

Ew dewrên ku min behs kir di şertên zehmet de min xwendiye, gelek muşkil min dîtiye. Temamê Îranê û 'Iraqê ez bi niga geriya me, bi şev li riya mame. Bav û bapîrê min ders dane min jî ders daye. Birayê vî yê ku em niha mêvanê wî ne Xatemî zavayê min mela Seyyîd Muhemmed 'alimekî gelek **mutebehhir** bû, di telebetiye xwe de wefat kir min li ba wî jî xwendiye. Ji ğeyrî wan 'alimê ku min behs kir li Kûyê, yên Rewandiz û Hewlêr.

**Kelhaamed: Cenabê we ji bo 'ilm û melatiyê gelek geriyaye, gelek kes naskiriye û kitêbê Ustad Bedî'ûzzeman jî xwendiye. Em dixwazin tiştekî 'ilmî û waqi'î ji we bipirsin. Însan çiye gerek çewa be?**

**Mela Reşît:** Mesela ev 'hucre ji bo min daîrek biçûk e. Cihê ku min lê xwendiye yanî Kurdistan jî daîrek mestir e. Daîra ji hemî daîra **wasi'tir** jî heye ew jî daîra însaniyetê ye. Xwedayê 'Ezîm ku be'hsa erd û asîman dike be'hsa însan jî dike. Însan divê çewa be? Însan û 'ilm bi hev re tên zikirkirin. "Xeleq el-însane



'ellemehu-lbeyan." Meqamê însan meqamekî 'ezîm e. Daîra însan daîrekî mezine; şamilî ser Kurd û Tirk û 'Ereb û 'Ecem û Belûc û hemî qewman dibe. Şandina Pêğemberan û **hukema** û 'ulema û û **danişmendan** hemû hedef eve ku însan xwe binasin. Tu însanî, gerek tu xwe binasî bê ka tu çiyî? Xulqiyeta erd û asîman, **elsîne û elwan** ji ayetên 'ezematên Xwedane. Însan bi 'ilm dibe însan. Însan mutemeddinê bît-teb'e. Însan bi tenê najî. Dibê hevserê wî hebe, dibê ewladê wî hebe, dibê refîqê wî, mekanekî wiyê germ hebe. Ev hemû **merbûtê** bi hîkmeta însan ve ne. Quran û hemî kitêb û su'hufên semawî û hemî pêğember, ji Hezretî Adem ta pêğemberê me xebitîne ku însan xwe binase. Enbiya, suleha, hukema, danişmend, sofî û derwîşan hemiyan behsa însan kirine.

Gelek **bu'dê** însan hene. Di cihetkî de însan heywan e, **heywanê natiq e,** ev meşhûr e. Bi vî cîhetî însan dixwe, vedixwe û di zewice. Cîhetê cenawirtiyê jî heye. Mesela di dinyayê de ji bo hinik menfe'etê muşterek însan însan dikuje. Eviya **teme'a cinawirtiyêye.** Di vucûda însan de nûrek heye hatiye veşartin di 'heywaniyet û cinawirtiyê de. Ev nûr çewa ku di 'hedîsa Resûlê Ekrem 'eleyhîsselatû wes-sellam de hatiye nûra melekî ye. Di însan de cîhetê melekûtî jî heye. Yanî îlahî merbûtê bi Xweda ye. 'Edalet û mer'hemet **wesfên melekûtîne,** di însan de ne. Resûlê Xweda ji deva xwe hatiye xwarê **mûristanik** ji ber nigê devê daye alî. Eshabên wî jî wiha kirine. Di wê demê de 'Erebên cahil jî keçikên xwe dikuştin, ji jinikê re digotin te çima lawik ne welidandiye. İslamê însanek çêkir ku ferqê naxe navbêna xwe û ğeyrê xwe. Pêğemberê Xweda ji bo Selmanê 'Ecem dibêje Selman ji me ye. Eviya derseke ji me re ku kesê liyaqeta însaniyetê pê re hebe hevdû qebûl bikin. Şi'rek heye dibêje "noqsanî ji Qabîl e ne ji Habîl e". **İstîdad** di însan de heye, bes mûhît însa xeradike. Di Kurdistanê de 'eşîrên diz hebûn. Bes piştî hukmê İslam ğelebekir nav Kurdistanê diz neman. Hedefa pêğember û suleha û hukema eve ku însan bi hev re bijîn. Ne lazime ku însan ji mizgeftan dernekeve û bi limêj û 'îbadet tenê meşğûl be. Resûlullah ('a.s.w.) yek 'hukûmet teşkîl kir. 'Hukûmeta wî ya ewil di şikevtê de bû. Ewil yek daîre bû, Ew û Ebûbekrê Siddîq bûn. Piştî hîcretê ev daîre çû Medînê. Li gel Yehûdiyan têkilî çêkir û hembihem Îslamiyet bi pêşve çû. Di dewra 'Usmaniyan de jî ev têkilî dewam kir. 'Usmanîyan her rojê cihek fet'h dikirin. Teb'en piçkî zulma wan jî çêbû. İslampêş ve diçe bes kafir nahêlin pêş ve here. İmperetora İngilîz muslumanê şî'î û sunnî bi hev dide kuştin. Mesela şerê Çaldıranê şerê navbêna Şî'î û sunniyan bû. Kafiran ev şer derxıst. Di hukûmeta Pêğemberê Xweda de hemî kes dihatin 'hewandin.

Mesela heger cilekî reş, yekî sor û yekî sipî hebe İslam dibêje ranehêj yê reş, rahêje yê sipî. İslambi riya bi muzakerê muşkilan hel dike. Li 'Iraqê şer û helahela ye. Ji bo çi? Ji bo kursiyê. İslam heger kursî dide jî ji bo 'edaletê dide. İslamji însanan re dibêje cîhetê 'heywanî bavêje, cîhetê cinawirî (sebû'î) bavêje.

**Kelhaamed: Cenabê we wek 'alimekî Kurt ji însanê Kurd re hûn çi tewsiye dikin?**

**Mela Reşît:** Kitêbên 'hîkmet, felsefe, 'eqîda Îslamî ez li hemiyan dinerim. Di nezera min de, ez 'eqîda şexsê xwe dibêjim: Jibo însanê Kurd û ğeyrî Kurd tev de wehdet lazim e. Yanî tefahum bikin, ji halê hev fêmbikin. Eviya ji hemû tiştan çêtir e. Carna li televizyona 'Iraqê temaşe dikim. Mesela 'alimekî pîrê

fanî wek min derdikeve di gel jineke ku temmamê 'umrê wê li Ewrûpa derbasbûye suhbet dike. Jin jê sualê dike dibêje: "Çima Îslamê îzna zilam daye ku bi çar jina re bizewice û îzna jinê nedaye ku bi çar zilama re bizewice?" Ka ev jî xeberdane yanî. Heyran tu vê sualê neke, hezar 'heb muşkilên te hene. Ev sual bixwe ğelete. Muşkilên me ne ev in. Eviya meselekî şer'îye. Xweda di şerî'eta xwe de rê ji vê re vekiriye. Ji bo Kurd û ğeyrî Kurd yek rê heye, bi riya wehdetê tu zanî ku tu însanî. Mesela însanên Tirkiyê yan jî 'Ereb, em li cem hev rûdinên wek hev nan dixwin, çay vedixwin, rûdinên, ew jî şer pê nexweş e, huzûr pê xweş e, em jî werê ne. Îja ji bo çi em şer bikin. Kurd yan ğeyrî wî ji her însanan re tewsiya min ev e ku nêzî hev bibin û tefahum bikin. Ji halê hev fêm bikin. Mesela ji Îslamê fêm nakin û dibêjin "Îslam hê dînê 1400 sal berê ye". Ê 'heyran hê tu Îslamê nas nakî. Lazime tu textikê xwe hazir bikî hê xerîtê li serê bikşînî. Gerek tu Îslamê nasbikî hê xeber bidî. Îslam dînekî çawa ye, ji bo jina çi dibêje, ji bo mêra çi dibêje, ji bo ciwana, ji bo malbatê, ji bo civakê, ji bo dewletê….ji bo hemî tiştan çi dibêje çi dike ka nas bike. Yanî teleba her kesî gerek wehdet be. Pêğemberê Xweda (a.s.w.) daîra wî li Medînê gelek firehbû. Bi hemî dîn û cema'etan re hevkarî dikir. Xwedayê 'Ezîmuş-şan însan li ser fitretê xuluqandiye. Em dibêjin însan bira însan be. Dema ku însan însan be



wê xwebixwe musluman jî bibe.

**Kelhaamed: Ji bo xwendevanên Kelhaamed hûn dixwazin çi bejin?**

**Mela Reşît:** Ewwelen kelhaamed es'habiyên şehîdên Diyarbekir dixe bîra min. Min tirbên wan ziyaret kiriye. Wekî din jî şehîd li wir hene. Wek Şêx 'Ebdulqadir û Şêx Se'îd, Xweda meqamê wan 'alî bike. Meşhûre dibêjin Mewlana Xalid jî hatiye Amedê gotiye ev erda han hemî cihê şehîdaye. Ji ummeta pêğember (a.s.w.) gelek li wir hatine kuştin. Kelhaamed îftixara me ye ku eshabe li wirbûne. Merqeda kurê Xalid bin Welîd Suleyman jî li wir e. Ji xwendevanê vê kovarê jî ez dixwazim ew tiştê ku me got wê însaniyetîyê pêkbînin. A duduyan bira cehd bikin pir bixwînin, bira temamê kitêban bixwînin. Ji bo ku di 'alemê de we'hdet peyda bibe û me'hebbet di navbeyna 'alemê de peyda bibe. Heger kesên rewşenbîr zede bibin wê Amed ji nû ve were feti'hkirin. Çewa ku berê jî rewşenbir pirbûn û Amedê feti'hkirin.

Ez bi wesîla Kelhaamed bi nav û 'unwanê xwe yê xas ji **serokê sê memleketan; Turkiye, Îran û 'Iraqê** tiştekî bitenê teleb dikim: Bira xettê Îslami, xettê 'Erebî ne guherînin bi nivisnê din. Latînî ne xettê Asyayî ye. Li Tirkiyê hukum hat guhertin, xet jî hat guhertin. Bes li Îranê dewra Pehlewî, jê re dibêjin Riza Şah xwest ku bi guhere, 'ulemayê Faris qebûl nekir ku were guhertin. Çimkî wê demê me dît ketxudayan î'lan dikirin, digotin Şah dibêje wê xettê Îranê bibe latînî. Teblîğat dikirin digotin însan zû fêrî latînî dibe. 'Ulemayê Tebrîz, yê Tehran, yê Qûm qebûl nekirin. Şah xwest ku şewqê jî bike lîbasê Îraniyan, 'ulema ev jî qebûlnekirin. Mela Xelîl ji 'eşîra Mengura şer li ser kir got em vî lîbasê kufrê qebûl nakin.

Di dinyayê de çend 'alim hene **ev şewqa Îngilîz qebûl nekirine:** Li Îranê Mela Xelîl. Mela Xelîl Kurd bû, 'alimek bû ji welatê me bû. Çimkî ev lîbas ê kafira ye. Lîbasê Efğaniyanbûna ê 'Iraqiyanbûna me qebûl bû. Bes ev lîbas me ne qebûl e. Li ser vê bi şah re nêzî du sala şer kir. Qirawat û pantor û çakêt jî her wiha 'aliman men' kirin. Çimkî lîbasê Îranî ne ev in. Li Mehabadê Mela Mihemmedê Bor hebû, bavê Mela Hejarê şa'irê Kurd, wî jî şewqe qebûl nekir. Xumeynî jî wê deme telebe bû, ewî jî şewqe qebûl nekir. Û ustad Muhammed Şakir li Misrê, ku li ser Musneda Îmam Ehmed şerh çêkiriye, wî jî şewqe qebûl nekir. Dibêjin Ustad rojkê di paca danişgehê de li derve dinere 'eskera bi şewqe dibîne. Dibêje ev çi ne? Jê re dibêjin qurban evana yên me ne. Ew jî dibêje "înna lîllah we înna îleyhî racî'ûn. Ev lîbas ne ê me ye, ez tu car qebûl nakim." Li Tirkiyê jî Mela Se'îd û 'Atif şewqe qebûl nekirine.


www.bangaheq.com

# TU BI XÊR HATÎ

Zekî Ekînci



Şevê tarîr tu bû roj, ronî te da her dera.
Tu bi xêrhatî ey Resûl, ser çav û hem ser sera.
Lê em aşiqê tene, bê te qet em nikanin.
Gavam bê te bimînin, emê çawa bikenin.

B'hatina te me naskir, rêya heqq û rêya baş.
Me terkkir dozên bettal, rêya heq me nekir şaş.
Carna em bûne Musab, me kir terka dê û bav
Carna jî em bûn Bîlal, li çola em man bêav

Dem hatin em bûn Xebbab, l-ser agir em kelandin
Wan bi zûlm û zorê, goştê canêm 'helandin
Li ber zumla zalima, sebir kir me her demê
Lazim be mê can bidin, ji bo de'wa Îslamê

Ew cefaya me kişand, jibo me nebû elem
Cefaya em dikşînin, di nivîsîne qelem
Ji mer gul û reyhanî, ji bo te çi wer sera
Mê her dem bimeşînin, ew doza pêxembera



# Bismilllah

Yehya Ezdarî

"Bîsmîllâh"serê her xêrê ye û em jî bi wêna dest pê dikin.  Birayên 'ezîz! Di kovara Kelhaamed de ev nivîsa min a ewil e. Ji ber vêqasê min xwest ku ewil em bêjin Bîsmîllah. Bi navê Xweda em dest bi nivîsa xwe dikin û em alîkarîyê ji Xweda dixwazin. Ê ku ji Xweda alîkarîyê bixwaze, înşaallah wê Xweda alîkarîya wî bike û wî muwaffeq bike.

Jîyana me û mirina me tev di dest Xweda de ye. Ecelê ku ji me re tayînkirîye, ji wî pêve kesek nizane. Ev heyata ku em li dinyayê di bihurînin jî bi Xwedê ye. Di vê kovarê de nivîsên minên bi kurdî, bi xwestina rizaî îlahî wê bêne nivîsandin. Meqsedek, armancek me tenê heye, ew jî ku em çawa dizimanê Tirkî û Erebî de rizaa Xweda dixwazin, emê bi Kurdî jî bi xwazin. Înşaallah di kovara Kelhaamed de jî ewê nivîs ji bo rizaa îlahî bêne nivîsandin.


Ez dixwazim nivîsa xwe bi zimanekî sivik binivîsim ku hûn birayê me ji nivîsa me îstîfade bikin. Lewra gelek caran nivîsa bi Kurdî dixwînin û em dibînin ku ziman gelekî giran e. Ji ber vê xwendevan ji xwendinê zû diweste û nema dixwaze bixwîne. Xisûsen ez di bêm nîvîsên Kurdî, lazime zimanê wan gelekî sivik be. Ji ber çi? Levra em nivîsên pirtûkan daîm bi Tirkî ya jî bi 'Erebî dixwînin. Zimanê nivîsa giran be, ev çağ xwendevan naxwazin wê nivîsa me bixwînin û berê xwe didin zimanekî dî.

Armanc û meqsed ji nîvîsê ewe ku xwendevan ji nivîsa me îstîfade bikin. Armanc ne ewe ku di nivîsa xwe de hinek sen'etna ya jî hunernên edebî pêşberî hineka bikin. Jiber kuarmanc ne bitenê hunerên edebîne, belkî armanc rizaa îlahî ye û xwestina ku xwendevan pê rê ya xwe nasbikin. Dipêşîya wan de nivîs bibe ronayî. Piştî ku xwendevanên min, xwe hînî zimanê min û nivîsên min kirin, hingî ewê hînî edebîyata kurdî jî bibin.

Zeman û sebir lazim e ji xwendinê ra. Lewra sebra meriv li ser xwendinê tunebe, ewçax ji binî ve meriv nikare bi pêş bikeve. Her çiqas bi zimanê kurdî ji berê de nîvîs hene jî ji ber ku zimanê kurdî ne zimanê resmîye, li herêma me xwendevanên wê hindikin. Ji ber vêna jî ez ji xwendevanan dixwazim ku li ser xwendinê bi sebirbin. Înşaallah wê ji zimanê kurdî jî gelek tiştan hînbibin.

Zimanê meyî kurdî gava meriv pê xwend û nîvîsand, lazime nebe sebebê meriv ji zimanê dî ya jî ji birayên xweyên muslumanên dî dûr bikeve. Lewra bi sebeb 'esabîyetê meriv ji riza îlahî mehrûm dimîne. Emê nivîsa xwe bi nîyeta ku her zimanek ji ayeteke Xweda ye bi nivîsînin û înşaallah ewê xwendevan jî bi wê nîyetê bixwînin. Em û ew bi hevra emê bighên xêr û rizaa îlahî.

Kelhaamed înşaallah xizmeta armanceke mezin dike û em hêvî dikin hê bêtir bêxwendin, birayên me yên kurmancê Musluman pê rêya Xweda nasbikin. Li pêşîya wan jî bibe ronayî û nivîsên me yên ku em tê de bi nivîsînin, ji kovarê ra bibin rengekî nû. Ji lew em ji birayên xwe dixwazin ku kovarê bixwînin. Em ji Xweda yê xwe dixwazin, Xweda me û we teva bighîne xêrê. Li vê dinyayê û li axîretê xêr û xweşîyê bide me û we teva. Emanetî Xwedê bin. Heta nivîseke dî bimînin di xêr û xweşîyê de. Esselamû 'eleykûm we re'hmetullahî we berekatûhû…



# MEYNENOŞÎ

Mela Ehmedê Cizîrî

Meynenoşî Şeyxê Sen'anî 'xelet
Ew neçû nêv Ermenistanê 'xelet

Mislê Mûsa wî tecellaya te dî
Ê tu dî kanê xeta hanî 'xelet

Wî nedî bejna te û dayê qiyas
'Hîkmetê lew çûye burhanê 'xelet

Setweta Leylê yeqîn Mecnûn tepand
Wer ne Qeys naket beyanê 'xelet

Wek Nişanî neqş û nîşanek te dî
Ê ku nîşanek te dî kanê 'xelet

Ez giham ava 'heyatê xef ji dil
Xudr-i vajî çûye 'heywanê 'xelet

Şahnûşînên nazikan zayi' mekun
Da nebînî dil bi vê xanê 'xelet

Ellah Ellah çerx û dolabê dinê
Nuqte qet nakit di dewranê 'xelet

Roj û şeb her seyrê dîdara te tên
Nakirin ew dewr û seyranê 'xelet

Hûn nebên meşşateyê xef daniye
Hemqeran kir xal û nîşanê 'xelet

Dê bi ser canê me murwet da me êx
Bişkuwên benda girîbanê 'xelet

Ser nebî ber kufrê zulfê 'aqîbet
Ez ditirsim lê ji îmanê 'xelet

Pehniya vê çerx û dolabê dinê
Nisbeta erbabê 'irfanê 'xelet

Nusxeê 'alem hemî 'unwanek e
Nuqteyek nabit di 'unwanê 'xelet

Qulzum û bayên muxalif tê pir in
Da nekelşîn darê sukkanê 'xelet

Da bizanî pehlewanî mûyekê
Dest nedî lil-lahi mîzanê 'xelet

Wê di destê min gula geş pir xûnav
'Heyf-i bulbul çû gulistanê 'xelet

Hê ji sehwa xameê bû werne min
Ev 'xelet nakir di dîwanê 'xelet

Wê li ser bejna te ev seywan veda
Wer ne nada roj-i seywanê 'xelet

Geh dil û geh can dibin tirkên te tên
Nakirin ye'xma û talanê 'xelet

Meşrebê tirkan Firat û Nîl-i kir
Teşneleb çû terfê 'Ummanê 'xelet

Pîrê 'hikmet bin li wifqa meşreban
Kes nedî mey rêhte fîncanê 'xelet

Rast e yek qanûn seraser nîne tê
Xwehrî û pêçên perîşanî 'xelet

Pakiteb' û quwwetek mewzûn divêt
Da nedit sen'et bi idmanê 'xelet

Merdimên çehvên Melê 'eksa xwe dî
Wek Nişanî ma li nîşanê 'xelet



# Navekî Axretî

Azad Rêbiwar

Ji meha meha nisanê bû û em li çayxaneya li hember avanîya rektorîyê ya li ser rêka Diyarbekire runiştibûn. Ber êvarî bû. Xelkin jê bi tirêmbêlan ji Dîyarbekirê yek bi yek carna jî li pey hev, ji wîladeta pîroz vedigeryan û alên tewhîdê di şibakên erebên wan de dihatin libakirin. Û wan dîmenan hiştibû ku gûftûgoyeke tund têkeve navbêna me.

Wê nîqaşê bi qasî se'etekê domkiribû. Hema bêje me mixê hevdû biribû. Dema ku em ji çayxanê derketin, êdî berêvarî bû. Ji ber ku bihar hê bi nazenîn tevdigerîya, peyarêk bi însanan tijî bûbûn. Te digo qey hemû kesî ji hundur bazdaye derve. Berya ku em rabin, em li ser şerê salên nodî axivîbûn. Ya rastî, ya me neaxavtin bû. Weke ku min berî niha jî gotibû me bi nîqaşeke zexm hevdû gelekî 'acizkiribû. Nîqaşa me li xala ku bê ka kî neheq bû û kî ne nehaq bû û bê ka kê hiştibû ku ew bûyerên xwînrij destpêbikin dema bû ewiqî. Her çiqasî oldar jî bû di vê mijarê de, layengirîya ê derve dikir. Dema ku di dawîya nîqaşê de got "Heke tu wan "sofîka" bi timamî nebire, ew mesela meya dubendîtîyê jî bi timamî ji holê ranabe." Ji ber ku min hêvîya tiştekî wiha jê nedikir, ez gelekî metelmayî û bêtir jî hêvî şikestî mabûm. Lê dîsa jî ya rastî min qenç fêm nedikir bê însanekî weke wî ji bo çi û çima dilxazîya şiddetparêzîyê dike? Di pêvajoya axavtinê de mesele bêtir zelal bû. Ji gotinên wî wilo xwuya dikir ku ne layengirê şiddetparêzîyê bi tenê ye, di heman demê de dilxwazê ji holê rakirineke ji kokê ye jî.



Piştî wêqa niqaşê em rabûn ber bi navenda bajêr ve çûn. Şûr devê me nedibirî. Min û wî me hevdû ji kovaran nas dikir. Gelek caran berhemên me di heman kovaran de diweşîyan. Lê ew cara yekemîn bû ku em rû bi rû li hevdû dirûniştin û bi awayekî hêvîşikestî û nîvdilmayî ji hevdû diveqetîyan. Hê em bi vî awayî dimeşîyan em di peyarêkê de leqayî cotekî ku dest bi dest bûn hatin. Li ber me sekinîn û silav dane me. Min ew nasnedikirin. Lê min ji axavtina wan derxist, ku ew û havalên min hevdû ji zûde nasdikin. Di dawîya xweşbêşîyê de mijar hate ser navê pitika(bebeka) havalê min ê ku Xwedê nû dabû wan. Li ser pirsa navê pitikê, min dêhnê xwe dayê ku hevalê min diqelqilê û naxwazê bibersivêne. Wî hevalî ji ber ku îmajeke wiha di derbarê xwe de çêkiri bû, ji wî cotî we ye ku ê navekî "kurdewer" jê bibihîzin. Lê wilo xwuya bû ku wî di vê derbarê hewl dida ku berê mijarê bi alîkî dî ve biqulibêne. Lê hingî me rû lê danî bi ser neket ku mijarê bigûherê. Mecbûr ma bi derûnîyeke lêborînxwaz û bi awayekî fedîkar wiha bipeyivî:

- Me navekî axretî lêkirîye.

Li ser wê yekê min weke yekî ku kêmasîyeke dijberekî xwe dîtibe, israr kir da bêjê bê ka çi nav lêkirîye. Bê dilê xwe ji bêgavî, bi derûnîyeke lêborînxwaz û bi awayekî fedîkar bi tenê hevokeke jê çêbû.

—Em dibêjine Muhammed Huseyîn.

Cotê me nexwest ku wî zêde bixine bin fedîkarîyê û xwestin ku şaşwazîbûna xwe bi van peyvan veşêrin:

—Keka baş e. Te navekî zêde xweş lêkiriye. Ser xêrê be.

Bi wan gotinan xwatir ji me xwestin û mêşa xwe domandin.

Min bi wê pîvanê careke dî fêmkir ku divê bawerîya rasteqîn şikedarî û kompleksa nizmbûnê dixwe de nahewêne. Bawerî tiştekî serhildêr e. Bawermend, weke ku di kitêba pîroz de jî hatîye gotin, divê ji lomeyên lomekaren jî qet ne tirs e û şerm jî neke.

Avanî: Bina
Tirêmbêl: Taksi
Şibake: Pencere
Dîmen: Görüntü
Guftûgo: Söyleşi, diyalog
Peyarê: Kaldırım
Xal: Madde, nokta
Ewiqîn: Oyalamak
Oldar: Dindar
Layengirî: Taraftarlık
Dubendîtî: Anlaşmazlık, ikilik
Metelmayî: Şaşkınlık
Şiddetparêzî: Şiddeti savunmak
Pêvajo: Süreç
Navend: Merkez
Dêhn: Zihin, dikkat
Qilqilîn: Telaşlanma, tedirgin olmak
Kurdewer: Kürtle ilgili
Derûnî: İçten
Lêborînxwaz: Af isteyen
Pîvan: Ölçmek
Rasteqîn: Doğru
Şikedarî: Şüphecilik
Serhildêr: Başkaldıran

بُو لُومَا دِگُوتِنْ بِی اُوغِرِي هَاتِيَه.

قَاصِداَ گُوتْ: پَارَاوَيَا خَيْرُ و شَرَّا ژِوَيَه ، نَه ژِبِی اُوغِرِياَمَيَه ، گَلُو كُو اَمْ وَعْظاَ بِكِنْ وِی بِی اُوغِرِي هَبَه؟ نَا خِيرْ ژِخُو هُونْ مِلَّتَكِي نَه دِكُفْرِی دَه زِيدَه چُونَه.

«وَجَاءَ مِنْ اَقْصٰى الْمَدِينَةِ رَجُلٌ يَسْعٰى قَالَ يَا قَوْمِ اتَّبِعُوا الْمُرْسَلِينَ. اِتَّبِعُوا مَنْ لَا يَسْئَلُكُمْ اَجْرًا وَهُمْ مُهْتَدُونَ. وَمَا لِىَ لَا اَعْبُدُ الَّذِي فَطَرَنِى وَاِلَيْهِ تُرْجَعُونَ»

ژِدَاوِياَ بَاَژِيرْ زِلَامَكْ هَاتْ، اَوْ حَبِيبِ نَجَّارْبُو، سَحْكِرِبُو كُو قَوْمِ وِي دِخوَازِنْ قَاصِدَا بِكُژِنْ. گُوتْ: اَيْ قَوْمِ مِنْ بِخَبَرَا قَاصِدَا بِكِنْ، قَتَادَه گُوتِيَه: حَبِيبْ دِشِكَفْتَكِيدَه عِبَادَتْ دِكِرْ چه وَقْتِی كَو خَبَرَا قَاصِدَا بِهِيسْتْ بَزَانْدُ و هَاتْ، ژِقَاصِدَارَه گُوتْ: تِشْتِی كُو خُداَ وَه پِی شَانْدِيَه هُونْ لِسَرِی اُجْرَتَكِي دِخوَازِنْ؟ قَاصِدَا گُوتْ نَاخِيرْ، اُجْرَتَامَه اَنْجَاغْ لِسَرْ خُدَايَه، لِقَوْمِ خوه زِڤِري وْ گُوتْ: ڤَانْ كَسِی كُو ژِوَه اُجْرَتكِي نَاخوَازِنْ بِخَبَرَاوَانْ بِكِنْ.

قَتَادَه گُوتِيَه كُو: قَوْمِ وِي ژِيرَه دِبِيژِنْ «قَیْ تُوژِي لِسَرْ دِينِ وَانِي؟ حَبِيبَ وُسَا جَوَابْ دِدَه «اَوِي خُدَايِی كُو مِنْ خُلُقَانْدِيَه وْ هُونِی بِزْڤِرِنْ بِبَالْ وِيڤَه، چِبُويَه ژِمِنْ كُو اَزْ ژِيرَه عِبَادَتْ نكِمْ؟

«ءَاَتَّخِذُ مِنْ دُونِهِ ءَالِهَةً اِنْ يُرِدْنِ الرَّحْمٰنُ بِضُرٍّ لَا تُغْنِ عَنِّى شَفٰعَتُهُمْ شَيْئًا وَلَا يَنْقِذُونِ. اِنِّى اِذًا لَفِى ضَلَالٍ مُبِينٍ. اِنِّى اٰمَنْتُ بِرَبِّكُمْ فَاسْمَعُونِ»

«گَلُو اَزْژِخُدَا پِيڤَه بِهِنَكْ اِلٰهِی دِنْڤَه خَوه بِگْرِمْ؟ اَگَرْ كُو خُدَا بَلَايكِي بِينَه سَرِ مِنْ رِجَايَا ڤَانْ اِلٰهِ دِنْ وِی مَنْفِعَتَكْ نَدَه مِنْ، وِی دَمِی اَزِی دِرِيَا شَاشْ دَه بِمْ»، لِرَسُولَا دِزْڤِرَه وُسَا دِبِيژَه «هُونْ شَاهِدْ بِنْ كُو مِنْ بِرَبِّ وَه اِيمَانْ اٰنِيَه»

بِهَڤْدُورَه خُوه دَاڤِيژِنْ سَرِی بِنِگِ خوُه پِيلِيدِكِنْ حَتَا كُو رُوڤِيِنْ وِي دِپَاشْ وِيدَه دَاڤِيژِنْ. سُدِّی گُوتِيَه : كَڤِرَا دَاڤِيتِنِی وِيژِي دِگُوتْ «يَارَبِّي تُو قَوْمِ مِنْ هِدَايَتْ بِكِي »

«قِيلَ ادْخُلِ الْجَنَّةَ قَالَ يَالَيْت قَوْمِی يَعْلَمُونَ. بِمَا غفَرَ لِی رَبِّی وَجَعَلَنِی مِنَ الْمُكْرَ مِينَ »

رُوحِ وِي بِلِنْدْ دِبَه بِبَالْ جِنَّتِی ڤَه، ژِيرَه دِبِيژِنْ: بِكَڤَه جَنَّتِی. دَمَا كُو لِجَنَّتِی تَمَاشَه دِكَه دِبِيژَه: خُوزِيكَا قَوْمِ مِنْ زَانِبُونَا كُو رَبِّ مِنْ مِنْ بَخْشَانْدِيَه وْ مِنْ گَرَانْدِيَه ژِاَهْلِ اِكْرَامِی وْ قَنْجِي بِمِنْ كِرِيَه.

«وَمَا اَنْزَلْنَا عَلٰى قَوْمِهِ مِنْ بَعْدِهِ مِنْ جُنْدٍ مِنَ السَّمَاءِ وَمَا كُنَّا مُنْزِلِينَ. اِنْ كَانَتْ اِلَّا صَيْحَةً وَاحِدَةً فَاِذَاهُمْ خَامِدُونَ.

پِشْتِي كُشْتِنَا حَبِيبْ مَه ژِاٰسِمَانَا عَسْكَرْ نَه شَانْدْ ژِبُوْیْ كُو وَانْ هَلَاكْ بِكِنْ وُ اَمْ نَاشِينِنْ ژِي، عَذَابِ وَانْ ژِدَنْگَكِي پِيڤَه نِينْبُو، يَكْ دَنْگَكِي بِقِيرِينْ بَسِيوَانَه ، ژِنِشْكَا ڤَه تَڤْ مِرِي بُونْ ، بُونَه وَكْ وِي بِزُوتِ كُو اُگِرِ وِي طَفِيَايَه.



## قَالَ يَالَيْتَ قَوْمِى يَعْلَمُونَ
## بِمَا غَفَرَ لِي رَبِّي وَجَعَلَنِى مِنَ الْمُكْرَمِينَ

# اصحابى ياسين - ٢

محمد مهدي حلمي

بسم الله الرحمن الرحيم

«قَالُوا مَا اَنْتُمْ اِلَّا بَشَرٌ مِثْلُنَا وَمَا اَنْزَلَ الرَّحْمٰنُ مِنْ شَئٍاِنْ اَنْتُمْ اِلَّا تَكْذِبُونَ»

ژِقَاصِدَارَه گُوتِنْ: هُونْژِيِ آنْجَاغْ اِنْسَانِينْ وَكَه مَنَه، هُونْژِيِ خوَارِنْ دِخُونُ و دِسِكَاكَادَه دِمَشِنْ، خُدِى تَعَالٰى تِشْتَكْ نَازِلِيِ سَرْ وَه نَكِرِيَه كُو هِنَكْ تِشْتَا اَمْرْ كِرِبَه وْ ژِهِنَكْ تِشْتَاژِيِ نَهِى كِرِبَه ، هُونْ آنْجَاغْ دَرَوَادِكِنْ.

«قَالُوا رَبُّنَا يَعْلَمُ اِنَّا اِلَيْكُمْ لَمُرْسَلُونَ. وَمَا عَلَيْنَا اِلَّا الْبَلَاغُ الْمُبِينُ»

قَاصِدَانْ گُوتْ: وَلَوْ هُونْ مَه لِدَرَوَا بِقَلِبِينِنْ ژِيِ رَبِّ مَه دِزَانَه كُو اَمْ قَاصِدِنْ بِبَالْ وَقَه، تِشْتِى كُو لِسَرْمَه فَرْظَه آنْجَاغْ تَبْلِيغَا كُو بَيَانْ دِكَه خُدَا يَكَه.

«قَالُوا اِنَّا تَطَيَّرْنَا بِكُمْ لَئِنْ لَمْ تَنْتَهُوا لَنَرْجَمَنَّكُمْ وَلَيَمَسَّنَّكُمْ مِنَّا عَذَابٌ اَلِيمٌ. قَالَوا طَائِرُكُمْ مَعَكُمْ اَئِنْ ذُكِّرْتُمْ بَلْ اَنْتُمْ قَوْمٌ مُسْرِفُونَ»

ژِقَاصِدَارَه گُوتِنْ: بِسَبَبْ وَه بِى اُوغِرِي هَاتِيَه نَاقَامَه، اَگَرْ هُونْ دَقْ ژِقِي ايشِى خَوه بَرْنَدِنْ اَمِى وَه بِكُوژِنْ وُ اَوِى عَذَابَكِي دِژْوَارْ ژِمَه بِگُهِيژَوَه. هِنَكْ عَالِمَا گُوتِنَه اَوْعَذَابِ دِژْوَارْ بَرِيَا كُشْتِنِى چَرْمِ وَانْ ژِلَاشِ وَانْ دِكِرِنْ وُ دَسْتُ و نِگِ وَانْ ژِيدِكِرِنْ وُ وَانْ دَادْلَقَانْدِنْ.

خُدِى تَعَالٰى سِى سَالَا بَارَانِى ژِوَانْ بِرِي

# PEYVÊN PÊŞÎYA

- ❑ Galgala ket nav dev û dirana, wê bigere li bajar û şaristana.
- ❑ Îşê xwe bike bi esas, bila dilê te neke taswas.
- ❑ Keda helal dibe mû naqete, keda haram bibe weris jî diqete.
- ❑ Ku kela şorbê çû, buhayê heskê pere nake.
- ❑ Rêya dirêj bi gavên biçûk dest pê dike.
- ❑ Seb û şekir çûn Diyarbekir, şekir rûnişt deng nekir, seb rabû pesnê xwe kir.
- ❑ Şerm, şerefa jina ye.
- ❑ Agir bi erdê dikeve terr u hişk tevî dide ber xwe.
- ❑ Sukût zêr e şiteğalî  zîr e.
- ❑ Gur ket nav pez kuçikê xerab 'ekisî.
- ❑ Gundê bê rez şivanê bê pez û yê dibê ez ez vala ye.
- ❑ Tirs merga  rovî ye.
- ❑ Nîşanê baranê ba ye û yê mirinê ta ye.
- ❑ Dewê ceribandî ji mastê neceribandî çêtir e.
- ❑ Dujminê bi'eqil ji dostê ehmeq çêtir e.
- ❑ Bersiva ehmeqa sukût e.
- ❑ Du parê xizanîyê ji nezanîyê ye.
- ❑ Kurmanc têr e xew jêr xêr e.



# BANGEŞE / PROPAGANDA

Ebûzer BAYRAM

Bi navê Xwedayê Rehman û Rahim. Hemd ji Rebbê 'alema re be Însaallah emê li ser mijar'a Bangeşeyê rawestin. Ev mijar gelek berfireh e ji ber vê di nivisê de em nikarin bi giştî li ser bisekinin. Bi qederê hînbûna xwe emê bi kurtî Ji hev re bibêjin.

Bangeşe ji bo pêkanîna armancekê û wê armancê bi koma civakê bide qebûlkirin, an jî hêsê wan bixe bin bandora xwe gelek birengek sîstematîk û teknîkî şuğlê xwe dike. Bangeşe ne tenê ji bo koma tê şuğulandin li gor armanca merkeza ku bi bangeşeyê 'emel dikin diguhere. Carna li ser civaka, carna li ser kesayetên di nav civakê de tên naskirin carna jî li ser bûyeran tê şuğulandin. Bangeşe mana wêya di ferhengêde bi latini çêkirina ramanên nû çandina şağên nû ye. Bangeşeya ewil a ku tê zanin bi rengê belavokî (reklamcılık) destpêkiriye. Di sala 1890'an de di zanîngehan de belavokî û dersên bangeşeyan hatiye dayin. Bangeşe di qirnê 20 da gellek pêşde çûye û bûye malzeme ji bo civakên xwey neyar û her hêz li gora berjewediyen xwe wê istimal kirine û dikin. Bangeşe bingeha armanca wê ne aqilê insan e belkî rûhê insan e û bingeha armanca bangeşeyê jî ne ku bi însanê ferdi ye. Di cihgirtina însanê di nav komê da ye, lewra insanê di nav komê da li gor kesên ferdî pir hêsane guherandina fikrê wî û sewqkirina ramanên wî. Sewqkirina komê pir rihet e, Ji bangeşeyêra vekiriye şuğulandina wê, lewra kesên di nav komê da tabira wê caiz be 'eqlê kesê di nav komê da ji kîsî komê ye. Yani ew ne ku aqlê xwe istimal dike koma ku di navê de di çi baweriyê de be ew jî li gor wê baweriyê reng distîne, bi aqlê xwe na fikire ji ber vê îqnakirina vî kesî li gor kesên ferdî pir hêsan e.

Bangeşeyên ku psikolojiya civakê bi rûmet nebîne tu dem têk naçê. psikolojiya civakî qistasa wê ne kesên rewşenbîr in qistasa wê ew kesên navendên civakê ne, kesên ku werin îqnakirin jî ew kes in, bangeşe tenê van tişta nake, pirê caran ew tiştê ku kesayeta însan teşkîldike (raman û baweri)'ya guherandina wan ji xwer dike armanc, bi taybetî evêya bangeşeya dîn û ideolojiya ji xwer dikin armanc. Di jiyana rojane de bangeşe ku tê gotin tiştê ewil tê hişê mirov gereke ne tenê rêxistinê saloxtiyêbin (istihbarat örgutleri). Ji bilî van, ê pir bangeşeyê dişuxulînin hene, weke partiyên siyasi, armanca wan'a bingehî pirkirina endam û dildayên wane û kêmkirina endamên partiyên kû li hemberi wane. Ji bo vê armancê bangeşeyên serbilindî û ê ne jêhatî pêk tînin, armanca wan ramanên xwe bi civakê bidin qebûlkirin, her wiha mirov dikare minayan zêde bike, îja gereke bangeşe bi çi hawayî be, weke her tiştî bangeşe jî jibo bi serkeftî be lazim e li unsurê xwey bingehî bi cih bîne, ev unsuran'a ev in:

1- Gerke bangeşe ramaneke wê an ji peyameke wê hebe, ji bo li ser wê fikrê rûnê, û ew fikir û raman ji tiştê ku pêwistiya gel bi wî hebe, ne wihabe bi kêr nayê.

2- Merkeza ku bangeşe ewê lê bêkirin lazim e diyarbe û lokal be ji bo ku peyaman bi millet bidin qebûlkirin, pêywist e afîş, wêne, film û unsurê medyayê, medyaya civakî wek vana pirê tiştên din werin pêk anin.

3- Hewceye ku pêvajoya bangeşeyê profesyonel be lewra bangeşe sin'etek zanistiye, sin'etek evqas pêşve çûye mirov nikare bi amatorî pêşve bibe. Kesê di warê bangeşeyê de dixebitin siyasetmedar, civaknas,

derûnnas, psikyatrist, belavok(reklamcı) fêrin pêywiste ew di merkeze de bin.

4- Bangeşeya bêkirin gereke mirov jê bawer bike û ewledarbe, armanca wê ya sereke xwe bi koma civakê bide qebulkirin, eger bangeşe koma ku dixwaze bixe bin bandora xwe bawerî nede wan wê demê ew bangeşe bê hêz dimîne ti rumeta wê çênabe li ser însana.

5- Lazim e bangeşe civaka ku têde kar dike li gor çand, bawerî, kevneşopiya wan tevgera xwe bike ji bo ew bangeşe di cih de be. Bi kurtasî emê qîma xwe bi van unsurê bangeşeyê bînin û derbasî cûreyê bangeşeyan bibin, di nav wan jî bangeşeya gewr (gri propaganda) û bangeşeya reş (kara propaganda) emê bêjin.

**BANGEŞEYA GEWR/GRÎ PROPAGANDA**

Çavkaniya vê bangeşeyê ne diyar e bi gote got'a û tiştê ne rast dixwaze kesa rêxistina û saziya biçilmisîne, belê van kirinên ku dike jî li gor sîstemekê bi cih tîne. Ev bangeşe ji bo nerastbûna wê neyê diyarkirin, ku were eşkerekirin jî bi temamî bela ku nayê vekirin bandora wê dimîne li ser kesa. Ji hêla din ji ber çavkaniya wê ne diyare gereke bi dizî bigre. Ev bangeşe jibo ewlehiya xwe nexe xeteriyê xwe diveşêre.

**BANGEŞEYA REŞ /KARA PROPAGANDA**

Bi veşartina xwe ya di pişta çavkaniyekê xebatê xwe yê bangeşeyê bi cih tîne. Ji bo neyê zanîn çavkaniya rast lazim e xwe veşêre, ti exlaq û sînor jê re tüneye, bi her hawî mijara îstîsmar dike, xweynrijandinê ra rê vedike. Ew kesê ku vê dikin bi her hawayî xwe diveşêrin. Ji bo neyên naskirin bi kesên tarî û binerdê re xebatê xwe dikin, da ku li cihê neyarên xwe bi şuxulin. Jibo neyên naskirin tim cihê xwe diguherin, yanî ev celebê bangeşeyê ti tiştek exlaqî nasnake li gor'a menfaata xwe dixebite.

Bi kurtasî mijara bangeşeyê ewhaye, belê cureyê bangeşeyan pirin. Weke, bangeşeya çekdarî, siyasî, bazirganî, stratejîk yanî gelekin. Em jî li gor hînbûna xwe li ser sekinîn. Em ji xewedayê dilovan dixwazin me bibexşîne û kêmasiyên me tune bike, serkeftin ji xweda ye Emanetî xweda bin wesselam.

# KÊ MÛSHAF DIZÎYE?

Mûhemmed ARASAN

Bi navê Xwedayê Rehman û Rehîm. Rîwayet dibe ku Ebûl Hesen el-Eş'arî li Besrayê piştî we'za xwe diqedîne ferq dike ku mûshafa wî ji alî ceme'etê ve hatiye dizîn. Lê ceme'et jî li ber we'zawî pir muteessîr bûbû digrîya. Ebûl Hesen wezîyetê fehim kir û berêxwe da ceme'etê û go: "Hûn giş digrîn lê gelo kê mûshafa min dizîye?

Ev bûyera qewimîye, 'ecziyeta halê 'alema îslamê yê îro çiqa xweş bi me dide nîşandan. Îro li ser rûyê dinyayê, nêzîkî du milyar musluman dijîn. Van muslumana jî di navbêra xwe de gelek ceme'et, parti, civak û weqif sazkirine. Ev musluman hemî behsa wehdetê, yekîtîye, biratîyê û aşitîyê dikin. Û hemî musluman jî ji tefrîqayê, ji teassûbê û ji neyekbûnê gazinan dikin. Feqet ummet di bin tefrîqayê de û di bin zulm û wehşet û ğedra zalim û murted û bê olan de ye.

Tu dinêrî ji xeyni çend heb ceme'etan tu kes ji bo wehdetê wezîfeyên xwe bi cîh nayînin û ji bo çareserîya vê pirsgirêkê, destên xwe naxin bin kevir. Madem em tev wehdet û yekîtiyê dixwazin, gelo ev tefrîqe û te'assub ji bo çiye?

Weka ku di vê hîkaya me li jorê ji we re behs kir de derbas dibe, madem em hemî musluman wehdet û yekîtiyê dixwazin, gerek em bixebitin û ji bo biratî û yekîtiya muslumanê ndinyayê destê xwe bixin bin kevir.

Jibo em muslumanên ser rûyê dinyayê azad û rizgar bibin, serfirazbibin û li hemberî kuffar û mustekbîran muzaffer bibin, gerek em di navbêna xwe de yekîtiyê avabikin. Ji ber vî hawî pêwist e em îxtîlafên xwe deynin alîki û mijarên ku me li ser îttîfaq kirine, derxinên pêş û em li dora mûshaf (Qur'an)ê werin cem hev. Lewra çareserîya vê pirsgirêkê di mûshafê de ye. Xwedê Te'ala gotîye "mumin giş birayê hevin" pêwist e ku em emrê Xwedê Te'ala di jîyana xwe de bimeşînin da kû em derkevin xelasiyê. Ez hêviya dua dikim we dispêrim Xwedayê mezin.

# CEWHERÊ 'EŞQÊ KOZ E

Mehmûd KILINÇ

Heger bi hezkirinê ve hatibe girêdan û ketibine deryakê
Ev derya oqyanûsa agire tû bizan be ey nefs!
Di himêza ğefletê de bakirina bênderê ji ber çiye?
Jibo di sîtilê çîlê de bikelin em hatine.

Geh wek mecnûn dibe çolîstan wetenê me ji nefyê nefya re
Geh weke Yûnus dibe hîcret karê me ji bajarên bajara re.
Geh şikeftek xalîye Mekanê me xewilxane xewilxane me dihewîne.
Belkî bi sala me tehemul kir zindanek tarî jibo berdilk.
Kî dizane belkî xilata pêşbazîya me şehadetek bi hevra ye…

Bifikire ey nefs! Tu tunebû, nav û nîşanê te tunebû. Hebûn jî tûnebû.
Piştre xweda mewcûdan xuluqand, û 'eşq tê de neqişand
Hebûn bû cesed û 'eşq jî bû rûh ji cesed re.

**Û paşê xweda Adem xulq kir dakû destanê rûh û cesed bixwîne**
**Û Adem nav bi nav xwend 'eşq bo temamê meleka werin 'eşqê da di secdê de bisekinin.**



Te dît qedera me 'eşqe ji Adem û bi şûnda. Û Rebbê Wedûd zarê Adem bi destê qûdreta xwe anîne hebûnê. Jiber vê yekê havênê me 'eşqe, paşeroja me 'eşqe, pêşeroja me 'eşqe, feryada me 'eşqe, sikûta me 'eşqe, seyr û sefera me 'eşqe, vegera me 'eşqe, birîna ku me davêje nava nivîna 'eşqe, dermanê her derdê me, merhema me 'eşqe… Û temamê bêjeyên me yên ji ewil heta dawî tev 'eşqe…

**'Eşq berdilke. Di meydana 'eşqê de zafer encax bi razîbûna berdilk mimkune bikar bê. Lê belê ev meydan meydana gernas û mêrxasa, meydana 'egît, şareza û cengaweraye ey nefs! Ciyê ğeflet û neğemxwurbûnê di vê meydanê de tune ye. Çimkî dujminê herî dijwar jibo êrîşan diranê xwe tûj kirine di qûncikê vê meydanê de…**

Ji roja te xwe li vê meydanê dît, bi îsbatkirina 'eşqê tu hatî mukellefkirin ey nefs!

Xwepêşandina te ye ji berdilk re bi deyne li ser sutûyê te tu bizanbe ey nefs!

**Em baş dizanin di vê dinya bi hem û ğem de me'na 'eşqê herdem bela, mûsîbet, tengî û ta'lî û zorî ye… Behra pêlê wê me digewixîne behra bela ye, rêwîtîya 'eşqê ye…**

'Aşiq herdem xwe di nav agirê Îbrahîmê pûtşikîn, Zindanê Yûsûfî û bobelatê Eyyûbî de dibine. Piştre sulûkek Huseynî 'aşiq digre, temamê rê û rêçê wî di oğira dildar de li cennetê raserî hev dibin…

**Di mêvanxana dildar de meriv bê hewandin ne rihet e ey nefs! Lazime di oğira vê 'eşqa dilhenûn de tu di 'erz û 'îyalê xwe, di canê xwe û malê xwe de bibuhire; delalîyê ber dile xwe feda bike, ji hanûman bibuhire… Ah wê wextê tê bighêje dergaha berdilkê xwe…**

Ji ğeyrî berdilk heger bi tiştekî din xwe girêde û meylî îsyanê bike ey nefs! Wê demê agirê Nemrûdê hemçax dê rûhê te û cesedê te bişewitîne. Lê belê heger bi peymana xwe re tu sadiq bimînî; li bircê firdewsê yê herî bilind bayên rehmetê bi ser te de dê bigobile…

**Bi 'eşqa bêdawî bixwîne û bi hezaran belayên hatine serê aşiqa bibîne. Wek pinpinîke di nav agir de diber xwe didin tê temaşe bike çîlexana wan ya tijî kul û keder… Ji xwe 'eşq agire û 'aşiq jî ew pinpinîkê xwe davêjin nava agir…**

Cewherê 'eşqê koz e. Ê dikeve navê bi şewatên herî dijwar dişewitin. Lê belê ev şewat zirarê nade 'aşiq. Ev şewat wek agirê cewher dihelîne, 'aşiq jî arî û safî dike ji qirêja munkeratan.

Çimkî di nava bizotan de dişewite û ji temamê qirêj û gemmaran pak û paqij û zelal dibe 'aşiq…

Ah ji pîrê 'eşqê Mewlana çend bêjêyên 'eşqê keşif dike:

**"Temamê 'emrê min ev hersê peyvin: Ez xambûm, kelîyam, şewitîm"**

**Û 'aşiqê 'umrekî di nava vî agirî de şewitiye, weke ava heyatê çîla bela, derd û kûla vexwarin. Wext hat bi roja tî û birçî man, mîna têrexwaran bi kêf sebir kirin. Wext hat qesr û qonağê birewş pîxwas terk kirin. Û jibona berdilkê xwe, weke dînan bi çola ketin, heyyibîn... Wext hat rêwiyê 'eşqê yê keremkar mal, mulk, meqam, zarok, pîrek 'erz û 'îyal û hemî tiştê xwe terk kirin; û bi ber çemê 'eşqê ve herikîn. Wext hat bo canan di canê xwe de bihurîn, xwe avêtin nav pêtîyê 'eşqê yê herî gur…** Rûhê xwe yê pak û paqij di mista meleka de pêşkêşî berdilkê xwe kirin.

**Serpêhatîya 'eşqê ya Dinya bê man bo bighîne hermanê eve ey nefsa serkêş! 'Aşiqê bi rastî herdem jibo bighêjin jora 'eşqê, dema xwe ya pir di xewilxana de, di şikefta de, di zindana de; bi nefya bi sirgûna, bi hîcreta û pîxwas, tî, birçî û tazî buhartin. Lê belê serkeftinek bi cezb û coş lidar xistin, di vê riyê de sist nebûn…**

Çimkî 'aşiq agirê berdilkê xwe jî bi ava heyatê ya bêdeng ditefîne; û qenc dizane cewherê 'eşqê koze…

**JI HEYATEKE BÊ'EŞQ EM XWE DISPÊRIN XWEDA… AMÎN.**

Xewilxane: Çilehane — Berdilk: Önlük — Bêje: Sözcük, kelim — Gewixandin: Boğmak, Boğazlamak

# ZIMAN Û JIYAN



Şerîf Emîn

**Ziman;** sedema mewcudîyeta însan u gelan e. Ew eşq e, aşiqbun e, Mem û Zîn e, Sîyabend û Xecê'ye. Dê u bav, war u welat jî bê wî tiştek nîne. Heqîqet,ziman domkirina temamên neslên zindî u jîyan e.

Ziman; si'hr e, şî're, bo insan bîr e. Si'hra ziman, bela'xet u gotina şîrîn e. Pêxemberê 'alem gotîye: "Di gotina belîx de si'hr heye." Ev sîhr bo temamê teyr û tûr û mar û mûr, bo temamê dar û ber yanî kurtîya kurt ji bo jîyana hemû zindîya ne.

Zîneta dunyayê temami bi qudreta lisan e. Filozof (Nîetzîche) wiha gotîye: Dema ku însan qezî (peyvandin) kir wê demê dunya bu gulîstan."

Carna, kes ji me u e'hwalê me fêm nake an jî em ji wan tiştek fêm nakin. Sedema wî kêmasîya gotin û zimanê me an ya muxatabê me ye. Gelek însan, hinek caran nikarin xwe îfade bikin an jî dil heye teqet teneye. 'Alima bi îttifaq gotîne: Ekserê însanan nivîskar in, hunermend u şair in lê belê nikarin xwe îfade bikin. Em dizanin tiştên ku neyê ifadekirin ew hîç ender hîç e.

Fitrreta benîadem, bê qezî u gotin hîç nabe. Em, fikr u gotinên xwe an ji insananre an jî di cîkî tenha de ji xwe re, bi şeklek monolog îfade dikin. Ev, bo me îhtiyacek zerurî û fitrî ye. Bo însan ziman ne yeke, du 'hebin: Zimanê bi ziman û zimanê bê ziman.

**Zimanê bi ziman ev e:** Serkela dil, hîs, eyanbûn, feraset u îdraq û fehm.. Temamê van tişta ji bo însan ziman in.

Bo heywanan, "lîsanê hal" heye, ew jî bêzimanî ye. Zimanê bi ziman di îfada hinek tiştan de zimanê eslî ye. Zimanê bi ziman yanî edebîyatên qewlî., beşerîyeta însan, jîyana rojane li ser vî zimanî qaîm e.

Carna însan bê çare dimîne, pes dibêje, wê çaxê em dest bi zimanê bêziman dikin. Mûsikî, resm, mîmarî û … hwd jî mîna edebîyat ziman in lê belê tiştên hunermendî ne bi zimanê rojane bi zimanê edebî tê îfadekirin.

**Ziman u Emperyalîzm:** Dema ku Qewmên Ewrupaî gelê mezlum bindest kirin, koledarîya wan li cîhanê 'hakim bû. Gelek zimanê dunyayê ji rû erdê rabûn an jî hatin hilanîn. Emperyalîsta ziman kirin du şax, zimanê 'hakima û zimanê me'hkuma

Ji zimanê hakima re gotin zimanê jorîn. Bo wan; zimanê jorînê bilind û medenî zimanê İngîlîz û Fransewî ye. Koledar u maldarê dunê ev ziman li welatê bindesta bi destê zulm û zorê, bi dek û dolab dan 'elimandin. İro birçîyê Ruanda, Somali û gelek cîyên Efrîqa vî zimanê emperyalist u xwînmija mîna zimanê mîllî u zimanê dayîka xwe dizanin û di peyîvin. Hasilî kelam ziman heye lê belê nan tuneye. Destê vala, li ser zikê birçîye. Bi zimanê Kurdî; mezinê me bilbil e, xwarina me gilgil e!

Ji zimanê me'hkûm û bindestanre jî gotin zimanê jêrîn. Ev ziman ê bindestan ê kole u cahilan bû. Li

gorî Emperyalîsta lazimbû ku ev milletên han ji cehalet û wehşet û ji şundamayînê xelas bin. Medenîyet, ronahîbun u îlmê(!?) Ewrupa medenî bo me'hruman gelek dil'henun û dilşewat bû. Zaliman keç layiqê dê, kur jî layiqê bavê nedîtin û tucar qebûl nekirin. Loma dest bi asîmîlasyonê kirin.
Proja koledara kûr u mezin bu. Gelê dunyayê berya wan di halê xweyê mutewazî de dilşad bûn. Gelek zengînî, huner û hunermend hebûn. Xwînmij û kedxwaran temamê îfadeyên herêmî, navçeyî, ziman, zarava(şêwe) devok, mîmarî, muzîka herêmî û navçeyî; govend û lîstik, ken u kêf û hwd talan kirin, wêran kirin û kuştin.
Zimanê Fransewî piştî 'Herba Cihana Duyemîn,cîyê xwe terikand da Zimanê İngîliz û Anglo-Saksonê. Bo zimanê bêkesan tehrîbata herî mezin, û qetlîama 'eslî ev dem e.
'Evrupa u 'Emriqa, bo bêçareyan dibe evîn û xewna memleketên zengîn u şevên rengîn. Êdî ev der bo şundemayîyên cîhanê û cîyê xebat û maldarî û zengînîyê ye. Eql u fikrê mezluman îfsad bu. Bajarê New York, Londra, Parîs ji bo wan bûn cîyê hunermend u hunermendîyê. Tercumeyên roman u 'hekyatên wan bûn şaheser(?) Hunermendê ku bi zimanê ecnebî (îngîlizî) dişte'xilîn bi qîmet u navdar bun (?)
Fêkî u sebzeên 1000 salî bê GDO şifa didan. Ev toximê pak jî bi toximê İsraîlê yekreng îfsad bu. Xerbîya temamê merez û nexweşîn u fuhşîyatên xwe, îxracî welatê me kirin. Ji wê demê û ta nuha em li hember wan muziratan bê çare u bê tedbir in. Mereza wan bi me girt em merezî bûn.
Temamên emperyalîsta bi zikê vala, lê bi mamoste, papaz u keşîş û xebatkarên zana hatin welatê bêkesa. Xayîn û binbirkî (sînsi) li rûerdê gerîyan. Li Asya, Afrîqa, 'Emrîqa ya Bakûr u Başûr, Sîpana Alasqa di nava cemed u qeşa wan deran de çar hawêl gerîyan. Qewmên wan deran û çanda wana bakîr îfsad kirin, qetlîam kirin. Ewwil ziman u gotinê wan, 'erf û 'adetê wan, qeyde u toreên wan, teçhîzatê wanê hilberîn, berkêşanê (hasilat) wanê hezar salan tomar kirin û birin. Paşê lêkolînerên mezin,li ser malzemyê wan bi bêr, bivir, merr, kulbe, das u pale û..hwd lêkolînên kûr kirin. Emperyalist bêînsaf u bêwîjdan bûn lewra bi vê jî nesekinîn Dom kirin kelepor, îman; şiklê psiqolojîya wan, fêmkirin û 'heskirina wan, dereca eql u fikrê wan yek bi yek bi nîyetek û xerab û koledar sentîm bi sentîm vekolan. Di derheqê her tiştê wan de lêkolînên mîlîmetrîk kirin. Paşê jî her tiştê wan birîndar kirin, kelepora wana qedîm rakirin û birin. Li gorî koledarên 'xerbî û medenîyeta wana "bê mîm;" temamê dunyayê di cehalet u tarîtîyê de bû. Dinya ku ji wan Emperyalistan der u dûre di 'esra 20-21an de nîne. Di dewra ewwilê dîrokê yanê di dewra kevir de ye.
Xerba Humanîst? ji temmamê van tişta re tehemmul nedikir: Warîdat, sermaye u qezenca milletên 'xeyrî wan yên sed salî, hezar salî bi temamî bo wan "kêmasî bu. Heram û, mirdar bû. 'Halê wan ne 'halê însana bû. Gerek însan medenî, modern û 'esrî bûna. (?)
Zaliman qaşo alîkarîya Mezluman kirin? Lê her tişt ji destê wan girtin û birin. Ev tiştek dijwar e, giran e. Kurd u Kurdistan jî di dîrokê de duçar u belengazê van tişta ne! Di temamî helbest, govend, lorîk u kilamên Kurda de behsa vê me'xdurîyeta wan bi aşîkarî tê kirin.
Daye Mirim

...........................

Ez mam li wê xerîbîyê
Çavê min kesî nabîne

Mirim mirim dayê mirim
Birin birin bavo birin
Çavê reş u belek birin

Ezê herim jê vê xeribiyê
Mirim ji destê bêwarîyê
Bîra dayk û bavan dikim
Ez herim jê vê xerîbîyê.
(Anonîm/Heme Haci).



# PEYAMÊN SÛRETÊ FATÎHÊ

Fatîh AKMAN

Sûreyê Fatîhayê di Qur'ana Pîroz de di rêza yekem de ye. Di nava gel de bi navê **'el-hemd'** têgotin. Tê wateya destpêkê an jî vekirinê. Ji xeynî navê el-hemd navên Fatîhayê yên din jî evin: **"Ummu'lkîtab (maka kitêbê), el Kenz (xizîne), Şîfa, El-esas (hîmê Qur'an a pîroz)"**

Fatîha, du'aya herî mezin e. Em li ser li mêja xwe sozê didin Xweda ku

**1-**Em hemd ji tere dikin kû Te ev qas nî'met û başî dane me û te em kirine ji ummeta pêxember, ey Rebbê 'alemê!

**2-**Bi navê xweyê Rehman. Te ni'metê xwe li hemû evdên xwe kiriye û Te ne gotiye ev 'evdê min bawermendin, ezê rehma xwe li wan kim yan jî bêbîr û bawer in, ezê wan di nav tinebunê de bihêlim. Tu li hemû bendeyên xwe van nî'metên bêsînor dike heta qiyametê.

**3-**Roja qiyametê bi navê xwe yê Rehîm Tu dibêjî: Ezê bi tenê Rehma xwe li bawermenda bikim.

**4-**Tu xwediyê roja Dîn (roja qiyametê, roja xelat û cezayê). Kê xwe bi tayê Te girtibe û xwe bi rêça pêxemberê te girtibe, bi neyarê Te û Pêxember û mustaz'afên mumin re têkoşîn kiribe, Tu wan bi bihuştê şabike. Yên ku ji xeynî Te û Pêxemberê Te, çiqas kesayetên di bin siya fikr, raman û olên curbicur de neyartiya ehlên imanê dikin, Tu xelata wan bike dojeh.

**5-** Xwedayê min! Ez bi tenê ji te re ta'et dikim û ez bi tenê alîkariyê ji te dixwazim.

**6-** Xwedayê min! Li ser rêya xwe dilê me û lingê me sabît bihêle. Te çawa ni'met li hezkiriyên xwe (pêxember, salih, şehîdhwd) kiriye, Tu wilo li me jî ni'metê xwe bike û me bêxe rêya heqiyê. Xwedayê min! Tu me nenivîse ji wayên ku heqiyê dizanin û qebûlnakin, ji ber vê jî te xezeba xwe li wan kiriye û çûne delaletê û ketine rêya şaş. Amîn.

Vî sûreyê ku jê re tê gotin maka kitêbê, bi rastî em bi tefekkur bixwênin û van peyaman tetbîq bikin, wê biratî çêbe, yekîtî çêbe, ezîzbûna ummetê û zelîlbûna kufrê saz bibe. Em hêvîdarin û li bendene.

Peyam: Mesaj
Yekem: Birinci
Wate: Mana, anlam
Mak: Dayik
Hîm: Esas
Bende: Abd, köle
Têkoşîn: Mücadele
Bihuşt: Cennet
Raman: Düşünce, fikir
Ol: Din
Cûrbecûr: Çeşit çeşit
Dojeh: Cehennem



# SERÊ HÎKMETÊ TİRSA Jİ XWEDA YE

Mela Fesîh MEMÎŞ

Rebbê me û Rebbê kaînatê Ellah-û 'Ezimuşşan, em ji bo 'ebdîtîyê xuluqandine, ji bo ku me îmtîhan bike, bê ka kî bêhtir 'emelê qenc dike, heyat (jiyan) û memat (mirin) xuluqandine. Armanca xuluqandina dinyayê, ji bo ku em xaliqê xwe nasbikin, serê xwe ji Wî re deynin, bi emr û nehyê Wi 'emel bikin û armanca xuluqandina mirinê, ji boku em ceza û mikafat (xelat)a wan 'emelê xwey ku me di 'heyata dinyê de kirîye em bibînin. Ê ku'emelê wî qenc be; ewê bibe misteheqqê re'hma Xwedê û cennetê û ni'metên ebedî û dîtina cemala Wî û ê ku 'emele wî ne qenc be, ewê bibe misteheqqê ğezaba Xwedê û 'ezab û 'îqabû agirê dojehê.

Jibo em bibin mûsteheqqê rehma Xwedê, lazime ku em hêvîya xwe ji rehma Xwedê qut nekin. Lewra rebbê me di Qur'anê de ferman dike **(la teqnetû mînre'hmetîllah) "Ji re'hma Xwedê bêhêvî nebin"** Mumin lazime ku ji Xwedê pêve ji tukesî û ji tu tiştî netirse. Mu'mîn lazime her tim di navbeyna tirsa ji 'ezabê Wî û bi hêvîya re'hma Wî de be. Xwedayê te'ala di sûreyê Al-î Îmran de weha ferman dike; "Şeytan, hewdikare hevalê xwe bitirsîne, heger we birastî îman anîbe ji şeytan û hevalê şeytên netirsin, ji min bitirsin." (Ali imran: 175). Di sûreyê Maîde de "Ji însana netirsin ji min bitirsin" (Maide: 44) Di ayetekê de jî, "Ey ewanê ku we îman anîye; bi heqqî ji Xwedê bitirsin û bera herkes ji we binêre bê ji bo sibê (yanî ji bo roja axretê) çi 'emel hazir kiriye û ji Xwedê bitirsin. Çi 'emelê ku hûn dikin Xweda pê xeberdar e." (Haşr: 18) Em ji van ayetê ncelîle fêm dikin ku Musluman, berya her tiştî lazime ku ji Xwedê bitirsin û îtae'ta emrê wî bikin û bi zikr, nimêj, tobe û sedeqe xwe jiroja axretê re hazirbikin. Çi 'emelê ku em dikin heger ku xêrbe heger ku şer be, welew bi qasî misqalê zerre be jî Xweda pê dizane.

Lazime ku em tu car ji bîr nekin, melaiketê Xwe-

dê û erd û asîman, û şev u roj di roja qiyametê de ser me û 'emelê me wê şahidîyê bikin. Temamê azayên me (dest, ling, çavû timamê endamên bedena me) ewê ji mer bibin şahid, mîsal; ev erda ku em li ser dijîn diroja axretê de jibo'ebdê mu'min wê şahdeyê bide, ewê bêje ya rabbî; ev 'ebdê te ji bo razîbûna te li ser min limêj kir, zikir kir, rojî girt, sedeqa da, beyta te tewafkir, cîhad kir, dostayî û hevalbendîya Muslumanû muminê mucahid kir, neyartiya dijminê dînê te kir. Wê demê ew 'ebdê mumîn wê têkeve kêfxweşiya ku berya wê kêfxweşîyeke wuha ne dîtiye. Jibo 'ebdê kafir û mucrîm, ewê bêje ya rabbî; ev 'ebdê te li ser min bêemrîya te kir, heram xwar, araq vexwar, neyartîya dînê te û Muslumana kir, şirîk û heval ji tere çêkir. Wê demê ewê 'ebdê mumin têkeve tirseke wuha ku tu caran tirseke bi vî awayî nedîtîye. Ji ber vê yekê lazim e tucarî tirsa ji Xwedê ji dilê me û mejîyên me dernekeve.

Ji 'ulemayê fiqhê Ebûl Leys (rh.a) dibêje; 'elametê tirsa ji Xwedê di heft cihande xwe dide nîşan:

1. Dil (qelb), 2. Mîde, 3. Çav 4. Ziman, 5. Dest, 6. Pî (ling), 7. Tae'tû 'îbadet

1. Dil: Lazim e ji hezkirina Xwedê pêve hezkirina tiştên din tê de tunne be, dil ji mer emanet e, lazim e em fikrê şeytanî jê bavêjin, kîn û 'edawet û 'hesedê jê derxin. Gerek em dilê xwe ji wan nexweşîyan biparêzin. Di vî wari de qasidê Xweda('e.s) dibêje; "buğza hev nekin, wechê xwe ji hev nezîvirînin.." ("xwe ji hesedê biparêzin, lewra çawa ku agir êzinga duxwe xelas dike, hasedjî jixêr û hesenatan duxwe, xelas dike.")

2. Mîde: Musluman mîda xwe bi heram danagre ku Xweda ni'metekî bidê şukur dike, ku tunnebe qenaetê tîne, parîyê heram naxe batnê xwe. Resûlê Xweda dibêje; "insanê ku parîyê heram têkeve mîdawi, hetta ku ew parî di mîdawîdebe, melaiketê erd û asimanan tev le'netê lê tînin ku li ser wî halî bimrê cihê wî dojeh e."

3. Çav: Ev çavê ku Xwedayê te'ala bi emanetî daye me, lazime em pê li kaînatê bi nezera 'îbretê binêrin.Tiştê ku ne 'aîdî me be gerek em çavê xwe bernedinê û em çavê xwe ji tiştê heram biparêzin. ResûlêXweda ('e.s) wiha dibêje: "Ê ku çavê xwe li vê dinyayê bi 'heram dagre, ewê Xwedê çavê wî bi agir dagrê", di hedîseke dî de jî wiha dibêje: "Roja qiyametê du çav hene agirnaghêj ewan; yek jê ê ku ji tirsa Xwedê girîyabe û hêsir rijandibe, û yek jî ê ku di rîya dînê Xweda de nobetgirtibe û bêxewnmabe."

4. Ziman: Musluman lazime ku zimanê xwe ji tiştê ku Xweda jê re heram kiriye bi parêze. Gerek bi zimanê xwe paşgotinîyê û ğiybetê û bêbextîyê neke. Peyvên vala û zêde neke. Ev ziman n'imeteke ku Xwedayê te'ala bi emanetî daye me lazime em zimanê xwe dirîya razîbûna Xwedê de bi xebitînin. Bi zikrê, bi xwendina Qur'anê û bi 'elimandina 'ilmê… Resulê Xweda (s.x.l.) di vî warî de wiha dibêje: "Kî temînata navbeyna herdu lêvê xwe û herdu lingê xwe bide, ez jî temînata cennetê didim."

5. Dest: Dest jî emanetekî Xwedayê te'ala ye. Musluman destê xwe dirêjî heram nake pê dizîyê nake, pê te'de û ezîyetê nade kesî. Resulê Xweda (s.x.l.) di vî warî de wiha dibêje: "Misilman ew e ku misilmanê dî ji dest û zimanê wî di silametê de bin."

6. Pî: Ling jî emanet e. Musluman bi lingê xwe nare cihê heram, wan di îsyanê de nameşîne. Wan di ta'eta Xwedê de di meşîne, bi wan here civatû meclîsê 'ilm û zikr û suhbetê dînî û di çûn û hatina mizgefta.

7. Ta'et û 'îbadet: Musluman ta'et û 'îbadetê xwe hew ji bo riza Xwedê dikin. Ta'et û 'emelê xwe ji şîrk û nîfaqê dûr dikin. Yanî 'emelê ku dike, ne ji bo ku însan bi qencî behsa wî bikin yan jî wî teqdîrbikin. Her çi 'emelên ku dikin hew ji bo Xwedê û bi îxlas dikin. Xwedayê Teala di Qur'ana kerîm de wiha ferman kirîye: "Kî ji we lîqaa rebbê xwe dixwaze bera 'emelê salih (qenc) bike û di van 'emelan de ti heval û şirîka ji rebbê xwe re çêneke." (Kehf-110)

Kî bi vî awayî yanî bi timamê azayê xwe ji Xwedê bitirse, Xweda derheqê wan de wiha gotiye: "Li ba rebbê te axret ji mutteqîya re ye." (zuhruf 35) "Însanê mutteqî dicennetê de û li ser birk û kanîyane." (Zarîyat-15) Xwedayê te'ala 'emelê salih û wê cenneta ku ji mutteqîya re hazirkirîye bike nesîbê me teva. Emanetî Xwedayê Te'ala bin.

# SITRANA ŞEHÎDÊN 6 Û 7 TIŞRÎNA EWIL

Cewdet Karaman

Berxê lawo!
Delalo! Delalê ber dilawo
Heval û hogirê berxê mi vegerîn hatin mal
Ez nizanim hal û hewalê berxê min çewawo
Bê delalo! Delal delalo! Delalê min delalo
Delal delalo! Delalê ber dilawo
Bê de berxê tu delalî
Delalê ber dilê minî
Sibe ye sibeha şerîf
Wextê ‘îd û ‘erefata
Hecî çûne hecê
Li Meke û Medînê ne
Ezê rabim delalîkê ber dilê xwe bi xemlînim
Ji bo nimêja ‘id û ‘erefatê
Li ser xêr û selametê
Verê kim nav ummetê!
Berxê min lawo
Berxê lawo
Delalo delalê ber dilawo
Heval û hogirê berxê mi vegerîn hatin mal
Ez nizanim hal û hewalê berxê min çewawo
Bê delalo! Delal delalo! Delalê min delalo
Delal delalo! Delalê ber dilawo
Bê de berxê min delal e
Delalê ber dile minê
Gava berxê min xemilî ji mal derket
Go de dayê sibe ye xweş sibe ye
Payize payiz xêre
‘Ecêba li ser ‘ecêbê
Bêhna gul û guldexwîna tê
Bihar nîne ku ez bêjim
Wextê gul guldexwîna ye
Bêhna wan tê
Ji zozanê jorîn
Çiyayê Qerejdağê
ji deşta Diyarbekir
Gelo bingeha vê bêhna xweş
Çiya û deşt e yan
Cenneta baqi û beheşt e daye










Berxê lawo
Delalo delalê ber dilawo
Heval û hogirê berxê mi vegerîn hatin mal
Ez nizanim hal û hewalê berxê min çewawo
Bê delalo! Delal delalo! Delalê min delalo
Delal delalo! Delalê ber dilawo

Min go berxê lawo
Ez nizanim ku guhê min ker e
Çavê min kor e
Pozê min xitimî
Tiştê tu dibînî ez nabînim
Bêhna ku tê te
Digerim nagerim li der û dora xwe nabînim
Heval u hogirê te çûne camî û cimaeta
De rabe lezke bi lezine
Li ser xêrê ji refê xwe dûr nemine
Belkî Rebbê alamê xaliqê jorin mîrê keremê
Oğira te li ser xêrê bigerine

Berxê min lawo!
Berxê lawo
Delalo delalê ber dilawo
Heval û hogirê berxê mi vegerîn hatin mal
Ez nizanim hal û hewalê berxê min çewawo
Bê delalo! Delal delalo! Delalê min delalo
Delal delalo! Delalê ber dilawo

Êvar e xweş êvar e
Kele kela dilê min
Di kelije wekî nanê li ser sêlê
Dil û cergê min peritîn
Hatin xwarê
Xwedê li ser xêrê bi gerîne
Ba tê baran di lîlî ne
Ez nizanim çi bû çi qewimî çi rijiya
Ba û baran bi hev re şînê di gerine
Li hev ket çemê dîcle
Pêl bi pêl xwîna sor dikişîne
Berxê lawo

Berxê lawo
Delalo delalê ber dilawo
Heval û hogirê berxê mi vegerîn hatin mal
Ez nizanim hal û hewalê berxê min çewawo
Bê delalo! Delal delalo! Delalê min delalo
Delal delalo! Delalê ber dilayi

Berxê êvar e xweş êvar e
Hudhudê dilşikestî
Li dora dayika te diçe tê
Per û baskê xwe di hejîne
Ji şeveqa sibê de hem digrî hem di nale
Nizane çi bêje çi nebêje gelo pir bê hale
Min go hudhudo! Malmîrato! Bes binale
Ka bêje teyro te çi hale çi hewal e
Go de dayê,
De dayê rebenê
Porkurê hêsîrê nemayê li dinyayê
Gurê devbixwîn
Keftar û heywanên har
Ji çiya daketin bajar
Di ‘îda Qurbanê de çol û çiya kirin gola xwînê
Gelek însan ji xwe re kirin qurban
Berxê te bi mêranî
Bi cenneta baqî şa bû
Vêga cîranê Hesen û Huseyna ye
Min go Kula Xwedê bi kulbe
Bikeve derê mala sebeba
Belkî xêrê ji can û malê xwe nebînin
Ûcağê wan kor be li dinyayê bê urt û ocağ bimînin
Kevirê wan li ser kevira nemine, genim bajon zîwana reş hilînin
Ax felekê qol xayinê
Xwezî ji xêra Xudê ra
Dema li berxê mi dibû pêşîrtengî
Bira te ra derketa serê Huseynê welî
Hesen û Sulhedînê bira
Na wele Muhemmed ‘Eta ye
Berxê lawo
Delalo delalê ber dilawo
Heval û hogirê berxê mi vegerîn hatin mal
Ez nizanim hal û hewalê berxê min çewawo
Bê delalo! Delal delalo! Delalê min delalo
Delal delalo! Delalê ber dilawo

# HEDÎSÊ PÊXEMBER

✻ “Kesê bi desmêj têkeve nava nivînê xwe û razê, mîna ew kes bi roj rojî digre û bi şev jî îbadetê dike.”

**✻ “Mikafat û xelata mezin bi musîbetê mazin re ne. Ku Xweda ji civakekê (cemaetekê) hez bike, bela û musîbeta bi ser wan de tîne.”**

✻ “Hinek şiteğalî hene sêhrin. Hinek ‘Îlim hene cehaletin. Hinek şê‘r û helbest hene hikmetin. Û hinek peyv û gotin jî hene ji guhdara re barin.”

**✻ “SELÂM, navekî ji navê Xweda ye, daxistiye ser rûyê erdê, ji ber vêna Selamê di nabêna xwe de belav bikin.”**

✻ “Bêgûman şeytan ji mirovên nimêjkar bêhêvî bûye. Bes di warê ku niqaşê têxe nabêna wan de bihêvîye.”

**✻ “Îblîs (yanî şeytan) zilamê xwe yê herî xurt dişîne cem wan dewlemend û zengînê ku malê xwe di riya Xweda de serf dikin.”**

✻ “Zarê Adem li hember qedexa ça’v birçiye.”

**✻ “Roja qiyametê însanên herî poşman, ewanê ku dînê xwe jibona dinya hinekî din firotine.”**

✻ “Qulpa Îslamê ya herî xurt, hezkirina jibo xweda û qehra jibona wî ye.”

**✻ “Exlaqê xweş dişibihe tava li cemedê dixe. Tav çawa cemedê dihelîne, herwiha exlaqê xweş jî guneha dimehîne.”**

✻ “Xweda ji dewlemendê herî zulumkar, ji ixtîyarê cahil û ji feqîrê bikibir diqehire.”

**✻ “Xweda, dinyê dide mirovê ku niyeta wî axret e; lêbelê kesê niyeta wî dinya be axretê nadê.”**

✻ “Erd rojê heftê caran wiha gazî dike: Ey zaryê Adem! Tiştê hûn dixwazin heta hûn dikarin bixun! Ez bi Xweda sond dixum ezê jî goşt û çermê we bixum.”

**✻ “Çawa sitêrk şewqê didin xelqê erdê, malê zikir tê de tên kirin jî şewqê didine xelqê asîmana.”**

✻ “Kesê rêyek xêrê pêş însanan bike, mîna wî jî ew xêr kiribe.”



# SALiH BEGÊ HÊNÎ

## PROFÎLA REWŞENBÎREKÎ – 2

'Ebdulqadir TÛRAN



Şêx Seîd û rêhevalên wî, ji îmkanên xwe hayîdar bûn. Wan digel îmkanên xwe qiyam tercîh kir. Hinek dewrên tarîxê pêk tên ku di wan de mesûliyeteke ji mesûliyetên rojane cûdatir dikeve ser milê însên. Rêzanên millet, ya wê mesûliyetê bînin cî û wek pêşîvanekî mezin têkevin tarîxê, yan jî ewê mistehaqê ğezeba Xweda bibin û ji aliyê millet ve wek newêrek û xaîn bên bibîranîn. Şêx Seîd û rêhevalên wî hayîdar bûn ku bi giştî Îslam, bi taybet jî xelkê wan bi pêvajoyeke tarîxî re rû bi rû mabûn. Lazimiya herî mezin ku bawerî pê anî bûn, nebêdengî bû, bertek nîşandin bû, qiyamkirin bû. Yên mayî teferrûat bûn. Di qiyamekê de hêzeke ku li ber wê tê sekinandin heye, pêşîvanên qiyamê hene û xelkekî ku gazî qiyamê tê kirin heye. Pêşîvanên qiyamê Şêx Seîd û rêhevalên wî, hem hêza ku li ber wê sekinîbûn û hem jî xelkê ku gazî qiyamê dikirin baş nasdikirin. Şêx Seîd 'alimek û pêşîvanekî terîqetê bû. Bi wasîteya xwendekarên li medresê di heqê ehl û aliyên civatê yên mixtelîf de xwedî agahiyên qewî û berfireh bû. Digel vêya jî tim rêwîtiyên îrşadê tertîb dikir, li wan deveran piştî nimêja 'esrê xîtabî xelkê dikir, bi şev jî bi maqûl û eşrafê civatê re civînên xisûsî li dar dixist, der heqê derdên millet de agahî distendin. Hayîdar bû ku kîjan 'eşîr dikare çi bike?

Şêx Seîd Efendî weka di mehkemê de jî îfade kiribû, herî zêde bi Salih Begê Hênî bawer bû. Salih Begê Hênî hem xwedî zanîn û çavdêriyên wî bû, weke wî kûpê sirran ê civakê bû, hem jî xwedî qabîliyet bû ku dikaribû zanîna xwe bi peyvan îfade bike, nirxandinên teknîkî bike. Di wan rojan de li ğerbê û li Stenbolê civaknasî zêde dihat 'ecibandin. Yek kesê ku bi wê zanînê dişteğilî Ziya Gokalp bû. Nêzîkiya Salih Begê Hênî ya bi Ziya Gokalp re çê bûye, dewrekê wek wî 'eynî eser xwendine. Li nav 'alema Îslamê gava ku 'ilmê medresê û zanyariya teknîkî tên cem hev, dahî der tên holê. Salih Begê Hênî ku çend ziman zanibûn, dahîkî heqîqî ye.

MILLET LI BER TESÎRÊ BERTEKÊ NÎŞAN DIDE

"Dema emrê girtina medreseyan hat dayîn, li her derê tesîreke neyînî kir. Gava hînkirina dînê xwe hat yesaxkirin, tesîrê jî dest pê kir. Qanûna hiqûqa malbatê û yên din… Ğeleyan zêde bû, me armanca xwe zanibû." "Xelk weka xwe bavêje mirinê xwe diavête pêş, me digot bila em çend kes di oğira dînê xwe de bimrin." "Ev tevgera me, weka mîtîngeke wehşiyane bû."* Li gorî Salih Beg îdara ku li Enqerê hatiye avakirin, Şerîeta Îslamê hilanîye û tesîrek pêk anîye. Ji ber tevgera li ber vê tesîrê, xelk hatiye ğeleyanê û "wehşiyane" îsyan kiriye. Tabîra "wehşiyane" ku îro di me'neyên cûda de tê bikaranîn, wê demê di civaknasî de bi me'neya "berteka xelkê ku ya ku karbeşîya wê ya munasîb nehatiye kirin, hiyerarşiya wê nehatiye avakirin û nebûye teşkîlatî" dihat bikaranîn. Salih Beg dide zanîn ku berteka li ber tesîrê gur bûye, bêyî teşkîlatbûnê bûye îsyan û qeyd dike ku kêmasiya herî mezin a qiyamê, ji ber salek zûtir dest pê bûye.

Salih Beg rewşenbîrek e ku qîmetê dide civaknasiyê, nirxandinên xwe li gorî mêzênên wê zanînê dike. Mesûliyeta karekî, li ser sebebên ku wî tiştî pêk tînin e. Li gorî Salih Beg sûcdarê meğdûriyetên ku di qiyamê de qewimîne, bîzzat hikûmeta Enqerê ya wê demê ye. Lewra hikûmet digel zanibû ku wê ev ğeleyan biqewime jî ev tesîr çêkiriye, encam û netîceya wê pêşîn hesab kiriye û plan kiriye û ev plana xwe bi cî

aniye. Yên qiyam kirine û xelkê tevlî wan bûye ne sûcdar in, ew meğdûrê tevgerên hikûmetê ne.

KURD MESÛLIYETÊ DIDIN SER MILÊ PÊŞÎVANÊN XWE

Di tarîxê de hemî civatên ku êşên giran dîtinin û ew êşan bi perwerdeyê nekirine sermaye û ji bo pêşerojê nekirine hewm û tecrûbe 1- îtîrazkar in 2- Gava îtaet bikin, dikin mitleq 3- (Lê) ji bo encamê, mesûliyetê nadin ser milê xwe. Ji lew tim pêşîvanên xwe tenkît û rexne dikin, bi qasî ku ewê wan(pêşîvanan) ji bidestxistina hedefên mezin mehrûm bikin, di merhaleya planê de tevger û lebatên wan vedipirsin, gava qani' bibin dikevin hereketê, lê netîceya hereketê neyînî û menfî be, dibêjin "pêşîvanên me nizanibûn wê çi bikin" û xwe dûrî hereketê dikin. Salih Beg dizane ku ev heqîqet ji bo xelkê Kurd e jî û vêya di mehkemê de bi van gotinan tîne ziman: "…. Niha gava dikeve tengasîyê şêx sûcdar dike, ağa sûcdar dike, li ser herkesî cesareta medenî tune ye ku bêje 'Belê min ji bo dîn kir' Kurd jî ji xwe ditirse, ji wî heye ku wê bike sûcê ağa û xwe xelas bike."*

Şêx Seîd û rêhevalên wî digel ku ev heqîqet zanibûn, çima pêşîvaniya xelkê kir? Ya rastir gelo baweriya xwe bi sedeqeta xelkê anîn û qiyam kirin? Qet'î na xêr… Ew ji wî eqlê ku dikeve nav mêzîna îmkan û hereketê û însên newêrek dike, însên ji biciânîna rol û wezîfeya xwe dûr dike berî bûn.

Salih Beg vêya bi vê gotinê îfade dike: "Hûn dixwazin ku ji serî heta binî tev mentiqî be, lê planeke me ya weha tune bû." Yên weha tev digeriyan ne tenê Şêx Seîd û rêhevalê wî bûn. Hemî pêşîvanên misluman ên sedsala 20î ya mîladî ku îmkan çi bin bila bibin bawerî bi esasê rabûna qiyamê anîbûn jî wek wan bûn.

Ma mimkun e ku meriv qiyama Omer Mixtarê ku bi mawzera xwe li ber topên Îtalyayiyan disekinî îzah bike? Yan jî li Bosnayê serhildana rewşenbîrên misluman ku ewilî li ber Yûgoslavyayê paşê jî li ber Sirbistanê sekinîn… Merhûm pêşvînê mislumamanên Bosnayê 'Aliya Îzzzetbegovîç, vê heqîqetê weha îfade dike: "Em tev nîv dîn in, ciyê baqilan di nav me de tune ye." Wan weke Hz. Huseyîn, bawerî bi wacibiya qiyamê anîbûn û hewceyiya vêya anîbûn cî. Gava meriv qiyamên wan bi îmkanan îzah bike, meriv ew nasnekirine. Digel tunebûna îmkanan sûcdarkirina rabûna wan a qiyamê, karê wan kesa ye ku li gorî îmkanan li xwedîderketina doza wan difikirin.

LI NAV ME CIVAKA SIVÎL TUNEYE

Du aliyên civaka sivîl hene: 1. Îdareke ku qîmetê dide berteka civaka sivîl 2. Civata xwedî perwerde, kultur, şi'ûr û sebra wê civaka sivîl pêk bîne… Dema qiyamê ne hikûmeteke ku bawerî bi civaka sivîl anîbû hebû, ne jî xelkê ku dikaribû çalakiyeke civaka sivîl çê bike. Hikûmetê hemî bertekên li hemberî xwe wek "îsyan" didît, têk dibirin û derhal ceza dikir. Li merkeza Diyarbekirê ji berê de, her çiqas qismeke civaka sivîl hebe jî, sîstemeke ku li vê herêmê civakeke sivîl pêk bîne tunebû. Salih Beg ev herdu heqîqetan dizanibû. Li ser pirsa "We îsyaneke sivîl pêk bianiya, ma ewê ne medenîtir ba?" ya heyeta Mehkemeya Îstîqlalê ya ku ji bo dana cezayê îdamê hatibû wezîfedarkirinê, Salih Beg dibêje "Ewê hikûmetê derhal ew îsyan ji hev belav bikira" û piştre jî heqîqeta civaka wê demê tîne ziman: "Nîzameke me ya weha tunebû"*

Di vêya de rastiyeke veşartî heye. Salih Begê 'alimeke mezin û rewşenbîr, heta dikare gotinên xwe bidîqet dibêje. Mesajên xwe bi nişmîtî digihîne neslên pey xwe. "Întîzam" di me'neyên birêkûpêk, rast û durust, duzen û edilandî de îfadeke erênî ye. Îfadekirina tunebûna wê, serzenîşek e, şîkayetek e, gazin û giliyek e. Gotina "Nîzameke me ya weha tuneye" ya Salih Beg, dixwaze bila bi Tirkî be û dixwaze bila Kurdî be ku Salih Beg di hûnandina helbestên Kurdî de hosta bû, Salih Beg bi vê gotinê ji bo xelkê xwe, hesret û baweriya xwe ya bi hebûna civaka sivîl îfade dike.

LAÎK LI ME TESÎRÊ NAKIN

Di heyama Qiyama Şêx Seîd de li Stenbolê, arîstokrasîya Kurd a laîk ku di wê dewrê de bi qasî Wezareta Perwerdeya Mîllî bidene wan û Perwerdeya Bilind teslîmî wan bikin hebû. Ew di quncikên xwe de bi edebiyata li ser Kurdan re meşğûl bûn. Yê tayînî wezîrê Perwerdeya Mîllî dibû, ji begên Cizîrê bû. Yê tayînî Perwerdeya Bilind dibû jî ji Babanan bû. Ew mîrasx-

urên malbatên mezin bûn. Ew çiqas ji malbatên mezin bin jî, bi fikr û bîr û baweriya xwe ji tesîrkirina li xelkê dûr bûn. Li Diyarbekirê jî çend heb navên nêzî wan hebûn. Diyarbekirê ew hinekî hessas dikirin û nêzî meşğûlbûna bi derdên xelkê re dikirin. Lê dîsa vana îmkan nedida wan ku weke Şêx Seîd û Salih Beg rêzantiyê bikin. Wê demê xelkê, kesên ku ji îman û baweriya wan dûr bana, ji fikr û heyata xwe ya rojane dûr dihiştin. Salih Beg bi qasî xelk nas dikir, kesên di klûbên siyasî de fealiyet dikirin jî baş nas dikir.

Berî qiyamê Dr. Fûat bi Şêx Eyyûbê Sîwregî re tê qetilkirin. Ji Salih Beg Dr. Fûat tê pirsîn, ew jî weha dibêje: "Ez şexsî wî nas nakim, lê ez nikarim bêjim ku Dr. Fûat terefdarê şerîetê bû." Dr. Fûat mezlûmane hatiye qetilkirin, ne terefdarê şerîetê ye û madem ne terefdar e bi gotina Salih Beg "Di tevlîbûna me ya qiyamê de tesîra kesên wek Dr. Fûat bi qasî zerreyê tuneye."

Di dewra paş de yên mixalefeta Kurd bi ğeyreteke mezin kirin laîk, tim bi vê heqîqetê hereket kirin, dizanibûn ku ewê li ser xelkê qet tesîrê nekin, ji lew destek dan wan, digel vêya jî nikaribûn pêşiya xizmetên Îslamî bigrin. Piştre xelkê ku berê kesê dûrî baweriya xwe ji xwe dûr dihişt, zihniyeta ku xwe nêzî wan kesên ji baweriya wan dûr jî bike dayê, ji bo mixalefeteke hêsan, mixalefeteke weke xwe der anîn. Îro mixalefeta ku wan bi xwe der anîye, jê re dibêjin "Hereketa siyasî ya Kurd" û bi wê re hemhal in.

'ALIM Û SALIH

Şêx Seîd Efendî pêşîvan û giregirên xelkê bi navê "ûlema, fûdala û ûqela" dikir sê sinif yanî 'alim, xwedî fezîlet û yên bi'aqil… Salih Beg vê sinifandinê dike du qisman: 'Ûlema û suleha yanî kesên 'alim û salih. Salih Beg ne li şeklê, li heqîqeta hundir dinêre. Li gorî wî kesekî mela dibe ku devlok û sefîh be, dibe ku ne liyaqî pêbaweriyê be. Jê re kesê bi navê Mela Yûsûf tê pirsîn, ew jî weha cewab dide: "Devlokeke serserî ye, tucar ne liyaqî wesfê pêbaweriyê ye."*

Lê ji bo Naqib Begê Diyarbekirî dibêje: "Bi kincê xwe ûlema ye û pir salih e." Ji bo malbata Cemîlpaşazade ya ku li Diyarbekirê giregir û di dewra piştre de xetteke rast nemeşandine jî digel israra heyeta mehkemê Salih Beg nabêje suleha yanî salih û ji vê wesfandinê bidîqet xwe diparêze. Digel li gorî tiştên ji Naqib Bekir Beg stendibûn ku meylî şerîetê dikin jî, Salih Beg wan ji suleha nahesibîne. Li gorî wî salihbûn meqameke xisûsî ye, meyîlkirina şerîetê însanan nake ji ehlê salihan. Salihbûn tiştên ji vêya zêdetir dixwaze. Li gorî Salih Beg divê pêşîvan û rêzanên xelkê, alim û salih bin. Ne hêvîdar e ku qismeke xelkê kultura xwe biguherîne û bilindî meqameke bilindir bibe. Vê bêhêvidarbûna xwe di helbesteke xwe de bi Kurdî weha dibêje:

Eger çêkî ji bo cehşê kerê ra
Ji zêr afîr, li nêv eywanê kesra
Mu`ellîm be ji bona wî Felatûn
Bibe saqî ji bo wî îbnû Sîna
Tu wî av dî ji yenbû`a heyatê
Di şûna êm, bidî wî lewz û xurma
Meke bawer ku dê sahibhuner be
Ewê dîsa wekî bavê xwe ker be
Dema tu wî ji eywanê derînê
Huner nayê ji wî xeynê zirrînê"

Peyva paşîn… Her hal ferqiya Ustad Bedîuzzeman a ji Salih Beg ew bû ku Ustad bawer dikir meriv dikare her qism û aliyên millet perwerde bike. Salih Beg alimekî mezin û rewşenbîr e. Ustad digel vêya mu'ellîmekî mezin e. Salih Beg di wê baweriyê de ye ku civat çi cewabê bide bila bide, divê meriv gazî wê bike û meriv xwe di oğira hedefên mezin de feda bike; hewceyiya vêya tîne cî. (Belkî jî difikire ku dibe civat bi fedekariyeke mezin şoq bibe û vegere xetta guherbûnê)

Serê mu'ellîmbûnê baweriya bi îhtîmala guherbûna civatê ye. Ustad bawer dike wê civat bi perwerdeyê biguhere, hemî hebûna xwe feda dike ku civatê perwerde bike. Xweda Allah ji Salih Beg, ji Ustad Beîuzzeman, ji kesên ew gihandine û ji yên di rêya wan de meşiyane razî be.

* Îfadeyên Salih Beg û Şêx Seîd ên di mehkemeyê de

Bertek: Tepki
Birêkûpêk: Düzenli
Çavdêrî: Gözlem
Devlok: Boşboğaz
Hewm: Birikme
Karbeşî: İş Ortaklığı
Lewz: Badem
Neyînî: Olumsuz



# REWŞA ROJHİLATA NAVÎN

✍ ‘Ebdûllah QAVAN

Bi rastî Sûrîyê, denga Rojhilata Navîn xera kir. Berya ‘herba Sûrîye derkeve, di navbêna dewletên Rojhilata Navîn de nêzîkayî hatibû holê. Di pêşkeştina Turkîyê de gellek dewletan sînor di navbêna xwe de rakiribûn. Digel “aborî” di navbêna wan de piştî ku alîkarî çêbû, pêşya vê nêzîkahiyê vekir. ‘Hedîse bi vî şiklî bi pêşde diçûn. Tam di vê wextê de “Bihara ‘Ereban” destpê kir. Li Tûnis, Misir, Lîbyayê li pey hev serhildan çêbûn û îqtîdarên wan ketin. Di vê wextê de li Sûrîyê jî serhildan destpê kir. Herkesî digot “ev jî wek wan dewletên din, ewê di zemaneke kin de bikeve.” Feqet meh derbas bûn, sal derbas bûn, Sûrîye neket. Nêzîkî pênc salaye ku ‘herba Sûriyê devam dike. Çimkî dewletên emperyalîstên xûnmij, jibo dewletên ‘alema Îslamê nêzîkî hev nebin, naxwazin ‘herba Sûriyê xelas bibe. Di serê ‘herba Sûriyê de ger nehiştina firokên Esed rabin ezmana, îşê wî xelas bûbû. Lê jibo dewletên Musluman nêzîkî hev nebin û navbêna wan xera bibe, tu gav neavêtin. Piştî vê ‘herba jî, navbêna Turkîye û Îranê hinekî xerabû. Li Misrê jî darbe kirin, ev gava Îxwan a “nêrîna ummetî” şikandin. Ev talûke jibo wxe dida pêşya wan, li gorî xwe rakirin. Jibo ev nêzîkahî pêk neyê, di wê fikrê dene ku ‘herba Sêrîyê devam bike. Hetta îro ‘herba Sûriyê, di zahir de di hundurê Surîde ye, feqet batinê wê li temamê dunyayê ye. Jibo nêzîkahî çê nebe, gaveke din jî avêtin. Ev gav jî li Yemenêbû. Piştî ‘herba Yemenê, navbêna Si’ûdî û Îran jî xerabû. Ji xerabûnê pêşdetir jî, ‘herbeke Si’ûdî û Îranê li Yemenê dimeşe…

Dewletên emperyalîstên xûnmij, wexta li Rojhilata Navîn dinêrin, bi çavê tîcaretxaneyê lê dinêrin. Ev hemî tucar, jibo di navbêna dewletên Rojhilata Navîn de tifaqî çênebe dixebitin. Her kû nêzîkiya tifaqê çê dibe, radibin xera dikin. Lewra gava tifaqî çê bibe, ewê tîcaretxaneyên wan ji destê wan derkevin. Li ser meselê, ji aliyê ‘irq û mezhebê ve siyasetê dimeşînin. Me’elesef dewletên muslumanan jî dikevin vê dafikê. Vê xefika hanê, ji tarîxê de liber muslumanan vedigrin û hercar jî vê xefikê zerar daye ‘alema Îslamê. Di serî de dewletên Muslumanan û dûrê jî cemae’tên Îslamî divê vê dafika hanê bibînin. Ji bo ev mesele çareser bibe, du rê hene:

Yek jê divê cemae’tên Îslamî teferrûa’tên di navbêna xwe de deynin qeraxekê û yekîtiya xwe pêk bînin. Ev yekîtî ji sedan pêk tê. Wek ustad Bedîuzzeman dibêje: Xwedayê me yek, pêğemberê me yek, qibla me yek, kîtaba me yek û bi ‘hezaran yekên me hene… Gava Cemae’tên Îslamî van yekîtiyan bibînin û teferrûa’tan deynin hêlekê, deriyê yekîtîya ‘alema Îslamî vedibe.

A duda: Divê dewletên Muslumanan bi vê nêrînê li mesela binêrin. Ne bi mesela menfî’et û karî li meselê binêrin. Bi çavê “ummetî” li mesela binêrin. Bi vê nêrînê ewê hem pirsgirêkên navbêna wan çareser bibin, hem jî meselên li nav ‘alema Îslamê wê çareser bibin. Wê qaweteke pir mezin jî bê holê. Ev qûwet ewê bikaribe destê xwe bavêje Filistîn, Sûriye, Yemen, ‘Iraq û dewletên Efrîkayê jî…

Rojhilata Navîn di dunyayê de wek qelbê însana ye. Hewceya temamê dunyayê bi vê derê heye. Hem bi zengîntîya xwe ya bin erdê hem jî bi medenîyeta xwe ya dîrokî. Jiber vî tiştî jî temamê dewletên Ewrûpayê, çav berdane van erdan. Jibona van erdên biqîmet ku xezîneyên wan pirin ji destê wan neçin, di navbêna dewletên muslumanan de niqaş û nexweşîyan dixwazin. Ev xezîne di destê muslumanan dene, lê feqet jiber bêtifaqîya wan, jê îstîfade nakin û vê qûwetê bi destê Ewrûpa ve berdane. Hêvîya me ji Rebbê ‘aleman, di nêz da lîderên dewletên Muslumanan vê feraseta hanê hîn bikin. Û ev girîn û zulma di nav ‘alema Îslamê de biqede… Muslumanên Rojhilata Navin ger destên xwe bihevdin û rêya tifaqê bibînin, ewê Ewrûpa liber wan bigere. Ewrûpa mi’htacî dewletên Rojhilata Navîne. Çawa ku devleta ‘Usmanî digel kêmasiyên xwe jî li wan 600 salan tehakkum kiriye, îro jî eger çend dewletên Muslumanan destên xwe bihevdin, wê Ewrûpa serî liber wan bitewîne…

---

Pêşkeştin: Öncülük, önderlik
Firok: Uçak
Xefik: Tuzak
Dafik: Kapan, tuzak
Rojhilata Navîn: Ortadoğu

# Bexçê zarukan

## ZIVISTAN


Zivistan, şev tê de pir dirêje
Zivistan, de ka çîrokan bêje
Zivistan, sirr û seqem û mije
Zivistan, dihiltîne qirêje

Zivistan, ba û berf û baran e
Zivistan, tîpîw pêzûn dûman e
Zivistan, ji axê re derman e
Zivistan, ji xweşiya jiyan e

Zivistan, bi sersal û çîroka
Zivistan, kestanew meteloka
Zivistan, kêfxweşiya zaroka
Zivistan, ta Adar sibatoka




Metelok: Masal    Seqem: Ayaz



NAVÊN NAVÇEYÊN
## DÎYARBEKIRÊ

DİYARBAKIR / AMED (DIYARBEKIR)
Bismil / Bismil
Çermik /Çêrmûge
Çınar / Çinar
Çüngüş / Çingûş
Dicle /Pîran
Eğil / Eglê
Ergani / Erğenê
Hani / Hênê
Hazro / Hezro
Kocaköy /Karaz
Kulp /Pasûr
Lice / Licê
Silvan / Farqîn (Silîvan)

# bexçê zaroka





## MIZGÎN LI WE ZAROKNO!

Bi navê Xwedayê Rehman û Rehîm. Hemd û şukur ji Xweda re. Selat û Selam li ser pêxemberê me Hz. Mûhemmed Mistafa û li ser al û eshab û muminên qenc yên ku rêya wî dişopînin be...

Zarokên hêja, xuşk û birayên 'ezîz û delal! Serê ewil ez li rewşa we bipirsim, hûn çawane başin? Ez dizanim hûn jî li halê min dipirsin; erê ez jî başim. Ji bo ku we li rewşamin pirsî ez ji we re teşekkur dikim, mala we sed car ava be, wey Xweda we bihêle yanê 'umrê we salih û dirêjbike...

Zarokên hêja! Emê bi wesîleya kovarê werin balhev û bi hevra hesbîhal bikin û tiştên bi feyde hînbibin. Belê zarokên hêja! Me ji bo we ayetên Quranê û 'hesdîsên pêxember di vê hejmarê de jî weşandin da ku hûn ezber bikin Înşallah. 'Hedîsên kin û maneya wan berfireh... Dîsa ji bo we serpêhatiyên bi ders û îbret, pêkenokên him dikenînin û him jî difikirînin, agahiyên pratîk û gelek nivîsên wê meriv sewqî qencî û başiyê bikin me ji bo we weşandin. Beriyaku ez we bibaxçê zarokan re bi tenê bihêlim, heta hejmareke din bimînin di xêr û xweşiyê de, her tim şad û bextewar bin.





# HEDÎSÊN PÊĞEMBER

Zaroknê hêja! Werin em bi hevra rojê hedîseke pêğember ezber bikin. Niha 6 hedîsên pêğember, ew jî teqabulî 6 rojan dikin. Qet xwe necivînin! Rojê yek. De hadê Bîsmîllah...

1-) Di însanan de organek heye. Ger ew organ bi sihhet be dê wucûd tev bi sihhet be. Naxêr ger ew organ ne bi sihhet be wê demê hemî wucûd xera dibe. Dîqqetbikin ew organ qelb e.

2-) Her însan xeta û ğeletiyan dike, ji wan yê herî bixêr ew kesên ku tobe û îstîğfar dikin.

3-) Sê dûa hene ku bê guman tên qebûl kirin: Dûa mezlûma, dûa mêvana û dûa ku dê û bav ji ewladan re dikin.

4-) Cennet war û welatê comerda ye.

5-) Kî ji kê hizbike û bihebîne, wê biwî re heşirbibe.

6-) 'Emêl û tevgera mirov li gor nêta (nîyeta) wî ye.

---

# SÛREYÊ ÎXLAS

Sûreyê Îxlas çar (4) ayet e û li Mekkê daketiye. Navê sûreyê ji naveroka sûreyê tê ku behsa bîr û baweriya tewhîdê dike.

Bi Navê Xwedayê Rehman û Rehîm

1-) Bibêje: Xweda her yek e.

2-) Her Xweda Samed e.

3-) Kes jê çênebûye û ew jî ji kesî çênebûye.

4-) Tu hemkûf û hevta jî jê re nînin.

---

Rewş: Durum
Kovar: Dergi
'Hesbî'hal: Sohbet
Berfireh: Geniş
Serpêhatî: Macera
Pêkenok: Güldürü
Agahî: Malumat, bilgi
Teqabul: Karşılık
Xwe Necivînin: Kendinizi kasmayın
Ğeletî: Yanlışlık
Îstîğfar: Tövbe
War: Vatan
Comerd: Cömert
Bihebîne: İnanmak, sevmek
Tevger: Davranış
Hevta: Denk, eşdeğer
Bîr û bawerî: Akide, inanç
Hemkûf: Denk
Naverok: İçerik
Hevta: Benzer, denk



# QERMÎÇEKÊN PAŞ SUTYÊ TE NE YÊN VAN SALA NE



Rojekê Rovîyê fêlbaz û kosî bûn rêheval û di nava daristanê de meşîyan. Xaçerêka ku Rovî û Kosî tê de dimeşin, herî zêde gundî tê de diçin û tên. Piştî demekê Rovî û Kosî li ser xaçrêkê çend serî penêr dîtin. Penêr ji gundîyên derdorê ketibû xwarê. Rovîyê fêlbaz fikirî ku ger vî penêrî li hev par bikin, wê tu te'mê jê nekin, têrnexun. Rovî ji Kosî re got:
"Hevalê Kosî, xuyaye ku em vî penêrî li hev par bikin, em herdû jê têrnaxun. Tu rê heye ku ji me yek tenê vî penêrê han bixwe." Kosî jî weha bersiva Rovî da:
"Başe. Wê demê ji me kîjan 'umrê wî ji yê din mestir be, bila ew vî penêrî gişî bixwe." Rovî ev teklîf qebûl kir û got:
"Li gor ku dêya min dibêje, ez di wexta ku asîman dihat çêkirin de hatime dinyayê." Kosî wechê xwe tirş kir û hêsir barand. Rovîyê fêlbaz lêva xwe alast û didilê xwe de got; Welleh min ew têkbir. Ji ber ku penêr ji dest wî çû lewma digrî... Û ji Kosî pirsî:
"Hevalê Kosî! Ma îcab dike ku ji bo çend parî penêr tu ewqas hêsir bibarîne?" Kosî serê xwe ji qalikê xwe desrxist û got:
"Keko! Ez ne ji ber penêr digrîm. Te behsa çêkirina asîman kir, wê dema ku dibêjin Xweda asîman ava kir, du kurê min wefat kiribûn. A sebebê girîn û qêrîna ev e." Rovî şaş ma û wechê wî lê qelibî û got:
"Welleh min dizanîbû ku ew qermîçekên paş sutyê te, ne yên van salan e." Fêlbazîya Rovî vêcarê bikêr nehat û vala derket. Divê meriv tucarî xwe di ser kesî re nebîne. Wer heye ku ew kes ji meriv zanetir û baştir be.

---

Têkbir: Yendi
Hêsir: Gözyaşı
Bersiv: Cevap
Derdor: Çevre
Xaçerê: Kavşak
Fêlbaz: Oyunbaz